



K. T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**LI GOR PÎVANÊN EDEBÎYATA ZAROKAN
NIRXANDINA ÇÎROKÊN ZAROKAN YÊN
KURMANCÎYA BAKUR**

Aydın MERAL

21711014

Şêwirmend

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Mêrdîn-2024

K. T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

LI GOR PÎVANÊN EDEBÎYATA ZAROKAN
NIRXANDINA ÇÎROKÊN ZAROKAN YÊN
KURMANCÎYA BAKUR

Aydın MERAL

21711014

Şêwirmend
Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Mêrdîn-2024

T. C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 21711014 numaralı yüksek lisans öğrencisi **Aydın MERAL**’in hazırladığı “**Li Gor Pîvanên Edebîyata Zarakoan Nirxandina Çîrokên Zarakon yên Kurmancîya Bakur**” başlıklı YÜKSEK LİSANS tezi ile ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca **06.09.2024** günü saat **14:00**’da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Başkan

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI (Danışman)

Üye

Dr. Öğr. Üyesi Ferhat ÇİFTÇİ

Üye

Dr. Öğr. Üyesi M. Şirin FİLİZ

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu’nun. tarih ve.

.sayılı kararı ile onaylanmıştır.

...../...../20.....

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmasında kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Aydın MERAL
2024

KURTE

Teza Lîsansa Bilind
Li Gor Pîvanên Edebîyata Zarokan
Nirxandina Çîrokên Zarakon Yên Kurmancîya Bakur
Aydın MERAL
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yê Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
157 rûpel

Edebîyata zarokan, ji bo zarokên bîrewer û zarokatîyeke binirx rû bide amûreke bingehîn e. Ji bo zarokan afirandina edebîyateke binirx, seranser bi naskirina zarokan û bi nivîsîna berhemên li gorî wan pêkan e. Di serî de divê ji aliyê nivîskar ve zarok û zarokatî bê naskirin û pêdiviyên zarokan bîn tesbîtîkin. Piştî tesbîtîkirinê, divê pirtûk û hemû amûrên edebîyata zarokan, di bin ronahîya rastî û îzafiyeta wan de bîn amadekirin. Honak, leheng, cureyê vegêranê û hemû hêmanên nivîsê divê li gor van her du rêbazan bîn afirandin. Di vê xebatê de di gava pêşîn de lêkolîn li qadê hate kirin. Bi saya rêbazê, rêzikên edebîyata zarokan hatin tesbîtîkin. Armanc ev e ku; naverok û nêrînen berheman, zimanên di naverokan de hatine bikaranîn, rêbazên afirandina lehengan, atmosferên psîkolojîk yê tevahîya berheman û pêwîstîya çawabûna vegêranan bîn ravekirin û zelalkirin. Daneyên bi pirsên “Çend?” û “Çawa?” hatin tesnîfkirin. Ev tesnîfa ku bingeha lêkolînê pêk tîne, di analîzkirina amûrên edebîyata zarokan de hat bikaranîn û rexne li gorî van pîvanên tesnîfê hatin kirin. Ji bo nimûneyên kurdî (zaravayê kurmançî) ji Necla Öztürk 16, ji Mûrad Dildar 8, ji Çetoyê Zêdo 4 û ji Berfîn Ayşe Ögüt 4 çîrok hatin girtin; bi giştî 32 çîrok hatin analîzkirin. Ji bo ku ev çîrok şiroveyekê derxin holê, nimûne bi baldarî hatin hîlbijartin. Çîrokên bijartî, li gor daneyên bersivên “Çend?” û “Çawa?” yê ku me di qada lêkolînê de bi dest xistibûn hatin rexnekirin. Ev rexne, di bin hinek sernavan de bi çend binnivîsan hatin tesnîfkirin. Pêşnîyazên bidestxistî, di beşa encamê de bi awayê bendan hatin nivîsîn.

Bêjeyên Sereke: Edebîyata zarokan, Rastîya zarokan, Îzafiyeta zarokan, Pîvanên edebîyata zarokan, Çîrokên Kurmancîya Bakur

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Kuzey Kurmancîsi Çocuk Öykülerinin Çocuk Edebiyatı Ölçütlerine Göre Değerlendirilmesi

Aydın MERAL

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Kültürü ve Dili Anabilim Dalı

157 sayfa

Çocuk edebiyatı, çocuğun ve çocukluğun istenilen bir nitelikte geçmesi için yaşamın ilk yıllarından itibaren önemli bir yerdedir. Çocuk edebiyatının nitelikli olması için de başat norm çocuğun tanınması ve buna göre metinlerin üretilmesidir. Metin üretiminden önce yazar; çocuk ve çocukluğu tanımalı, bilmeli ve onların ihtiyaçlarını saptamalıdır. Bu saptamadan sonra çocuk kitabı ve diğer çocuk edebiyatı ürünleri, çocuk gerçekliği ve çocuğa görelilik ilkeleri esas alınarak oluşturmalıdır. Olay örgüsü, karakterler, anlatıcı türü gibi metin içi unsurlar bu iki ilke çerçevesinde şekillenmelidir. Bu çalışmada, ilkin araştırma inceleme yapılmıştır. Bu yolla, çocuk edebiyatı ilkeleri ve ürün değerlendirme ölçütleri saptanmaya çalışılmıştır. İçerikte kullanılan dil, karakterlerin nasıl olması gerektiği, olay örgüsünün içeriği ve yönü, metinde oluşturulmak istenen psikolojik atmosfer ve anlatıcının nasıl olması gerektiği gibi özellikler tespit edilmek istenmiştir. Elde edilen nitel ve nicel veriler, sınıflandırılmıştır. Tezin araştırma sahasını oluşturan bu sınıflama çocuk edebiyatı ürünleri incelendiğinde birer ölçüt olarak kullanılmıştır. Kürtçe (Kurmancî Lehçesinde) çocuk kitaplarının çözümlenmesi için oluşturulan örnekleme Nejlâ Öztürk’ün 16, Mûrad Dildar’ın 8, Çetoyê Zêdo’nun 4 ve Berfin Ayşe Öğüt’ün 4 öyküsü incelenerek toplam 32 öykü ele alınmıştır. Bu öykülerin evreni yansıtabilmesine dikkat edilmiştir. Seçilen öyküler, alan taramasında elde edilen nicel ve nitel ölçütlere göre çözümlenmiştir. Bu çözümlemeler, çeşitli alt başlıklar altında sınıflanmıştır. Elde edilen öneriler, sonuç kısmında maddeler halinde yazılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Çocuk edebiyatı, Çocuk gerçekliği, Çocuğa görelilik, Çocuk edebiyatı ilkeleri, Kuzey Kürtçesi öyküleri.

ABSTRACT

Master's Thesis
Evaluation of Children's Stories According to Children's Literature Criteria

Aydın MERAL
Mardin Artuklu University
Living Languages Institute in Turkey
Department of Kurdish Culture and Language
157 pages

Children's literature is a necessity for both children and childhood to at a wanted level of development. For children's literature to be qualified, the basic norm is to recognize the child and produce texts in accordance. Before producing the texts, the author needs to know the child, childhood and the needs. Hereupon, the author is to write texts in according to children's books, various children's literature pieces, children reality and relativity. Such in-text elements as plot, characters, story teller should be set in according to these two basic criteria. In this thesis, literature review is done in order to determine the basic norms of children's literature. Such properties as content language, how characters should be, content and direction of the plot, psychological atmosphere wanted to be created in the content, and how story teller should be were investigated. Qualitative and quantitative data were classified. This classification was referred as a criterion when children's literature products were investigated. In the sampling set in order to analyze Kurdish (Kurmanci Dialect) children's literature, 16 works by Nejla Öztürk, 8 works by Mûrad Dildar, 4 works by Çetoyê Zêdo, and 4 stories by Berfin Ayşe Öğüt, totally a sampling composed of 32 pieces was set. the sampling was carefully chosen in order to reflect the field. The stories were analyzed in according to qualitative and quantitative data obtained in the literature review. The analyze was detailed under subheadings. In the conclusion part, recommendations including qualitative and quantitative data were itemized.

Key Word: Child, Children's Literature, Kurdish, Reality of Child, Relativism of the Child, Northern Kurdish stories

PÊŞGOTIN

Di afirandina kesayetîyê de çaxê zarokatîyê xwedî bandoreke mezin e. Di vê qonaxê de xalên pir giring hene. Yek jê, rasthatina zarokan li edebîyata zarokan e. Edebîyateke zarokan ya bi rêk û pêk û fonsîyonel, dikare pêşveçûn û derûnîya zarokan saz bike û wan ji hêla civakî û takekesî ve bextewar bike.

Pirtûkeke serkeftî, derfeta naskirina xwe û civakê dide xwînerên piçûk. Ev naskirin, piralî û pirrengîya jîyanê jî dide xuyakirin. Ligel edebîyata cîhanê, edebîyata zarokan ya kurdî jî pêwîst e zarokan nas bike û naveroka berhemên vê qadê bi zanîstî biafirîne. Berhemên qadê; divê ji hêla leheng, ziman, vegêr, honak û derûnnasîyê ve xwedî taybetmendîyên pisporî bin. Dema ku ev taybetmendî bi rastî û îzafîyeta zarokan bîhînin, berhem û amûrên baş ji bo zarokan dikarin bîhînin. Ji ber van sedeman divê nivîskar xwedî hêlên pispor bin.

Dema ku pirtûkên zarokan frekansên zarokan zeftîkin, ev pirtûk ji hêla wan ve bi coş tînin xwendin. Herweha bi xwendinên xwe yê di piçûkanîyê de zarok, ji hêla ziman û raman ve geş dibin. Zimanê wan yê dayîkê dewlemend dibe û zarok bêhtir dikarin xwe îfade bikin. Li ser van agahîyan pêwîstîya vê xebatê derdikeve ber çavan. Dikare bê gotin ku rê û rêbazeke zanîstî ji bo pêvajoya edebîyata zarokan şert e.

Armanca xebatê ev e ku ji xwîner, rexnegir û kesên li ser vê qadê mijul dibin re bibe rêberek û hin alîyên reş ronî bike. Ji xeynî vê, edebîyata zarokan ya kurdî gav bi gav ji şarîstanîya zimanê xwe sûdê bigire û berhemên bi nirx biafirîne.

Di pêvajoya nivîsîna tezê de min ji gelek kesên ezîz alîkarî stand. Ji bo piştgirîya wê ya takekesî ji hevsera xwe Zeynep Erbek Meral, ji bo alîkarîya wan ya akademîk Nurullah Çiçek û Ferhan Erdoğan û Dr. Süleyman Çelik û Berfin Yavuz û ji bo ked û rêberîya wî ji şêwirmendê xwe Doç. Dr. Kenan Subaşı re û herweha ji lijneya parastinê Dr. Ferhat Çiftçi û Dr. M. Şirin Filiz re gelek spas û hurmet dikim.

Aydın MERAL

Mêrdîn 2024

NAVEROK

KURTE	iv
ÖZET.....	v
ABSTRACT.....	vi
PÊŞGOTIN	vii
NAVEROK	viii
LÎSTEYA TABLOYAN	xv
KURTEBÊJE	xvi
DESTPÊK.....	1
1. ZAROK Û EDEBÎYATA ZAROKAN.....	5
1.1. Zarok û Zarokatî	5
1.2. Edebîyat û Edebîyata Zarokan	11
1.2.1. Cureyên edebîyata zarokan	14
1.2.2. Taybetmendiyên ku di edebîyata zarokan de pêwîst in.....	16
1.2.3. Armanca edebîyata zarokan	28
1.2.4. Naveroka berhemên edebîyata zarokan	30
1.2.5. Di edebîyata zarokan de nivîskar û zimanê nivîskar.....	33
1.2.6. Leheng di edebîyata zarokan de.....	37
1.2.7. Hesasîyetên edebîyata zarokan	38
2. ÇÎROKÊN ZAROKAN Û NIMÛNEYÊN WAN DI KURMANCÎYA BAKUR DE.....	42
2.1. Çîroknivîsiya Zarokan di Kurmancîya Bakur de	42
2.2. Rewşa Perwerdehiya Kurdî li Bakur û Bandora Wê ya li ser Edebîyata Zarokan ..	43
2.3. Nejla Öztürk û Çîroknivîsiya Wê ya ji bo Zarokan	45
2.4. Murad Dildar û Çîroknivîsiya Wî ya ji bo Zarokan.....	46
2.5. Çetoyê Zêdo û Çîroknivîsiya Wî ya ji bo Zarokan	48
2.6. Ayşe Berfin Ögüt û Çîroknivîsiya Wê ya ji bo Zarokan.....	50
3. TESBÎT Û ŞIROVEKIRIN.....	52
3.1. Nejla Öztürk û Nirxandina Çîrokên Wê yên ji bo Zarokan	52
3.1.1. Astronot rodî	52

3.1.1.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	52
3.1.1.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	52
3.1.1.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	52
3.1.1.4.	Rexneya lehengan	53
3.1.1.5.	Dîyardeyên ku katine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	53
3.1.1.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	53
3.1.2.	Basiko	53
3.1.2.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	54
3.1.2.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	54
3.1.2.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	54
3.1.2.4.	Rexneya lehengan	54
3.1.2.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	55
3.1.2.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	55
3.1.3.	Kişzer xanîm	55
3.1.3.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	56
3.1.3.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	56
3.1.3.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	56
3.1.3.4.	Rexneya lehengan	56
3.1.3.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	56
3.1.3.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	57
3.1.4.	Marê piçûk	57
3.1.4.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	57
3.1.4.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	58
3.1.4.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	58
3.1.4.4.	Rexneya lehengan	58
3.1.4.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	58
3.1.4.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	59
3.1.5.	Serfirazîya qafreş	59
3.1.5.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	59
3.1.5.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	59
3.1.5.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	60
3.1.5.4.	Rexneya lehengan	60
3.1.5.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	60
3.1.5.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	60
3.1.6.	Şingeşing.....	61
3.1.6.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	61
3.1.6.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	61
3.1.6.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	62
3.1.6.4.	Rexneya lehengan	62
3.1.6.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	62

3.1.6.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	62
3.1.7.	Welatê kûlîlkan	63
3.1.7.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	63
3.1.7.2.	Pîvera peyvên nenasyar	63
3.1.7.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	63
3.1.7.4.	Rexneya lehengan	64
3.1.7.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê	64
3.1.7.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	64
3.1.8.	Xalxaloka xeydok	64
3.1.8.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	65
3.1.8.2.	Pîvera peyvên nenasyar	65
3.1.8.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	65
3.1.8.4.	Rexneya lehengan	66
3.1.8.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê	66
3.1.8.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	66
3.1.9.	Kesper	66
3.1.9.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	67
3.1.9.2.	Pîvera peyvên nenasyar	67
3.1.9.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	67
3.1.9.4.	Rexneya lehengan	67
3.1.9.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê	67
3.1.9.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	68
3.1.10.	Paşayê qelew	68
3.1.10.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	68
3.1.10.2.	Pîvera peyvên nenasyar	68
3.1.10.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	69
3.1.10.4.	Rexneya lehengan	69
3.1.10.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê	69
3.1.10.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	69
3.1.11.	Pirtika berfê	69
3.1.11.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	70
3.1.11.2.	Pîvera peyvên nenasyar	70
3.1.11.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	70
3.1.11.4.	Rexneya lehengan	71
3.1.11.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê	71
3.1.11.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	71
3.1.12.	Berxnaz	71
3.1.12.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	72
3.1.12.2.	Pîvera peyvên nenasyar	72
3.1.12.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	72

3.1.12.4.	Rexneya lehengan	72
3.1.12.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	72
3.1.12.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	73
3.1.13.	Bêsebirbûna pirtik	73
3.1.13.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	74
3.1.13.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	74
3.1.13.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	74
3.1.13.4.	Rexneya lehengan	74
3.1.13.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	74
3.1.13.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	75
3.1.14.	Pelşîn û koçer	75
3.1.14.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	76
3.1.14.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	76
3.1.14.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	76
3.1.14.4.	Rexneya lehengan	76
3.1.14.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	76
3.1.14.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	77
3.1.15.	Şahkeran.....	77
3.1.15.1.	Pîvera firêjahîya hevokan.....	77
3.1.15.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	78
3.1.15.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	78
3.1.15.4.	Rexneya lehengan	78
3.1.15.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	78
3.1.15.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	79
3.1.16.	Xelata kîso	79
3.1.16.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	79
3.1.16.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	79
3.1.16.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	80
3.1.16.4.	Rexneya lehengan	80
3.1.16.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	80
3.1.16.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	80
3.1.17.	Rexnaya giştî li ser çîrokên Nejla Öztürk	80
3.2.	Mûrad Dildar û Nirxandina Çîrokên Wî yên Ji Bo Zarokan.....	82
3.2.1.	Qesra spî.....	82
3.2.1.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	82
3.2.1.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	82
3.2.1.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	83
3.2.1.4.	Rexneya lehengan	83
3.2.1.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	83
3.2.1.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	83

3.2.2.	Dara sêvê.....	84
3.2.2.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	84
3.2.2.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	85
3.2.2.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	85
3.2.2.4.	Rexneya lehengan	85
3.1.1.2.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	85
3.2.2.5.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	86
3.2.3.	Gola şîr.....	86
3.2.3.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	87
3.2.3.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	87
3.2.3.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	87
3.2.3.4.	Rexneya lehengan	87
3.2.3.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	87
3.2.3.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	88
3.2.4.	Kanîya zêrîn	88
3.2.4.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	89
3.2.4.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	89
3.2.4.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	89
3.2.4.4.	Rexneya lehengan	89
3.2.4.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	89
3.2.4.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	90
3.2.5.	Kurmên reş	90
3.2.5.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	90
3.2.5.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	90
3.2.5.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	91
3.2.5.4.	Rexneya lehengan	91
3.2.5.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	91
3.2.5.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	91
3.2.6.	Marê sor	92
3.2.6.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	92
3.2.6.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	92
3.2.6.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	92
3.2.6.4.	Rexneya lehengan	93
3.2.6.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	93
3.2.6.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	93
3.2.7.	Çîyayê spî.....	94
3.2.7.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	94
3.2.7.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	94
3.2.7.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê	94
3.2.7.4.	Rexneya lehengan	95

3.2.7.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	95
3.2.7.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	95
3.2.8.	Stêrka piçûk	96
3.2.8.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	96
3.2.8.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	96
3.2.8.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	96
3.2.8.4.	Rexneya lehengan	96
3.2.8.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	97
3.2.8.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de ..	97
3.2.9.	Rexnaya giştî li ser çîrokên Murad Dildar	97
3.3.	Çetoyê Zêdo û Nirxandina Çîrokên Wî yên Bo Zarokan.....	98
3.3.1.	Gurê kubar	98
3.3.1.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	99
3.3.1.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	99
3.3.1.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	99
3.3.1.4.	Rexneya lehengan	99
3.3.1.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	100
3.3.1.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	100
3.3.2.	Zozan û gernas	100
3.3.2.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	101
3.3.2.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	101
3.3.2.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	101
3.3.2.4.	Rexneya lehengan	101
3.3.2.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	102
3.3.2.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	102
3.3.3.	Daweta noko û nîskê	102
3.3.3.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	103
3.3.3.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	103
3.3.3.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	103
3.3.3.4.	Rexneya lehengan	103
3.3.3.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	103
3.3.3.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	104
3.3.4.	Ejderhayê tirsonek.....	104
3.3.4.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	104
3.3.4.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	105
3.3.4.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	105
3.3.4.4.	Rexneya lehengan	105
3.3.4.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	105
3.3.4.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	106
3.3.5.	Rexneya giştî li ser çîrokên Çetoyê Zêdo	106

3.4.	Berfîn Ayşe Ögüt û Nirxandina Çîrokên Wê yên ji Bo Zarokan	107
3.4.1.	Dara pîroz.....	107
3.4.1.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	107
3.4.1.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	107
3.4.1.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	107
3.4.1.4.	Rexneya lehengan	108
3.4.1.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	108
3.4.1.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	108
3.4.2.	Kewên gozel.....	109
3.4.2.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	109
3.4.2.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	109
3.4.2.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	110
3.4.2.4.	Rexneya lehengan	110
3.4.2.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	110
3.4.2.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	110
3.4.3.	Xezal û qertel	111
3.4.3.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	111
3.4.3.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	111
3.4.3.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	111
3.4.3.4.	Rexneya lehengan	112
3.4.3.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	112
3.4.3.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	112
3.4.4.	Şînmorîka zînê	112
3.4.4.1.	Pîvera dirêjahîya hevokan	113
3.4.4.2.	Pîvera peyvên nenasyar.....	113
3.4.4.3.	Guncanbûna ziman û vegotinê.....	113
3.4.4.4.	Rexneya lehengan	113
3.4.4.5.	Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê.....	114
3.4.4.6.	Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de	114
3.4.5.	Rexnaya giştî li ser çîrokên Ayşe Berfîn Ögüt.....	114
3.4.6.	Hin statîstîkên li ser çîrokan.....	116
ENCAM.....		119
ÇAVKANÎ.....		123
PÊVEK.....		126

LÎSTEYA TABLOYAN

Çarçove 1. Astên Xwendinê li gorî Formûla Dale-Chall.....	4
Çarçove 2. Dirêjayîya Hevokan.....	116
Çarçove 3. Mijarên Berheman.....	117
Çarçove 4. Cûreyên Berheman.....	118
Çarçove 5. Lehengên Çîrokan.....	118



KURTEBÊJE

amd.:	amadekar
bnr.:	binêre
ed.:	edîtor
hwd.:	her wekî din
s.:	sayfa
vgz.:	veguhêzer
wer.:	wergêr

DESTPÊK

Giringî û Armanca Xebatê

Zarok, herçiqas di nav jîyana rojane de cih bigirin jî xwedî taybetmendiyên xwe ne. Hest û ramanên wan, dîtin û tevgerên wan xwedî kesayetên cuda û xweser in. Di rewşeke wisa de berhemên ku bo zarokan bîr hûnandin divê van pêwîstîyan li ber çavan bigirin, naverok û amûrên din yê berhemên zarokan bi awayeke hesas û bi gavên guhdarî bîr nivîsandin.

Ev xebat vê armancê dide ber xwe ku berhemên edebîyata zarokan giring in û pêşveçûna zarokan ya pîralî û bi awayeke sazkar ji hêla van berheman ve divê bê piştgirîkirin. Berhemên birêkûpêk divê pêşkeşî zarokan bîr kirin. Li gel van nêrînan, rexnekirina berhemên edebîyata zarokan divê bi awayeke zanistî bîr kirin, kêmasî û alîyên baş yê van pirtûkan bîr nîşandan. Ev xebat, bo van armancên sereke hatîye kirin.

Edebîyata zarokan li Bakur, qadeke nû ye. Berhemên ku li vê qadê tên amadekirin yan jî afirandin carinan hin qaîdeyên edebîyata zarokan pêk naînin. Edebîyata zarokan ya devkî di kurdî de dewlemend be jî dema ku mijar tê ser edebîyata zarokan ya nivîskî heman tişt nikare bê gotin. Tunebûna rexneyê, kêmasîya agahiyên zimanî û naverokî, nîrxên berheman qels dike. Ji bilî van hindikbûna xwînerên qadê jî ji bo ketina nîrxên berheman pîrsgirêkek e. Ji ber van sedeman xebat, roleke giring digire ser xwe ku vê kêmasîyê bi gavekê be jî telafî dike. Xebat di vê armancê de ye ku rêbazeke rexneyî û nivîsê bide ber çavan û agahiyên birêkûpêk li dar bixe. Lêkolîn, ji hêla teorîk ve rêbaza ku di qadê de pêwîstîyê nîşan dide û bi van rêbazan re pratîka rexneyê jî dike. Naverok û zimanê ku li gor rastî û îzafiyeta zarokan çîrokan bîr rexnekirin, nêrîn û ramanên li ser edebîyata zarokan derdixe holê.

Çarçove û Sînor

Ev xebat, bi berhemên edebîyata zarokan ku bi şêwazên edebî hatine rexnekirin hat sînorkirin. Xebat, ji du gavên sereke pêk tên ku yek ji wan xwendina berhemên teorîk yê edebîyata zarokan e, ya din jî rexnekirina berhemên edebîyata zarokan li

gorî van çavkanîyên teorîk in. Berhemên edebîyata zarokan ji hêla naverok, leheng, ziman, vegotin û derûnîya xwîneran ve hatin rexnekirin. Xebat ji rexnaya naverokî û zimanî ve pêk tê. Armanca vê xebatê ya sereke ev e ku çîrokên di kurmancîya Bakur de bîr analîzkirin. Loma çarçove bi çîrokên kurmancîya Bakur hatine sînordarkirin.

Rêbaza Lêkolînê

Di vê xebatê de analîza belgeyî ji rêbazên lêkolîna wesfî hatîye bikaranîn. Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de pirtûk, gotar û xebatên akademîk yê di qada edebîyata zarokan de bi awayeke berfireh hatin lêkolînkirin û xwendin. Piştî berhemên ku hatine hilbijartin bi pîvanên edebîyata zarokan a ku diyarkirî hatine analîzkirin.

Qada Lêkolîn û Nimûneya Hilbijartî

Qada lêkolînê ji çîrokên edebîyata zarokan yê di zaravayê kurmancî de hatine nivîsandin pêk tê. Çîrokên ku hatine hilbijartin ji berhemên ku ramanek berfireh ji qadê temsîl bikin hatin neqandin. 11 pirtûkên ku di naveroka wan de 32 çîrok hene, ji hêla çar nivîskaran ve hatine nivîsandin. Ev nivîskar, ji ber ku di çîroknûsîya zarokan da yê herî naskirî û pîrxwîner û di nivîsandina xwe da berdewam hatin hilbijartin. Di xebatê de çîrokên yê Nejla Öztürk bi navên Kesper, Paşayê Qelew, Pirtika Berfê, Berxnaz, Bêsebirbûna Pirtik, Pelşîn û Koçer, Şahkeran, Xelata Kosî, Astronot Rodî, Basiko, Kizşer Xanim, Serfirazîya Qafreş, Şingeşing, Welatê Kûlîlkan, Xalxaloka Xeydok; yê Murad Dildar bi navên Qesra Spî, Dara Sêvê, Gola Şîr, Kanîya Zêrîn, Kurmên Reş, Marê Sor, Çîyayê Spî, Stêrka Piçûk; yê Çetoyê Zedo bi navên Daweta Noko û Niskê, Zozan û Gernas, Ejderhayê Tirsonê, Gurê Kubar; yê Berfîn Ayşe Ögüt bi navên Şînmorika Zînê, Xezal û Qertel, Dara Pîroz, Kewên Gozel ji hêla ziman, leheng, naverok û taybetmendîyên din yê edebîyata zarokan ve hatin rexnekirin.

Analîzkirina Daneyan

Me nîrxandina bêje û dirêjahîya hevokên çîrokan li gorî rêbaza Wezaretê Perwerdeyê ya Tirkîyeyê û li gorî formulasyona Dale-Chall pêk anî. Formulasyona Dale-Chall nivîsan li gorî bêjeyên nenasyar û dirêjahîya hevokan ji hêla hejmara

bêjeyên di hevokan de analîz dike. Bi tena serê xwe ev analîz agahîyeke berfireh nade. Agahîyên bîdixistin ji hêla guncavbûna zimanê nivîsê ve agahîyan dide. Ji ber vê sedemê dema ku analîz bîdixistin kirin divê rêjeyên din jî bîdixistin. Yek jî pîvanên dirêjahîya hevokan hejmara bêjeyên di hevokê de ne:

Li gorî pîvanên lêkolîn û nirxandina pirtûkan ya Lijneya Talîm û Terbîyeyê ya wezaretê me dirêjahîya hevokan nirxand ku divê di pola yekem a dibistana seretayî de hevokê herî zêde 6-7 peyv, di pola duyem de 8-9 peyv, di pola sêyem de 10 peyv, di pola çarem de 12 peyv, di pola pêncem de jî 14 peyv be (Güleryüz, 2013: 269).

Pîvanên din ya jî hêla zimên ve rêjaya peyvên nenasyar ev in:

Li gorî formûla Dale – Chall, sed peyvên pêşî yê nivîsê wergirtin û tê de hejmara hevokan û peyvên zehmet û nenasyar (peyvên ku bo zarokan di asteke jor de bin) tîn kifş kirin. Dirêjahîya hevokê wiha tîn kifş kirin: Hejmara peyvên li hejmara hevokan tîn parvekirin û paşê encam tîn diyarkirin. Rêjaya peyvên nenasyar jî wiha tîn kifş kirin: hejmara peyvên nenasyar li hejmara peyvên mayîn tîn par kirin û paşê bi 100î tîn car kirin. Encam çî be, rêje ew e (Çetinkaya, 2010: 57).

Çîrokên ku xebat li ser wan tîn kirin jî hêla vegêr, leheng, zincîreya rûdanê, dem û mekan û rastî û îzafiyeta zarokan ve dê bîdixistin rexne kirin. Alozî, naverok, peyam û ramanên di çîrokan de bi rêbazên edebîyata zarokan ve di bin çend sernavan de hatin tesnîfkirin û rexne dê li gor van pîvanan bîdixistin analîz kirin.

Analîzîkirina jî hêla jî ziman ve bi rêya pîvana Dale-Chall pêk tî. Bi saya vê rêjaya nenasyariyê dikare bîdixistin tasnîfkirin û astên bêjeyan bîdixistin zelalkirin.

Çarçove 1. Astên Xwendinê li gorî Formûla Dale-Chall

Di vê çarçoveyê de, astên peyvên nenasyar hatine tasnîfkirin. Ev rêje nîşan didin ku di kîjan temenê de zarok dikarin jî kîjan rêjeyê de jî naverokê bêyî pirsîgîrîk fehm bikin.

Rêjeya Peyvên Nenasyar di Xwendinê de	Asta Xwendinê	Asta Perwerdeyê	Temen
4,9	Asta 1.	Dibistana Seretayî	5-10 Salî
	Asta 2.		
	Asta 3.		
	Asta 4.		
5,0-5,9	Asta 5.	Dibistana Navîn û Amadehiyê	10-12 Salî
	Asta 6.		
6,0-6,9	Asta 7.		12-14 Salî
	Asta 8.		
7,0-7,9	Asta 9.		14-16 Salî
	Asta 10.		
8,0-8,9	Asta 11.		16-18 Salî
	Asta 12.		
9,0-9,9	Asta 13.	Zanîngeh	18-22 Salî
	Asta 14.		
10+	Asta 15. û jortir		22+

1. ZAROK Û EDEBÎYATA ZAROKAN

Xwendin, bi hezar salan di jîyana mirovan de xwedî pêwîstîyeke sereke ye. Geşedan, pêşketin û afirandin, qaîdeyên xwe li ser nivîs û xwendinê saz dikin. Piralîbûna xwendinê gav bi gav geş dibe û cureyên berheman jî di vê astê de zêde dibin.

Dîroka edebîyatê kûr û kevnar e lê heman tişt ji bo edebîyata zarokan nikare bê gotin. Edebîyata zarokan, edebîyateke modern e. Derketina edebîyata zarokan, bi naskirina zarokan re têkildar e. Bi saya psîkolojî û civaknasîyê zarok hatin naskirin û pênasekirin. Vê rewşê, zarok û zarokatî nû derxiste pêş çavan û agahîyên li ser wan zêde kirin. Di vê astê de edebîyata zarokan jî derfeta zayîna xwe dît.

1.1. Zarok û Zarokatî

Zarok û zarokatî ji hêla civaknasî û psîkolojîyê ve bêjeyeke nûjen e. Agahîyên li ser zarokan di demên modern de hin bi hin zêdebûn û zarok û zarokatî hat nas kirin. Kesayet, taybetî, rastî û îzafiyeta zarokan bi dîtbarî û lêkolînan dîyar bû. Zarok, berî van guherînan mîna kesekî tenê ji fizîkî ve piçûk dihat dîtin û danasîn. Dema ku agahîyên li ser zarokan zêdebûn êdî zarok derketin darî çavan û xebat li ser wan hatin çêkirin.

Şirin, qonaxên zarokatîyê bi du alîyan dide nasîn:

Du qonaxên zarokatîyê hene. Ya yekem zarokatîya kevneşopî, ya duyem zarokatîya modern e. Tesewura zarokatîya modern, utopyaya herî pedagojîk ya Ronesansê ye. Li gorî Eriksonê psiko-dîroknas û herweha dîroknasê civakê; zarokatî bi tevgerê çandî derketîye holê û bi pêş ve çûye. Li gorî ramana Postman jî zarokatîya nû ew e ku cudabûna zarokatî û mezinbûnê hin bi hin kêr dibe (Şirin, 2012: 12).

Di bûyerên civakî de guherînên ku tên serê mirovan, di civakê de guherînên mezintir bi xwe re tînin. Zarokatîya ku berê tenê weke temenekî dihat dîtin, piştî Ronesansê di nav civakê de bû asteke ramanî û pêleke derûnnasîyê. Vê guherînê, nêrîna li ser zarokan jî bi xwe re anî. Bi piranî jî di serdema modern de ev zarokatî geş bû û veguhezî kesayeteke serbixwe.

Postman, mezinkirin û hişmendkirina zarokan bi rêya pirsên giring rexne dike û ramaneke rexnegir tîne ziman:

Hemû lêkolînên ku li ser zarokatîyê hatine kirin bi giştî şîroveyeke li ser paradîgmaya zarokatîyê ne. Tu kesî negotîye zarok ji mezinan cuda ne. Tu kesî nîqaş nekiriye ku divê zarok xwe bi destên xwe mezin bikin. Tu kesî îtiraz nekiriye ku berpirsiyariya zarokan li ser mezinan e. Bi rastî tu kesî nîqaş nekiriye ku di mezinkirina zarokan de yên herî baş û şareza mezin in. Em dikarin bêjin ku paradîgmaya modern ya zarokan û paradîgmaya mezinan ya modern heman tişt in (Postman, 1995: 85).

Postman, di mezinkirina zarokan de bi nêrîneke cuda li mijarê dinêre. Ev nêrîn pirsên li ser hebûna zarokatîyê jî bi xwe re tîne. Zarok çi ye, ji ber çi wisa ye û divê çawa be? Ev pirsên ku bersivên berfireh dixwazin ji hêla mezinan ve divê bîn fêmkirin. Ji ber ku her ramanêke mezinkirinê bi xwe re zarokatî û mezinatîyekê cuda tîne holê.

Hin rewşenbîrên bîyanî, qonaxên zarok û zarokatîyê bi rêya navdisiplînî şîrove dikin û giringîya qonaxa zarokatîyê nîşan didin:

Albert Einstein, di hîskirina fîzîkî ya zarokan de hêlên taybet dîtine û pêşnîyazî jî hempişeyê xwe yê Swîsreyî Jean Piaget re kirîye ku li ser têgihiştên zarokan yên fîzîkî lêkolînê bike. Li gorî Freud jî bûyerên ku di zarokatîya mirov de qewimîne bandoreke giring li jîyana wî/wê ya paşerojê dike (Houdé, 2006: 10).

Dema ku em Postman û Freud li gel hev şîrove bikin mijar ronîtir dibe. Zarok, ne tenê figûrekî piçûk û bêhest û bê raman in. Ew bi serê xwe kesayetên taybet in ku bi der û dora xwe re di nava danûstendinekê de ne. Her bûyer û jîyan di bin hişê zarokan de ji bo afirandina kesayetê nimûneyekê ava dike.

Şîrin, li ser pênaskirina bêjeya zarokê disekine. Şîrin, tîne ziman ku pênaseya zarok, divê ji zarok bixwe derkeve hole:

Ji bo afirandina têgiha zarok ya bi gelemperî bê sazkirin divê ku em pêşî zarok mîna kesayetekî bibînin. Pêwîstiya pêşî ev e ku em karibin li ser “zarok” bifikirin. Herweha bêtir ku têgih bîn saz kirin, di derbarê mijarê de nêrînek jî nikare bê afirandin. Di civakên ku negihîştine asta têgihbûnê de şîrove, hêj jî di asta gelemperîkirinê de ye. Hemû tişt ber bi sivikbûnê ve diçe. Ev sivikbûn, hem fêmkirina wateya jîyanê dixê zorê hem jî pêşveçûna ramanê sînordar dike (Şîrin, 2010: 19).

Bi şîklê kesayetekî qebûlkirina zarokan, qebûlkirina tiştên wan yên taybet in jî. Ziman, raman, kiryar û armancên zarokan bi vê ve girêdayî ye. Dema ku zarok bîn naskirin tevgerên zarokan jî dê ji nêz ve bîn nas kirin. Ev rewş dê bibe mîna rêberekê ji wan kesên ku bi zarokan re mijûl dibin. Naskirina zarokan, dê pêşveçûn û

hişmendîya li ser wan jî hêsanîr bike. Dema ku civak di hêla civaknasî, felsefî, pîşesazî û dadî de bi pêş ve diçe, ji zarokan re jî qadên nû ava dike û civak wan geş dike. Zarokên civakên ku negihîştine vê astê jî li gorî hemtemenên xwe yên din ji gelek alîyan ve qels dimînin.

Yörükoğlu, balê dikişîne ser şaşîyekê û dibêje ku agahîyên li ser zarok û zarokatîyê xwedî hêlên çewt in:

Li gor bawerîyeke gelemper demên zarokatîyê, salên aramî û dûrî xemgînîyê ne. Çavdêr dibêjin ku ev ne rast e. Ya rastî ew e ku zarokatî di nav tirs, fikar, neyênî û tengezarîyan de derbas dibe. Bîranîna zarokatîya xweş, ji sedema ku kesên mezin bîranînên xwe yên ne baş yên wê demê li derveyî hişê xwe dihêlin pêk tê (Yörükoğlu, 2014: 24).

Zarok, piştî ku hatin cihanê û pê ve der û dora xwe hin bi hin nas dikin û pê re têkilîyan datînin. Bi wan têkilîyan agahîyan distînin, digihêjin ramanan û di bîra xwe de kesayetîyeke xwe diafirînin. Di vê astê de zarok dibin xwedî otorîteyekê û li hemberî bûyer û jîyînan hestên wan çêdibin. Di nav wan de ne tenê kêf herweha xemgînî, tirs, kelecana hwd. hene. Salên zarokatîyê nikarin wek salên aramî û xweşîyê bidin naskirin û xuyakirin. Ev şirove, ji nenaskirina zarokan û zarokatîyê tê.

Li gor Meriç, guherîna civak û şertên civakê guherîna zarok û zarokatîyê jî bixwe re tîne û ev pir tesîrê li ser der û dora zarokan dike:

Meriç dibêje ku (1999) kesên mezin yên civakên pîşesaz, tiştên ku di zarokatîyê de ber bi çav bûn hemû wîndî kirin: lîstîk, meraq, qabilîyeta matmayîbûnê, qabilîyetên lîstîk û fantazyayê. Ew -zarok- ne ji hêla gîyanî ne ji hêla hîsî ve ne zarok in ne ji mezin in; ew, kesên pasîf in ku bi amûrên karsazî yên gemarî jîyana xwe berdewam dikin û cureyên lîstîkên wan jî xam bûne (loto, spor toto hwd.) (Şirin, 2012: 29).

Fêrbûn û pêşvêçûna zarokan bi hêza der û dora xwe ye û divê ev derdor bi awayeke xwezayî û bi hişmendî li ser zarokan bisekine. Peyv, gotin, lîstîk, têkilî hwd. ji bo zarokan pir giring in ku wan bi pêş ve bibe. Dema ku ev pêwîstî ji holê radibin zarok jî ji wan bêpar dimînin. Geşbûna wan kêmtir dimîne.

Bandora civakê ya li ser zarok bi awayeke xurt û tund li ser zarokan xwe dide der. Tezcan vê rewşê wiha tîne ziman:

Dîroka zarokatîyê, di navbera du an jî sê sed salan de derketîye ber çavan. Di çandên kevnar de zarok, piştî demeke dirêj a zarokatîyê rasterast diketin nav rolên civakî. Ariê, îdia dike ku di Serdema Navîn de “zarokatî” nebû. Di wêneyên wê serdemê de zarok xwedî rûyên jîrek in û bi cil û bergên di şiklê mezinan de weke “mezinên piçûk” tên nîşandan. Lîstik û pêlîstokên wan yên serbixwe nebûn. Di encamên guherînên di civakên nûjên de tê gotin ku zarokatî dîsa ji heqîqeta xwe dûr dikeve. Bo nimûne, zarokên pir piçûk jî li bernameyên mezinan temaşe dikin. Ev taybetmendî dike ku zarok li gorî hemsalên xwe yên berê bêhtir ji jîyana mezinan agahdar bibin (Tezcan, 2012: 3).

Tê xuyakirin ku binavkirina zarok û zarokatîyê ne ji demeke gelekî kevnar yan jî dûr tê. Zarok, heta demeke jî ne xwedî asteke civakî bûn û tu taybetmendîyên wan tune bûn. Ji ber vê rewşê ew ne xwedî kesayeteke civakî jî bûn. Lê dîsa bi qasî ku em jî vê jêderê fêhm dikin ku zarok di demên modern de dîsa kesayeta xwe winda dikin. Jîyana mezinan jîyana zarokan dorpeç dike û qada wan ya serbixwe asteng dike.

“Berevajî pitikîyê zarokatî ne kategorîyeke bîyolojîk e, kategorîyeke civakî ye.” (Postman, 1995: 7). Dema ku civak dikeve nav babetê; di nav xwe de çand, ziman, bûyer, jîyan û kesayetê dihevine. Ev taybetmendî bi xwe re zarok û zarokatîyê jî diafirîne. Cudabûna giring ne bi bîyolojîyê bi civakê re tê sazîkirin.

“Zarokatî, bi netewewê-dewlet û azadîya oldarîyê ve weke asteke civakî û psîkolojîk di sedsala 16an de ava bûye û heta roja me teşe girtîye û piştgirî dîtîye.” (Postman, 1995: 8). Di vir de dikare bê gotin ku zarokatî tiştêkî afirandî ye. Bêguman ev pêvajoyê ne bi carekê re bi zanebûn û bi hişmendîyê, çêbûye. Dema ku civak ji hin alîyan ve tê guhertin yan jî xwe bi pêş ve dibe, hin taybetmendîyên nû jî di vê pêvajoyê de diafirîne. Zarokatî jî piştî asteke civakî hatîye afirandin.

Zarok, jîyana zarokan ji nêz ve dibînin û hin bi hin kesayet û jîyana xwe nêzî jîyana mezinan dikin. Ev rewş, şibandînekê bi xwe re tîne ku ev gav bi gav zarok û zarokatîyê ji hole dirake. Ev rewş, jîholêrakirina zarok û zarokatîyê ye.

Xwendin, cudabûn û piralîbûnê çêdike. Ji herêm, çand, deng, ziman, ol, zanist, hest hwd. yên cuda berhem, raman û fikrên ji hev cuda tîne ba hev û ev di hişên mirovan de piralîbûnekê ava dikin. Dema ku mirov ji van tiştan dûr be, weke hêvîyeke ramanî û yekalî di nav kom an jî civakê de çêdibe. Êdî, zarokên di nav vê civakê de jî kesayeteke serbixwe nikarin pêk bînin. Di encamê de zarok jî dişibin mezinan.

Plumb, şewaz û tevgerên zarokan yên di demên berê de nîşan dide û di heman wextî de zarokatîya demên bihûrî nîşan dide:

Plumb dibêje ku (1971) zarokên ku di Sedsala Navîn de di nav civaka devkî de dijîyan û ji hêla sazîyan ve nedihatîn sînorkirin di nav vê çandê de hemû tevger û lebatên xwe dikirin. Zarokekî heft salî ji bilî kapasîteya xwe ya şer û evîndarîyê ji hemû alîyan ve zilamek bû (Postman, 1995: 28).

Di demên berê de wextê ku çanda devkî û civak nebûbû pîşesaz, zarok di nav hemû tevgerên mezinan da diçûn û dihatin. Ev rewş, zarokên mîna mezinan derdixistin holê. Di dema niha de jî heman tişt bi rêya televîzyonê tê kirin û zarok li bername û naverokan temaşe dikin. Bêguman ev rewş heman encaman derdixe holê.

Postman, cih girtina teknoloji û TVyê ya di nav mirovan de û bandora wan a li ser geşedana zarokan bi awayeke berfirêh tîne ziman:

Bi matbaayê re divê têgihîştina nûjen jî hatiba û ev bi rêya xwendin û ketina jîyana tîpografîyê bihata kirin. Ji bo ev bibe jî divê perwerde bibûna. Bi vî awayî şaristanîya Ewropayê dibistan jî nûve îcat kirin. Bi îcatkirina dibistanê re zarokatî jî bû weke tiştekî mecbûrî. Zarokên dema me, bi saya sembol û mûcîzeyê elektrîkê ji hemû tiştên ku mirovekê gihaştî dizane haydar in. Êdî tiştekî veşartî nemaye, tiştekî ku yek jê bitirse nemaye, tiştekî ji raya giştî bê veşartin nemaye. Çi bê gotin bila bê gotin, zarokên serdema me, ji zarokên serdemên din bi rêya televîzyonê bêhtir tên agahdarkirin û ev rewş ji hêla rêvebirên televîzyonan ve tê kirin ku di bin bandorê de tên qebûl kirin (Postman, 1995: 52, 125).

Ev mecbûrîyet, mecbûrîyeteke zanistî ye. Dema ku di derbarê zarokan de jî hêla pedagojîk, derûnî, gîyanî û pêşveçûna pîralî ve agahî zêde dibin, pergala bixwe amûr û pêwistîyên nû diafirîne û pêşkêşî zarokan dike. Hebûn an jî afirandina dibistanê roleke wisa saz kir û avakirina zarokatîyê jî bi xwe re anî.

TV di malê de û bi gelemperî di civakê de hatîye asta herî mezin. Lê ev ast, asteke yekalî ye. Kontrol, di destê televîzyonê de ye. Naveroka ku ji hêla hêzên vê otorîteyê ve tê amadekirin li ser zarokan bandorê dike û ev, teşe dide pêşveçûna wan. Ev têkilîya yekalî, bişaftinê li ser kesayeta zarokan dike û wan li gorî daxwaza serdestan mezin dike.

“Zarokatî weke hînbûna ziman e. Zarokatî xwedî bingeheke bîyolojîk e lê heta bi civakê re têkilîyeke zarokatîyê dest pê neke û bi vê re mezin nebe, bi wateyeke din

eger hewcedarîyê pê nebîne ihtîmal heye ku zarokatî jî pêk neyê.” (Postman, 1995: 182). Bîyolojî, ne qadeke fikrî ye. Bandorê li ser derûnîyê bike jî ew bi laş ve girêdayî ye. Eger ku der û dora zarokan, wan mîna zarokan nebîne û tevgerên xwe bi vî awayî li dar nexer zarok, piştî demeke kin dê bibin mîna mezinan û ti cudabûna wan ji der û dora wan namîne. Ev, xilasbûna zarokan û zarokatîyê ye.

“David Elkind dibêje ku zarokên serdema me bi saya înternet, televîzyon, telefon û tiştên din yên teknolojîyê; dem, cih, têkilîyên civakî û heta bi rastîyê jî ji zarokên serdemên berê cudatir dibînin.” (Lukens ûd, 2018: 15). Zarok, bi hatina xwe ya cihanê dest bi çavdêrî, fêmkirin û têkilîyê dikan. Çarçoveya der û dora wan bi çî rengî be hûnandina wan ya di derbarê cihanê de jî ê wisa be. Cihana derveyî her tim tê guhertin. Ev guhertin rasterast bandorê li ser struktura hişê zarokan jî dike. Dîtin, bihîstin û şirovekirina zarokan di vê çarçoveyê de ava dibe. Herweha hemû raman û tevgerên wan jî.

“Teorîya Dresang: Li gorî nêrînan zarokên ku piştî sala 1977an hatine dinyayê, pêwîstîyê bi pirtûkên ku xwedî taybetmendîyên dijîtal û înteraktîf dibînin.” (Lukens ûd, 2018: 23). Guherîna hişê zarokan, guherîna berhemên ku ji bo wan tên amadekirin jî bi xwe re tine. Danûstandina di navbera van her du qadan de têkilîyeke xurt û zindî ye. Divê ev têkilî her tim hebe jî, ji ber ku zarok, divê cihana derveyî di pirtûkên xwe de jî bibînin.

Hin rewşên bîr, mercên ku di dema modern de berevajî bûne tînin zimên û guherîna tund bi vî şiklî bi ziman dikan:

M. Mead, di xebata xwe ya bi navê Culture and Commitment de dibêje ku êdî kesên gihastî nikarin ji kesên ciwan re şewirmendîyê û aqilmendîyê bikin û herweha em dikevin nav jîyaneke nû, xurt û bi enformasyonê guhertî. Li gorî Mead, ne mimkûn e ku ciwanek birastî kesekî mezin be ku jê bêhtir zanibe. Postman jî dibêje ku cudabûna nifşan ji holê rabûye. Niha ji bedêla “serpêhatîyan”, “agahî” bi nixtir e. Ji ber vê yekê, tecrûbe kêmtir dibe. Di vê rewşê de wekhevîya herdu nifşan pêk hat. Çanda populer ku ji hêla serdema zanistê û medyayê ve tê piştgirîkirin cudabûn ji holê rakir. Di dawîya dawî de em zarokên gihastî dibînin (Tezcan, 2012: 110).

Cudabûna di navbera temen û rolên civakî de radibe. Bi rêyên teknolojî û derfetên wê yên ku ji bo her kesî ne, ast û qadên jîyanê nêzîkî hev bûn. Bûyer an jî

deranînên ku bi salan diqewimin niha di demên pir kin û gelekî xurt de tên jîyîn. Ev guherîn, bandora temen û serpêhatîyan kêr dike. Zarok an jî mezin, dikarin heman tiştî bi hev re bibin û heman bertekê nîşan bidin. Agahîyên ku bi salan dihatin niha di demeke pir kêr de dikarin bên dîtin. Rol û armancên rolên civakî tên guhertin û ev rewş guherîna tevgeran jî diguherîne.

“Derengmayîneke ku zaroka rizgar bike têrî rizgarbûnê nake.” (Şirin, 2010: 14). Zarokbûn an jî zarokatî, demeke pir krîtîk û sosret e. Di vê demê de kesên ku ji zarokan berpirsîyar in divê hay ji vê hebin û bi zanistî berpirsîyariya xwe binin çih. Dema ku ev nebe, zarok û zarokatî ji dest diçe.

Rousseau, derûniya zarokan dide nasîn û pêvajoyên guharîna wan li ver çavan ronî dike:

Rousseau, dibêje ku zarok xwedî şemayên raman û hestên taybet in û bi pêdivîya xwezayê gav bi gav ev taybetmendiyên wan tên guhertin û bêhtir tevlihev dibin. Ji ber vê yekê, zarok berî ku di din bandora der û dorê de bimin, bi rêya xwezaya xwe dê bên guhertin û di wan qonaxan re derbas bibin. Lê çend psikologên geşedanê dibêjin ku zarok bi der û dora xwe re di nav têkilî û çalakîyan de ne û bi rêya derdorê bi pêş ve diçin (Yeşilyaprak, 2004: 31).

Mirov nikare têkilîyên zarokan ji der û dorê bibire. Zarok jî endamên civakê ne û divê bi civakê re bidin û bistînin. Lê belê ev têkilîya bi civakê re divê di bin kontrola wan kesan ku bi zarokan re mijûl in de be. Belê, zarok xwedî mêjîyekî cuda ne û rê û rêbazên wan yên di derbarê hînbûna cihana derveyî de bi serê xwe ne, lê ev nayê wê wateyê ku divê zarok ji derdorê bên qutkirin. Ew kesên berpirsîyar, divê taybetmendiyên zarokan û fêrbûna derveyî bi awayeke zanistî saz bikin.

1.2. Edebîyat û Edebîyata Zarokan

Cudabûna zarokan, cudabûna edebîyata zarokan jî bi xwe re tine. Pênasa edebîyata zarokan bi pênasbûna zarokan ve têkildar e. Agahîyên li ser zarokan amûrên qadê mîna naverok, ziman, honak hwd. ji êşkere dike. Edebîyata zarokan çîye, çawaye û pêwîstiyên wê çi ne? Bersivên van pirsan, bi zarok û zarokatîyê ve ji nêz ve girêdayî ye.

“Wêje; hunera ku bûyer, raman, hestan û xeyalan bi rêya ziman bi devkî û nivîskî ve şêwandin e.” (TDK, 2005: 600). “Wêje, ew qad e ku rastîya mirov û jîyanê ji hêla keda nivîskar ya ramanî û derfetên ziman ve ji nû ve difesilîne.” (Sever, 2013a: 177). Edebîyat, ew qad e ku bi hûnandinê tê sazîkirin. Bi leheng, mijar, bûyer, der û dem. Ev çend amûr, bi rêya hişên nivîskar tên badan û afirandin. Naverok, herçiqas honak jî be bi jîyana rastî ve jî tê girêdan û têkilîyek di navbera qadên rastî û xeyalî de tê danîn. Her du qad bandorê li hevdu dikin. Jîyan û serpêhatîyên mirovan mijarên sereke ne ku di edebîyatê de cih digirin.

Di hin rewşan de alozî di derheqê afirandina naveroka berhemên zarokan berdewam dike û nivîskar vê sernavê li gor nêrîna xwe tînin ziman:

Peyva Anton Çexov ya navdar: Cudabûn di navbera edebîyata zarokan û ya mezinan de nîn e. Ku hebe jî ev cudabûn wek aspirîneke mezin ya zarokan e ango cudabûna nîv dozê ye. Eger jî vê cudatîyê hêsanî, hevokên kin û sînorkirî bê fêmkirin bêguman ev rast e. Lê ku hûn pirtûkên klasîk kurt bikin û wan bixin wek çûkên rip û rût, ev şaş e (Nas, 2004: 34).

Çexov, dixwaze giringîya naverok û bikaranîna ziman ya di berhemên zarokan de bîne ziman. Ji Çexov tê fêmkirin ku herçiqas jî hêla mijarê sînordarî nebin jî ji hêla ziman û şêwazê ve cudabûnek heye.

Pirtûkên hatine kurtekirin pîrsgireka qadê ye û hin nivîskarên mîna ÖZ wiha dibêjin: “Erdal Öz jî dibêje ku ji bo zarokan pirtûkên herî xirab jî ev –pirtûkên hatine kurtekirin- in. Ev ku bêtahm in.” (Nas, 2004: 34). Öz, dibêje ku divê pirtûk rasterast ji bo zarokan bên nivîsîn.

Edebîyata zarokan bi naskirina zarokan ve girêdayî ye. Dema ku naskirin zêde dibe, naveroka berhema zarokan jî bêhtir tê asta zarokan û naverok zêdetir nêzî zarokan dibe. Herçiqas li ser rûyê erdê çand, ziman û taybetmendîyên cuda hebin jî tevgerên zarokan nêzî hev in. Dîtin û şirovekirina zarokan di temenên pêşî de nêzî hev in. Nivîskar divê li ser vê rewşê bisekinin. Nivîsên egoîst û tund divê di edebîyata zarokan de tune bin.

Naverok, armanc û afirandina pirtûkên zarokan xwedî taybetmendîyên xwe ne û ev di dema nivisandin ya di amadekirina berhemên zarokan de divê li ber çavan bê girtin:

Edebîyata zarokan ji serdema berî dibistanê heta serdema kamilbûnê dewam dike. Bi gotineke din pirtûkeke ku armanca wê gihaştina girseyekê temenên wan di navbera 4-12an de be û ji hêla nivîskî û ramanî ve ji van kesan re guncan be, mirov dikare bêje ku ev pirtûk pirtûka edebîyata zarokan e. Pirtûkeke ku armanca wê ev kom be, divê ji hêla fêmkirin, ziman, îmaj û pêwendîyên perwerdeyê ve zarokên van deman li ber çavan bigire. (Dilidüzgün, 2007: 18, 88).

Her temeneke zarokatîyê xwedîyê taybetmendîyê xwe ne. Ji ber vê sedemê pirtûkên ku ji bo vê serdemê tên amadekirin divê van taybetmendîyan bişopînin û ji hêla naverok, ziman, leheng, honak û derûnê ve tekûz bin. Alîyekî kêr, ji bo zarokan kêmasîyê derdixe û ji nêrîna zarokatîyê re pirsgirêk e.

Di edebîyata zarokan de mijara naverokê gelek caran ji gelek der û doran ve tê rexnekirin. Pirsên weke “Mijar divê çi be, di naverokê de divê çi bê bikaranîn, diyarbûna tundîyê divê di çi astê de be?” û hwd. tên şirovekirin. Herçiqas hin alî li dijî naveroka azad bin jî hin bi hin tê qebûl kirin ku divê naveroka pirtûkên zarokan piralî bin. Bêguman honak, armanc, peyama û amûrên din yên berheman divê li gorî asta zarokan bîr nivîsandin lê divê ev tevger bi sînoran mijaran qut neke.

“Clemens dibêje ku (1975) herçiqas pirtûkên zarokan polîtîk bin jî, divê di naverokên wan de doktrîn û alîgirtin tune bin.” (Dilidüzgün, 2007: 92). Mijar û vegotina mijarê ji hev cuda ne. Bûyerên ku di jîyanê de pêk tên divê bi awayeke bêalî bîr bikaranîn. Armanca nivîskar divê ne ew be ku zarokan bi alîyekî ya jî bi hezekê ve girê bide.

“Marc Soriano: Pirtûkên zarokan divê weku belavokekê ku ragihandin û pêwendîyê saz bikin di navbera kesekî jîr û zarokekî de ku di heman civakê de xwedî tecrûbe û jîrbûnê ye.” (Şirin, 2007b: 22). Ev têkilî divê bi awayeke dualî bê sazîkirin. Danûstandinên piralî, têkilîyên zanyarî û ragihandinên jidil ji bo pêşveçûna zarokan encameke serkeftî derdixe. Pirtûkên zarokan, ne tenê weke amûrên edebîyatê ne. Ev

pirtûk, afirandina zarokan û zarokatîyê dikarin hilgirin û zarokan ji hêlên pêwîst ve geş bikin.

Qonaxa zarokatîyê, ji hêla salan ve kurt e lê li gel vê bandora mezin û dûvûdirêj li ser temenên dahatûyê dike:

Ji bo edebîyata zarokan li gel şiroveyên erênî yên neyênî jî hene. Ji ber ku dema zarokatîyê di jîyana mirovan de demeke kin e, hin lêkolîner serpêhatîyên zarokan piçûk dihesibînin û vê serdemê ji bo pêşveçûna kesayetîya zarokan bînîrx dibînin. Hin lêkolîner jî dibêjin ku pirtûkên ji bo mezinan hatine nivîsandin divê ji bo zarokan bîn hêsankirin û kurtkirin. Ev kesên ku wiha difikirin piçûkbûn û cudabûna zarokan qebûl dikin lê cudabûna kesayet û gîyanên wan qebûl nakin (Yalçın û Aytaş, 2011: 16).

Naskirina zarokan bi xwe re çend berpîrsîyarîyan tîne. Yek ji wan jî avakirina edebîyateke zarokan ya serbixwe ye. Bêguman dibe ku hin pirtûkên mezinan ji bo zarokan jî guncan bin lê ev hejmar ne pir e û ev rê jî ne ew rê ye ku mirov her tim dikaribe bişopîne. Zarok, herçiqas bi kesên mezin re heman derdorê parve bikin jî hest, raman, nihêrîn û tevgerên wan cuda ne. Pirtûk yan jî bi gelemperî edebîyata zarokan divê bê sazîkirin û ev sazîkirin divê li gorî çarçoveya rastî û îzafîyeta zarokan be.

“Hunt (2005) dibêje ku bi gotineke din îzafîyeta zarokan, li gorî temen û geşedana zarokan diyarkirina hin esasên berhemên edebî ye.” (Subaşı, 2021: 228). Bingeheke edebî ku esasên xwe ji temen, zanebûn, pêşveçûn û helwestên zarokan bigire, dê hest û ramanên zarokan geştir û bihêztir bike. Divê nivîskar, di derheqê zarokan de agahîyên giştî û pîralî bizane ku berhemên bêhempa biafirîne. Bêguman di vê astê de divê zîmanekî estetîk û naverokeke afirîner jî hebe.

1.2.1. Cureyên edebîyata zarokan

Cureyên edebîyata zarokan, xwedî listeyeke dirêj e. Çîrok, roman, helbest, çîrvanok, efsane hwd. ji şiklî ve xwedî taybetmendîyên xwe jî bin ji naverokê ve divê li gor edebîyata zarokan bîn afirandin. Di demên berê de cureyên edebîyata gelerî bi pîranî dihatin bikaranîn lê di dema modern de hin bi hin di qada de cureyên mîna roman û çîrok bi awayeke bêhtir cih digirin. Ji ber ku rastîya jîyana bi saya çîrok û romanên bêhtir dikarin bînin zîman ev herdu cure derdikevine pêş.

“Bûyerên ku hatine jîyîn yan jî ihtîmala wan ya jîyanê hebe dikevin kategoriya çîrok û romanê. Eger ev berhem kin be ev çîrok e, eger dirêj be jî roman e.” (Nas, 2004: 268). Roman û çîrok, ji teknîk û bûyerên naverokê ve di heman taybetmendîyan de ne lê herdu cure ji piranîya leheng, bûyer, dem û cihan ve xwedî astên cuda ne. Roman, pir caran bêhtir xwedî unsûran e û ev rê dibe ku naverokên xurt û piralî bên afirandin. Çîrok jî, herçiqas ji hêla unsûran ve ji romanê xwedî çarçoveyeke piçûktir be jî, ji afirandinê re rê dibe ku di edebîyata zarokan de berhemên bi rêk û pêk bên.

Bîyografi û otobîyografi dema ku bi rêbaz û naveroke serkeftî bê afirandin û lehengên van cureyên kesên xwedî jîyanake baldar bin zarok dikarin bi awayeke dilxwaz wan berhefman bixwînin. Karakterên di van cureyan de dibe ku bandoreke erênî li ser xwînerên zarok bikin.

“Bîranîn, ew nivîs e ku nivîskar jîyana xwe, bûyerên ku dijî yan jî dibihîze di wan de tîne ziman.” (Nas, 2004: 310).

Bikaranîna helbestan di edebîyata zarokan de bi piranî di temenên piçûk de bo zarokan ji hêla ziman ve pêş de herin bêhtir tê bikaranîn. Carinan rêbaza jiberkirinê tê bikaranîn û ev ji alîyê harmonîyê kêfa zarokan tîne.

Berhemên ku bo zarokan di edebîyatê de bên bikaranîn divê xwedî taybetmendîyên qadê bên afirandin ya jî hîlbijartin:

Kolta (1974) dibêje ku dema çîrvanokek ji bo zarokan bê hîlbijartin divê ev çîrvanok xwedî çend taybetmendîyan be: Armanca yekemîn divê ne tîrs û perwerdekirin be, berhem xwedî alîyekî bi kêf be, kêfê bide, alîyekî wê ku bala mirov bikişîne hebe û hêla wê ya rastî-nerastî zêde ne tund be ku zarok ji rastîya dinyayê qut nebin (Dilidüzgün, 2007: 30).

Hemû cureyên ku ji bo zarokan tîs nivîsandin divê xwedî wan taybetmendîyên jor bin. Cure, bi serê xwe nikare bala zarokan bikişîne. Naverok, bûyer, honak hwd. divê taybetmendîyên qadê li ber çavan bigirin û bên afirandin.

Zarok, herçiqas di jîyaneke rastî de bin jî heta temenên dibistanê carinan dikarin bikevine fikrên xeyalî û fantastîk. Hin cure, divê vê pêwîstîya zarokan bînin cih û naverokên wisa biafirînin. Bi vê sayê zarok, dikarin tiştên razber jî bixwînin.

Giringîya cureyên mîna çîrvanokên di edebîyata zarokan de ji demên rabirdûyî heta niha xuyayî ye û Subaşı vê wisa tîne ziman:

Nivîsê bandor li ser mirov bandoreke ramyarî saz kirîye. Vê bandorê helên mirov yên afirîner û razber geşkirine. Ev rewş nîşan dide ku vegotina direkt ya di çîrvanokan de xwedî şêberî û mûhakeme ye. Bi vê sayê em fêhmî dikin ku çîrvanok, bi wan taybetmendiyên xwe bala zarokan dikişînin û wan aciz nakin (Subaşı, 2019: 48).

Çîrvanok, yek ji van cureyên herî kevînar in. Di demên berî modern de di edebîyata zarokan de jî bi pîranî dihatin bikaranîn. Herçiqas di salên dawî de pîranî cureyên zarokan giranîya xwe dabe çîrok û romanên jî, çîrvanok bingeha motîfên gellerî diparêzîn û jî bo çanda civakan bigihîne zarokan hinek jî tînan bikaranîn. Naverok û şeweya çîrvanokên; zarokan jî hêla raman, hest û naskirina taybetmendiyên gelan ve jî zarokan re pêwîst in.

Cureyên edebîyatê yên li ser rûyê erdê ku bi gelemperî tînan bikaranîn, sal bi sal standartekê ava dikin ku ev cure di nav hemû kom, gel û sazîyan de nêzî hev tînan bikaranîn. Ji naverokê ve herçiqas xwedî cudabûnên pîralî bin jî şewaz nêzî hev in. Her cûre di nava xwe de jîyan, raman, bûyer û mijarê li gorî xwe diafirîne. Ev cureyên ku di edebîyatê de tînan bikaranîn bi şertê ku li gorî asta zarokan bînan hûnandin dikarin di edebîyata zarokan de jî bînan bikaranîn. Di demên rabirdûyê de helbest, çîrvanok û kurteçîrok di edebîyata zarokan de bi gelemperî dihatin bikaranîn lê hin bi hin ev pergala têguhertin û edebîyata zarokan jî jî hêla cureyan ve dewlemend dibe.

1.2.2. Taybetmendiyên ku di edebîyata zarokan de pêwîst in

Zarok, di temenên asta dibistana seretayî de xwedî helwesteke krîtîk de ne. Zarok di vê demê de hînî xwendin û nivîsê dibînin. Piştî pirtûkên tîp û kîteyan hin bi hin dest bi pirtûkên xwendinê dikin. Kesên bi vê pêvajoyê re têkildar in divê pirtûkên zarokan bi helwesteke zanistî hilbijêrin.

Naveroka pirtûkên zarokan divê ji cudabûna zarokan hin alîyan bistin û van di nava honakê de bi awayeke serkeftî bikar bînin:

Divê plansazîyeke tekûz hebe. ...Temen, zayend û asta xwîner li ber çavan bêgirtin û bûyerên wekî honak li gorî van pîvanan bînan sazkin. Bi taybetî jî plana roman û çîrokan divê gelekî hêsan be û bi awayeke ku neyê texmînkirin bi dawî bibe (Kıbrıs, 2010: 42).

Naverokeke balkêş û herikbar ji bo zarokan sedemeke xwendinê ye. Bingeha vê ji kesayeta zarokan tê. Zarok jî bi piranî di temenên piçûk de der û dora xwe keşf dikin û her bûyera ku diqewime bi baldarîyeke mezin dişopînin. Nivîskarên ku ji bo zarokan dinivîsin dema ku naveroka berhema xwe di vê astê de bikarin ava bikin, mîmkûn e ku berhema wan ji hêla zarokan ve pir bê xwendin.

Meral, balê dikişîne ser perwerdekirina zarokan û bandora wê ya li ser zarokan çêdike:

Nîvendên di jîyanê de bi pir alî û pir hejmar in. Ji bo haydarbûn û watedarkirina wan nîvandan divê zarok bi vê hişmendî û şêwazê bîn perwerde kirin. Ji ber ku ancex zarokêkî bi vî alî bîn perwerde kirin dikare vê pîralîbûnê bibîne û peyamên li der û dora xwe fêhm bike û bersivên di cih de bide. (Meral, 2016: 54).

Zarok û zarokatî bi yek pênasê nikare bê nas kirin. Zarok û zarokatî ji çand, dîrok, têkilîya civakî û hetta carinan ji kesayeta zarok bi xwe jî cudabûnan der dixwe. Carinan kesayeta zarokan bi rêyeka serbixwe de diçe û zarok ji hêlên cuda ve xwe diafirîne. Di vê astê de edebîyata zarokan dibê taybetmendîyên zarokan li ber çavan bigire. Razber û şênberîya, alîyên pêwîst û peywendîya ku zarok têde ji bo naverok, ziman û afirandina lehengên berhemên zarokan nîşanêyên sereke ne.

Plan û amadekirina pirtûkên zarokan, pêwîstîyeke bisporî û birekûpêk dixwaze û ancex bi vê rewşê berhemên serkeftî bîn afirandin:

Pêşketina di hêla huner û estetîkê de bandor li ser fikrên afirîner jî dikin. Ji ber vê bandora şêwe, reng, mestere û xêzên van pirtûkan li ser pêşveçûna zarokan hêzekê çêdikin. Lewma, pirtûkên zarokan ji wan hêlan ve divê serkeftî bîn amade kirin (Yalçın û Aydaş, 2011: 30).

Eger pirtûk, rastî û îzafiyeta zarokan fêhm bike û pêwendîyên vê qadê bi cih bîne dikare berhemên serkeftî biafirîne. Zarok, hiş û bala xwe didin derveyî xwe û dixwazin fêrî gelek tiştan bibin. Di rewşêke wisa de divê nivîskar haydar be ku zarok xwe di pirtûkê de bibîne.

Pir carinan edebîyata zarokan mîna edebîyateke zarokvarî tê dîtin lê qada edebîyata zarokan xwedî disiplînekê ye:

Edebîyata zarokan ya hevdem, divê li gorî zarokan be lê divê ne weke karên zarokane be. Ev pirtûk divê pêşketina zarokan ya ji hêla ziman ve xurt bike,

nêzîkatîya zarokan bi xwendinê re zêde bike û zarokan ji hêla çandî ve bi hêz bike (Dilidüzgün, 2007: 18).

Edebîyata kesên gihaştî ji ber gelek sedeman tê afirandin û divê ji hêla naverok, honak, ziman hwd. ve neyê qedexe kirin. Heman tişt heta asteke ji bo edebîyata zarokan jî dikare bê qebûl kirin lê di edebîyata zarokan de armancên sereke hene: pêşveçûna zarokan ji hêla derûnî, civakî... Pirtûk dema ku van armancan bîne cih; divê hay ji rêbaza ziman, honak, afirandina lehengan, peyama veşartî û dîyar hebe û rewşa temenê zarokan li ber çavan bigire.

Edebîyata zarokan encamek e. Encama zarok û zarokatîyê ye. Taybetmendiyên zarokan û nêrîna wan ya li dinyaya derveyî ev qada ku em dikarin bêjin modern e bi xwe re derxistîye ser rûyê erdê.

Cudabûna edebîyata zarokan ji cudabûna zarok û mezinan derdikeve hole. Zarok, ji derûnî û tevgerî ve ji mezinan cuda ne:

...Rastîya zarokan ji ya mezinan pir cuda ye. Nikare bê înkarkirin ku zarok xwedî nêrîn û îmajên cuda ne û ji ber ku xwedî taybetmendîyan in divê pirtûkên bi vî awayî ji wan re bîr amade kirin. Ji ber vê sedemê hebûna edebîyata zarokan xwedî hêzekê ye ku destûr nade zarok kêr û piçûk bîr xistin, berevajî vê wan serbilind dike. Ji ber ku edebîyata zarokan ya hemdem dixwaze ku zarok bi pirtûkan re danûstandinê bikin, tebîetê xwendinê bistînin û ramanê azad û rexnegir saz bikin (Dilidüzgün, 2007: 21).

Çawa ku zarok li gorî mezinan xwedî tevger û ramanên cuda ne divê berhemên wan û di çarçoveyê berfireh de edebîyata wan jî cuda be. Ev hişmendî herçiqas di nav civakînan de zêde belav nebûbe jî pêwîstîyê sereke ye. Divê cidî bîr dîtin û kesên ku dixwaze bibe nivîskarê zarokan divê bi çavekî hûr û kûr lêkolînan li ser zarokan bike û wan ji gelek alîyan ve bişopîne. Ji ber ku nivîsîna ji bo zarokan karekî giring û hesas e, ew kesên dilxwaz, divê karê xwe bi awayê pisporî bikin.

Pêvajoya ku pitik ber bi zarokatîyê ve û zarok ber bi xortanîyê ve diçin pêvajoyê krîtîk e. Guherîna laşî, derûnî, civakî û herweha nihêrînên ku tên guhertin jîyana wan kesan carinan dixê tengasîyê. Her dema ku temen zêde dibe pêwîstîyên wan jî ji hêla têkilîya ku bi civakê re deynin çê dibe. Di vê astê de pirtûka ku serkeftî hatibe afirandin ji bo alîkarîya wan dê pir giring bibe.

Zarok, jîyan û bûyeran ji mezinan cudatir dibînin. Li gor ramanê xweyî serbixwe tiştan şîrove dikin û tinin ziman. Di vê astê de naveroka pirtûkan derdikeve pêş. Nivîskar dê mêzîna rastî û xeyalê çawa di qeysekê de bigire? Dema ku ev mijara li gorî temenan tê guhertin bi awayeke serkeftî neyê bicihkirin dibe ku xwîner ji xwendinê dûr bikevin û di ser de ji xwendinê sar bibin. Her temen xwedî taybetmendiyekê ye. Xeyal û rastî jî bingeha vê taybetmendiyê ava dikin. Nivîskarê baş ew nivîskar e ku di nivîsa xwe de taybetmendiyên zarokan li ber çavan digire û honak, leheng, bûyer, ziman û mijarê li gor asta wan ava dike.

Di pirtûkên zarokan de mijarên tirs, xeyalî, efsunî û hwd divê ku di asta zarokan ya temenî de be. Nivîskar, doza van naverokan li gor temên, asta zarok ya ramanî, der û dora zarok ya ku dijî û qonaxa zarok ya derûnî biafirîne.

Mijara tirsê di binhişê zarokan de merhaleyeke pir sosret e. Heger nivîskar temenê zarokan û asta wan ya rastî-xeyalî nizanî be û naverokên xwe bêhevsengî çêbike, dibe ku zarok ji van naverokan zirarê bibînin. Ne tenê nivîskar, kesên ku ji zarokan re pirtûkan dineqînin jî divê haydar bin ku hewce ye pirtûkên guncan ji temenên guncan re bên hîlbijartin. Ji bilî van her du pîvanan ya sêyemîn jî ev e ku carinan temenê zarokan û asta wan ya jîrbûnê ne di heman pileyê de ye. Dibe ku zarok piçûk bin lê ji alîyê raman ve pêşketî bin an jî temen mezin bin lê ji hêla hişmendiyê ve ne di wê astê de bin. Divê di dema hîlbijartina pirtûkê de kesên berpirsîyar van alîyan li ber çavan bigirin.

“Gava ku rastî û sînî weke hev hate dîtin gotin bi tevayî dibe tiştêkî pûç û vala.” (Dilidüzgün, 2007: 85). “Lene Mayer-Skuman: Li ser rûyê erdê hemû tiştên heyî ji bo pirtûkên zarokan dibe ku bibe mijar. Birçîbûn, evînî û mirin... Ya giring ev e ku hûn dê wan bi çi awayî binivîsin?” (Yavuzer, 2013: 189). Mijar û vegotin du tiştên sereke û ji hevdu cuda ne. Di edebîyata zarokan de nivîskar ji hêla mijarê ve azad e lê di vegotinê de divê rastî û îzafiyeta zarokan li ber çavan bigire. Zimanekî jîr û tije, hevokên sade û tekûz divê ji hêla nivîskar ve bên sazîkirin.

Pirtûk, di demên cuda de ji hêla kesên cuda ve bi dîtineke cuda hatîye dîtin:

Jorge Luis Borges di ceribandineke xwe ya gelekî xweş de di tekamûlbûna mirov de bandora pirtûkan weha şirove dike: Bêguman di nav amûrên mirovan de ya herî balkêş pirtûk e. Mikroskop û teleskop, berdewama dîtîne ye; telefon ya bihistîne ye, şûr û gêsî yê destên mirovan in. Lê pirtûk tiştêkî pir cuda ye. Ew (pirtûk), berdewama hiş û xeyalên mirovan e (Sever, 2013b: 25).

Pirtûk amûreke ramanî ye. Bûyer, mijar, ziman, çand, derûn hwd. bi rêya pirtûkan tê neqilkirin û berdewama van qadan dîsa bi pirtûkan tê kirin. Ji hêla zarokan ve jî ji bo nasîna civak, çand, raman û pêşveçûna ziman divê pirtûkên birêkûpêk bên naskirin.

Zarok, xwe bi rêya pirtûkan dikarin nas bikin. Ji hest û helwestên lehengan û ji temaya naveroka pirtûkê dikarin hin alîyên kes, bûyer û jîyanê nas bikin. Bi van amûrên pirtûkan zarok dikarin xwe jî nas bikin.

Pirtûk ji bo zarokan cihaneke afirîner e. Bûyerên ku derfeta dîtîna an jî bihistîna wan bi dest wan nekeve, bi rêya pirtûkan dikarin bi dest bixin. Zarok, ji naskirina civakê, fêmkirina fikr, raman an jî hestan bi rêya pirtûkên zarokan haydar dibin.

Armançên edebîyata zarokan piralî ne. Gerek ji hêla ziman û derûnî gerek jî hêla dîtîna û fêmkirina jîyanê berhemên zarokan rolekî giring hildigirin:

Armanca esas ya xebatên edebîyata zarokan ne ku zarokan fêrî tiştîna bike; armanc ew e ku hestîyarîyê bi wan re çêbike û hestên wan yê li hemberî jîyanê zêde bike. Bi nêrîneke berfirehtir; armanca berpirsyariya edebîyata zarokan ya yekemîn ev e ku çarçoveya hest û ramanên zarokan fireh bike, derfetên ziman û xêzkirinê bi zarokan bide naskirin û rastîya mirovan bi wan bide zanîn. Ev rastîya ku di çarçoveyê de teng de nikare bê binavkirin, alîkarîyê ji ziman (û bi giştî ya hunerê) dixwaze. Mafê zarokan e ku ji vê derfetê sûd bigirin. Ji ber vê yekê, ew kesên ku dixwazin barê nivîsînê ji bo zarokan hilgirin divê ji fonksiyonên edebîyatê û wêneyê –ya ku hestîyarîyê dide mirovan- sûd bigirin (Sever, 2013b: 142).

Piralîbûna zarokan divê di pirtûkên wan de jî xwe bide xuyakirin. Pirdengî, piralîtî û pirrengî divê bi rêya ziman û hûnandineke serkeftî bê afirandin. Zarokên ku ji temenên piçûk û pê de dixwazin cîhanê nas bikin û di derbarê wê de agahîyan bistînin divê bi pirtûkên baş vê pêwîstîyê bi cih bin. Zarok ne tenê agahîyan, herweha naskirina hest û ramanên jî divê bi rêya berhemên qada xwe bistînin.

Nêrîn û avakirina naverokeke berfireh di pirtûkên zarokan de rasterast sûde dide zarokan:

André-Bay, dibêje ku edebîyata zarokan dinyayeke pir fireh e, ne mimkûn e ku yek bikare çarçoveyeke safî bide nişandan. Mijar, bike û neke gerdûnî ye. Zarok, li gorî nişanên di nexşeyê de naçin. Di vê edebîyatê de keştiya ku bêpûsûla ye, bi sed salan li her lîmana ku gihastiye ji xwe re xenîmet hilgirtine. Cudabûna edebîyatê û edebîyata zarokan ev e ku di edebîyata zarokan de ziman, naverok, vegotin û samîmîyet li gorî zarokan e. Edebîyata zarokan; ew pêvajoya ku zarok dibin zarokên hestiyar, mirovên baş û namzetên xwînerîyê (Şirin, 2007b: 14-15).

Bêsinorbûna edebîyata zarokan ji bêsinorbûna jîyanê tê. Gava ku zarok dixwazin jîyanê nas bikin dest bi danûstandinê dikin û di navbera xwe û cihana derveyî de têkilîyan saz dikin. Van têkilîyan di mehên pêşî de bi rêya çavdêriyê, şûn de bi rêya axaftinê û di asta dawî de jî bi rêya xwendinê dikin. Di vê astê de divê pirtûkên zarokan pêşkêşî zarokan bên kirin. Lê divê pirtûk ji zarokan û jîyana wan ne îzole bin. Heger pirtûkek an jî nivîsek ji bo zarokan; bi ziman, honak û vegotinekê di asta zarokan de ava bibe serkeftî ye.

“Weke ku tu cure bi tena serê xwe ne zarokwarî ye, her mijara ku zarok tê de hebe jî bi tena serê xwe ne zarokwarî ye û ya ku leheng zarok be jî ne bes e ku hunera zarokwarîyê pêk bîne.” (Şirin, 2000: 45). Karê edebîyata zarokan karekî pisporî ye. Naverok, ziman, vegotin, hîlbijartina mijar û lehengan divê bi awayeke zanistî bên afirandin. Kesên ku berhemên ji bo zarokan biafirîne divê zarokan û honakên zarokan ji nêz ve nas bikin û xebatên xwe di vê çarçoveyê de bidomînin.

Bi rêya pêşveçûna amûrên teknolojiyê jîyan û pratîka jîyanê tê guhertin. Nêrin, raman, helwest, ragihandin û têkilî bi awayeke xurt dikevin formeke din. Di vê rewşê de zarok û zarokatî jî tên guhertin. Zarokên ku di demên berê de di nav malbat û civakê de bi lîstik û pêlîstokan demên xwe derbas dikirin niha bi piranî amûrên teknolojiyê bi kar tînin û tebîetên wan tên guhertin. Lê ev guherîn nayê wateya ku dê pirtûkên zarokan ji holê rabin û pêwîstî bi wan namîne. Bêguman naverok, şêwe û hin aliyên din divê bên guhertin lê edebîyata zarokan bixwe divê bi awayeke xurt û modern dewam bike.

Divê rêbaza nivîsîna edebîyata zarokan ji taybetmendiyên zarokan ramanan bistînin. Nivîskarê ku zarokan ji nêzik ve nas bike pêkan e ku berhemên binirx biafirîne:

Di pirtûkan de, çawa ku tundî weke rastîya jîyanê ye divê bê bikaranîn. Lê ev bikaranîn divê temen û gihaştina zarokan li ber çavan bigire, naveroka ku tundî tê de hebe ji zarokan re bibe mîna rêberekî û ji wan re li hemberî tundî û zordariyê ramanekê biafirîne. Zarok divê ji wan naverokan fêr bibin ku çaxê li tundiyê rast hatin hewce ye çi bikin û çi nekin (Sever, 2013a: 89).

Pirtûkeke ji der û dora xwe dûr û asê be ne mimkûn e ku xwe bi zarokan bide xwendin. Zarok, ji nivîsên şîretkar, tund û yekalî hez nakin. Lê divê bê zanîn ku ev tiştên tîne qalkirin ji bo vegotinê ne. Naverok ji hêla nivîskar ve bi awayeke azad dikare bê afirandin. Her mijar -bi hişmendîya ku ji bo zarokan tê nivîsandin- di edebîyata zarokan de dikare bê bikaranîn.

Şimşek, têkîliya ku di naveroka pirtûkan û jîyana zarokan de pêwîst e wiha tîne ziman:

Zarok, di pirtûka ku ji bo wan hatiye nivîsandin de, dixwazin ku jîyaneke weke jîyana xwe bibînin. Di navbera tiştên ku hatine nivîsîn û dijîn de têkiliyekê dibînin, berawirdkirinekê çêdikin û carinan wan ji hev der dixin. Xebatên edebîyata zarokan xwedî hestîyarîyên xwezayî, zimanekî xweş, nivîsareke baş, hûnandineke cazib û bûyereke herikbar bin mimkûn e ku kesên mezin ji wan berheman kêfê bistînin (Şimşek, 2012: 43).

“Laurence Sterne dibêje, heger ku berî ez rûpel bizîvirînim tiştên ku ez dê bixwînin min texmîn bikira, min dê ew rûpel biqetanda û avêtiba.” (Köksal, 2005: 37). Pirtûka nêzikî zarokan ji hêla zarokan ve dê bêhtir bi başî bê pêşwazîkirin. Gelo pirtûka nêzî zarokan, pirtûkeke çawa ye? Pirtûkên ku di vê kategoriyê de bin divê ji hisiyatê ve nêzî kesayetên zarokan bin. Ji tirs, kêf, hezkirin, xeyal, ramanên hwd. wan haydar bin. Naverokeke balkêş, nêzîkbûna hest û ramanên zarokan û zimanekî herikbar û sade ji bo pirtûkên zarokan pir giring e. Divê meraq di nav rûpelan de her tim hebe ku zarok bi vê yekê re her tim xwendina xwe berdewam bikin.

Şirin, ji Tournier radigîhe û sernavê giring ya li ser xeyalî rastîya naveroka pirtûkên zarokan wiha tîne ziman:

Çima çîrokên xeyalî li gorî yê rastî bêhtir di hişê mirov de cih digirin? Michel Tournier, vê pirsê pir binirx dibîne, bersiveke wisa dide: Yê ku bersiv dît, di rêya çûyîne de dê çareseriyê jî bibîne. Em pirsê bi vî awayî bipirsin: Zarok, li gor çîrokên rasteqîn çima bêhtir ji çîrokên xeyalî hez dikin? Ev rewş dide xuyakirin ku têgihiştina zarokan ji rastîyê bêhtir nêzikî xeyalan e. Ji ber vê sedemê edebîyata ji bo zarokan bêhtir nêzikî amûrên xeyalî ne (Şirin, 2007a: 118).

Hişê zarokan ji hişên mezinan cuda ye. Hişê mezinan ji gelek hêlan ve hatîyê dorpeçkirin û bi awayê mekanîk difikire. Şablon û ramanên tund dikarin di hişê mezinan cih bigirin û pêkan e ev tişt bandorê li sînorên wan bike. Mezin bêhtir rasyonel in. Rastî û mantiq di biryar û tevgerên wan de hene. Dema ku em li gorî zarokan bifikirin em sînor û dorpeçkirinan pir nabînin. Mejîyên wan azad in û xeyal, ji rastîyê bêhtir cih digire. Di ve rewşê de pirtûkên zarokan jî divê di vê astê de bên hûnandin û naverok ji van dûr nekeve. Taybetmendîyên zarokan sînorên rastî û xeyalî jî cuda dike. Zarokên ku ber bi qonaxa razber ve diçin naverokên rastî bêhtir dixwazin. Ji ber ku ev zarok ji agahîyên di derbarê jîyan û mirovahîyê de bêhtir tiştan dizanin êdî mijar û honakên xeyalî ji wan re balkêş nayên. Zarokên vê qonaxê dixwazin bi mijar û bûyerên rastî re mijûl bibin û pirsgerêkên xwe çareser bikin. Ji ber van sedeman edebîyata zarokan, divê bi awayêke hişmendane van pêwîstîyan bo zarokan saz bike.

Nikaşên li ser naveroka berhemên edebîyata zarokan hin dualîtî hebin jî piranî yek dikare bêje ku naverok ji mijaran ve xwedî piralîbûn e:

Evîn, hezkin, êş, mirin... Ji bilî van nikaşên malbatî, mafên zarokan, zayendên zarokan, zarokên nexweş û astengdar, hevberdan, pirsgerêkên derdorê, şer hwd. Zarok, van tiştan dijîn û van tiştan dibînin. Di derheqên van de pirsan dikin, serê xwe bi van re mijûl dikin. Lê ev mijar divê çawa bên bikaranîn, ya giring ev e. Nîşandana cîhaneke xweş û nerast, ne gaveke dirust e. Zarok, mirov e. Nexwe di pirtûkên zarokan de mijarên ku bi mirovan û zarokan ve girêdayî ne divê bên bikaranîn. Lê bes, divê ev li gorî asta zarokan bên hûnandin. Divê bala zarokan bikişînin ser xwe û rê vekin ku ew li ser van naverokan bifikirin û xeyalên xwe zindî bigirin (Nas, 2004: 73)

Bêsinorîya mijaran di sînorkirina vegotinê de disekine. Vegotin, tiştê herî giring e. Çi tişt bi çi şewazê divê bê gotin? Di vir de yên ku rê nîşan bidin taybetmendîyên zarokan in. Temen, hest, jîrbûn û rewşa derûnî ya zarokan vegotina mijarê bi xwe re tîne. Ev asta zarokan, doza tundîya vegotinê û hûrgilîya mijarê jî bi xwe re dîyar dike. Zimanê ku nivîskar bikartîne, rengê nivîsê ye û guncanbûna nivîsê ji bo zarokan zelal dike.

Pirtûkên alîgirî û bîrdozîyê, ji hêla ziman ve çiqas serkeftî û baş jî bin ji ber ku ji alîyê naverokê ve li gorî esasên edebîyata zarokan nayên qebûl kirin di vê qadê de nikarin bên bikaranîn. Edebîyata zarokan li hemû deverên cihanê divê xwedî heman

prensîban bin û ev prensîb jî divê di çarçoveya mafên mirovan de bin. Şer, pevçûn, tundî dikare bê bikaranîn lê dema ku ev mijar mîna alîgirbûnê tîk bikaranîn, prensîbên qadê tîk bînpêkirin. Ev rewş him ji bo derûnnasîya zarokan him jî ji bo afirandina kesayateke demokrat re pîrsgirêkan derdixe holê.

Ji bo pêşveçûna zarokan, bi qasî civakeke xweş û zindî pirtûkên tekûz jî pêwîst in. Ramanên zarokan bêsînor in û hestên wan xwerû ne. Gava zarok, dest bi naskirina cîhana derveyî dîkin, tiştên ku dibînin û dibîhîzin ji xwe re dîkin mîna şablonekê. Dîmen, deng, rol modelên li derdorê, helwest hwd. ew tiştên ku ji zarokan re amûrên ji derve tîk sitandin. Ev amûr bi awayeke zanistî divê li der û dora zarokan bîk bicîhkirin. Bêguman carinan şert û mercên derveyî ne li gorî jîyana zarokan in. Lê herçiqas wisa be jî pirtûkên ku pêşkeşî zarokan bîk kirin divê li gorî taybetmendîyên edebîyata zarokan bin. Mijar çiqas tund û li ser zarokan dijar be jî divê ev mijarên wisa jî bi zîman û şêweyekê bîk nivîsandin bi vî awayî pêşkêşî zarokan bê kirin. Ji ber ku mafê zarokan jî heye ku hin bi hin ji bûyer û tevgerên jîyanê haydar bibin.

“Gövs dibêje ku zarokek tu carî bawer nake ku qijîkek yan jî rovîyek dipeyve lê pêwîstîya wî/wê bi wan tiştên derasatî heye.” (Şirin, 2007a: 79). Zarok, bi pîranî di temenê piçûk de ji rastîyê bêhtir bi xeyalîyê ve meyardar in. Herçiqas hin bi hin beşa rastîyê zêde bibe jî heta astekê zarok ji tiştên xeyalî û efsûnî hez dîkin. Ji ber vê bi pîranî di temenê piçûk de naverokên xeyalî dikarin bîk bikaranîn. Ev ji bo ramanên afirîner bîk avakirin re pêwîst e. Carinan naverokên xeyalî ku zarok ji van alîyên nû bîafirînin ji bo pêşveçûna xeyalên zarokan pêwîst in. Tenê rastî yan jî tenê xeyalî ji bo edebîyata zarokan ne rêbazeke rast û maqûl e.

Daxwazkirin, kilîşe hwd. di edebîyata zarokan de naverokê sabît dike û ev rewş ji bo xwendina pirtûkê, xwesteka zarokan kêmtir dike. Zarok, ji ber taybetmendîyên xwe ji meraq, tevger û tiştên balkêş hez dîkin. Dema ku van alîyan di pirtûkan de nabînin daxwaza xwendinê bi wan re kêmtir dibe. Pirtûk -nivîskar- divê cîhana ku zarok tê de ye fîk bike û naverok, zîman û honakê di vê astê de bîafirîne.

Edebîyata zarokan xwedî hin xetên sor in û nivîskar yan jî amadekarên van pirtûkan divê ji van haydar bin:

Nivîskarên edebîyata zarokan dema ku naverokê ava dikin, divê azadiya zarokan di nav çarçoveya sînorên raman û fikrên wan de damezrînin. Ev çarçove, tendirustîya zarokan ya derûnî îfade dike. Nivîskar; divê mijarên ku zarokan aciz bike, wan biêşîne, hêvîyên wan xerab bike û zirarê bide jiyana wan ya gîyanî bikarneyîne. Azadiya nivîskar bi van tiştên ku qala wan hatîkirin re sinordar e (Sever, 2013a: 79).

Pêvajoya nivîskariya edebîyata zarokan ne tenê jêhatîbûna ziman û naverokê ye. Herweha taybetmendiyên qadê ji nivîskar di derbare zarokan de agahîyan dixwaze. Zarok çi ye, raman û hestên wan çi ne û ji hêla derûnî ve di çi astê de ne? Dema ku bersiva van pirsan hat zelalkirin naveroka pirtûka zarokan dê bibe xwedî bingeheke qewîn.

Şirin, giringîya şideta ku di naverokê de te bikaranîn bi rêya berhemekê nîşan dide:

Di naverokên ku şidet û zordarî li lehengan dibe zarok ji bo van lehengan li gorî kesên mezin bêhtir hesas in û bi lehengan re bêhtir empatîyê dikin. Nivîskar, herçiqas tundîya ku li Zezeyê dibe bi başî nede nîşandan jî ev tundahî di berhemê de dibe darê –lêdan- edebîyatê (Şirin, 2000: 94-95).

Zarokatî, qonaxeke hesas û krîtîk e. Dema ku mijar an jî bûyera di naverokê de tund be pêkan e ku zarok di bin bandorê de bimînin û hestên wan bikevine aloziyê. Di vir de nivîskar, divê dengeyeke hesas bibîne û vê tundîyê bi awayekê tolere bike.

Cureya çîrvanokê, ji ber ku xwedî amûrên xeyalî ye ji bala zarokan behtir dikarî bikişîne û bandore li ser wan çêbike. Ji ber vê divê ev cure bi awayeke hişmendîyane bê bikaranîn:

Çîrvanok, divê ji mijarên ku dejenere û xerab bûne xwe dûr bigire. Çîrvanokên ku zirarê bidin xeyal û ramanên zarokan divê neyên bikaranîn. Lehengên wan divê zarokan netirsînin û ji derûnîya zarokan re ne bizîrar bin. Mijarên ku ji terefê zarokan bi şaşî bîr fêmîkirin -mijarên ku jinan piçûk dibînin, ji bawerîyên civakê beravajî dikin, bextparêz hwd. - divê neyên bikaranîn (Kıbrıs, 2010: 84).

Dema ku di naverokê de mînakên xerab bîr bikaranîn divê honak bi şeweyekê bê nivîsandin ku zarok bixwe jêderên xwe jê bistînin û ji hêla raman ve ji naverokê sûd bigirin. Helbet hewce ye mînakên xerab, çewt an jî lehengên neqenc jî bîr bikaranîn. Ev mîmkûn e, lê honaka nivîsê divê derfetê bide zarokan ku ji xwe re ji hêla derûnî û ramanî ve jêderên rast bistînin.

Naveroka berheman herçiqas xwedî fikrên afirîner be jî, divê ku ji hêla pedagojîyê ve sazkar û sûdwar bin:

Pirtûkêke weke Pollyanna ku ji hêla zarokan ve gelekî tê naskirin jî di nav pirtûkên nebaş de ye. Di vê pirtûkê de qala keçeke ku der û dora xwe kêfxweş dike tê kirin. Keçikek, ji bo vê armanca xwe kedekerê mezin dide. Lehengekê wisa ku xemgînî, dilşikestî û hêrs pê re çênebe dê çawa bê qebûlkirin û hezkirin? Bibe nebe encax dê bibe afirideyeke payebilind û di hişê xwîner de hestên liberxweketinê çêbike (Yörükoğlu, 2014: 95).

Zarok, bi rastîya jîyanê ve girêdayî ne. Cîhaneke wisa utopîk an jî her tim aram ne mimkûn e. Nivîskar, di çarçoveya rastî û îzafiyeta zarokan de mijar û bûyeran divê di hevsengîyekê de bihûne û nivîsê li gorî dem û derûnîyê saz bike.

Fonksiyona pirtûk û cûreyên din ji hêla Mungan ve wisa tê gotin:

Ionesco dibêje ku keseke ji bo demeke xweş derbas bike û derd û mitalayên rojane ji bîr bike radihêje pirtûkekê dixwîne yan jî li şanoyekê temaşe dike û bi rêya van xwe ji bîr dike; dema ku fêhm bike ku armanc –pirtûk, şano an jî nivîskar- fêrkirin an jî danîna tiştekî exlaqî ye dê wan –pirtûk, şano an jî nivîskar- sûcdar bike (Mungan, 2011: 31).

Guherîna civakê, guherîna zarokatîyê jî bi xwe re tîne. Ev guherîn, naveroka pirtûkên zarokan jî bi xwe re diguherîne. Zarokên modern li gorî zarokên demên berê bêhtir çalak û raman cuda ne. Bi rêya TV û amûrên din yê teknolojîyê xwedî raman û xeyalên pîralî û çalak in. Di vê rewşê de naverokên pirtûkan jî divê xwe biguherînin û alîyên xwe yê dîdaktîk –fêrkar- ji holê rakin. Naverokên bi kelecane, balkêş û herikbar ji bo edebîyata zarokan bêhtir tîne xwestin.

Pêşvebirina ziman û raman bi xwendina pirtûkan –bi pîranî pirtûkên edebî-girêdayîye. Ev her du beş, geşbûna xwe dikarin ji pirtûkan bistînin:

Xwendina nivîsê wêjeyî, têkilîya mirovan bi jîyan û rastîya mirovan ve girê dide. Gerdûna mirovan ya hest û ramanî bi pêş ve dibe. Hunera zimanê zikmakî ji hêla fêmkirin, bikaranîn û vegotinê ve baş dike. Divê be zanîn ku kesên ku zimanê zikmakî bi pêş ve dibe û zimanê xwe bi awayeke xurt bi kar tîne, ziman ji hêla ragihandinê ve jî pir serkeftî dikare bi kar bîne (Sever, 2013a: 31).

Pirtûkên zarokan, hêla zimanê zikmakî ve zarokan bi pêş ve dibe û wan bi rêya ziman ji alîyê raman û xeyalan ve xurt dike. Nivîskar ji bilî naverokê divê vî alî jî li ber çavan bigire û zimanekî birêkûpêk bi kar bîne. Zarok, ji temenekî û pê de jî bi der

û dora xwe re dikevin têkilîyê û ji hêla peyv û sazkirina hevokan ve gavan diavêjin. Di vê rewşê de pirtûk divê asta zarokan bizanibe û ji hêla hevoksazîyê ve wan fêmbike û bide fêmbikin.

“Pirtûkên ku ji zarokan re tên rêzêkirin divê ku dîtin, bihîstin, xeyalkirin û pêşveçûna wan saz bikin û ji bilî van, ji hêla têgehan û bikaranîna ziman ve wan xurt bikin.” (Sever, 2013a: 96). Pirtûkên zarokan divê pîralî bin. Hêlên pêşvebirina raman, ziman, kesayetî, xeyalî, civakî û taybetmendîyên zarokan bi heman berhemê divê bînin saz kirin ku zarok bi awayeke birêkûpêk geş bibin. Dema ku ev bînin kirin divê hêla pirtûkê ya estetîk jî bi van hêlan re bê tekûz kirin.

Berhemên zarokan ne tene ji hêla zimanî estetîk û herikbar, herwiha divê naverok bo zarokan erêner be da ku zarok ji hêla derunîyê ve ji berhemê sûd bigirin:

Mijarên ku di edebiyata zarokan de tên hûnandin divê derfetê bide zarokan ku ew bi hêviyekê berê xwe bidin pêşerojê. Mijar, divê hêviyên zarokan xerab neke û zarokan netirsîne; nivîskar di temayên xwe de bi tundî û zêderoyîyê neke. Bi gotinekê din, divê naverokên xweşbînî û reşbînî bi temametî neerênî ne jî neyînî bin. Mijarên ku bi piranî ji erênî û neyînî pêk tên bi zarokan re reşbînî û polyannatîyê ava dikin. Mijar divê bi dengyekê pir hesas bê hûnandin ku zarok ji wê fêmbikin. Pirtûkên ku ji bo zarokên di temenên 10-12de ne tên nivîsandin bi taybetî divê rasteqînî bêhtir li ber çavan bînin. Ji ber ku zarokên di van temenan de dest bi pûnîjînêkirinê kirine. Zarok, dema ku li pîrsgirêkan rast bînin dikarin şiroveyan ji hişê xwe li ser wan bikin. (Kardaş û Alp, 2013: 19)

Di pirtûkên zarokan de naverok û şêwaz li gorî armancan tên saz kirin. Dema ku ev wek diyardeyekê bê binavkirin armanca din divê naskirina zarokan be. Temen, ast, çanda ku di nav de ne û taybetmendîyên din tên lêkolîn kirin. Ev her du alî li gorî plansazîyêkê tên hûnandin û binyada berhemê tê avakirin. Di vê gavê de asta sêyem çarçoveya derûnî ya pirtûkê ye. Mijar an jî bûyer çî bibe jî divê nivîskar di dawîya dawî de di pirtûkê de reşbînîyê ava neke. Dema ku zarok pirtûk biqedîne divê hêvîdar bibin û ji bo pêşerojê xeyalên erênî biafirînin. Ev xeyalkirin divê ne xeyalkirineke Pollyannayî be. Nivîskar divê şert û mercên jîyanê di naverokê de bide xuya kirin lê ev ji hêla ramanî ve bi zarokan re wêrektî û xweşbînîyê çêbike.

Bîrbirî, bi rêya amûrên ramanî xwe geş dike û tesîra wan ya li ser hiş wisa tê gotin:

Norton (1999) dibêje ku heta bîrbûna dîtîne û bihîstinê bi pêş nekeve, peyamên edebîyatê û hetta hiş jî geş nebe têgehên berheman nayên fêmkirin. Li gorî wî, di pêşveçûna ramanî de bandora edebîyatê pir e. Bi taybetî jî edebîyata zarokan, ji zarokan re derfetên “çavdêrî”, “danberhevî”, “tasnîfkirin”, “pratîk” û “rexnekirin”ê pêşkêş dixê û bingeha ku zarok tiştên nû bi afirêne ava dike (Sever, 2013b: 48).

Pirtûkên zarokan divê bi zarokan re di heman astê de be. Dema ku pirtûk di ser asta ramanê zarokan re be fêmkirin kêmtir dibe û rêjeya daxwaza xwendinê dikeve. Heman tişt dema ku pirtûk di bin asta zarokan de jî be rû dide. Di vê rewşê de zarok ji xwendina pirtûkên wisa dûr dikevin û pirtûkên mîna van ne ji hêla ziman ne jî ji hêla raman ve sûde didin zarokan.

1.2.3. Armanca edebîyata zarokan

Taybetmendîya edebîyata zarokan bi armanca wê ve têkildar e. Armanc, divê di serî de bê zelalkirin û pêvajoya xwendine piştî vê astê dest pê bike. Di dawîyê çî tê xwestin û çî guherîn divê bibe ku armanc, hate zelalkirin pêvajoya xwendinê ji bo zarokan dikare dest pê bike.

Heartling, bi awayeke zelal pêwîstîyê berhemên edebîyata zarokan tîne ziman:

Peter Heartling, nivîsîna pirtûkên serkeftî yên ji bo zarokan bi du şertan ve girê dide: Şertê yekem, divê pirtûk ji hêla zarokan ve bê fêmkirin û zimanê wê poetîk bimîne; şertê duyem jî, herçiqas zehmet jî be divê pirtûk ji zarokan re bêje ku bê ka mirov çawa bi hev re dijîn û ji bo hevdû dikarin çî bikin. Heartling dibêje ku, ez ji pirtûkên ku jiyanê xweş didin xuya kirin bêhtir li pirtûkên piçûk yên utopyaya civakî digirim (Şirin, 2000: 56).

Bi tena serê xwe naverok an jî ziman ne bes e. Her du divê heta astekê serkeftî bin. Bingeha pirtûkên zarokan yek jê jî divê ev be ku zarokan ji hêla civakî ve amade bike û pêkanîyên wan derxe holê. Di vê rewşê de divê zimanekî estetîk, naverokeke xurt û hevokên herikbar nîşanî zarokan bê kirin. Leheng û mijarên ku di hişê zarokan de neyên qebûlkirin serkeftinê nikarin bi dest bixin.

Guherîna taybetmendîyên xwînerên pirtûkan ji hêla Hari wisa tê gotin:

Ji ber ku em ji xwendina pirtûkan ber bi monîtorên televîzyonan ve diçin ev qabîliyeta xwendina kûr û hûr ya ku bi xwendina pirtûkan re digihîşt me, hin bi hin ji holê radibe û ji ber vê yekê em kêmtir pirtûkan dixwînin. Mîna ku dema em qelew dibin bê çawa kirina egzersîzan zehmet dibe heman tişt di “jêhatîbûna xwendina nivîsên dirêj” û “sebr, metanet û hunera bo nivîsên ku me jî diwestînin” de jî derdikeve hemberî me û gav bi gav em vana wînda dikin. Divê

em ji bo vî tiştî bitirsin. Profesorekî Harvardê ku min bi wî re hevpeyvîn kir dibêje ku: “Xwendekarê min di xwendina pirtûkên zahf kin de jî pirsgirêka xwendinê dikişînin û li dêvla wan bi podcast û videoyên YouTubeê emel dikin. Êdî ev der Harvard e.” (Hari, 2022: 87).

“Amûreke bi mirovên din re hemhestîyeke xurt ava dike sêwirî ye... Hemhestî, rêyeke herî xurt û dewlemend e ji bo baldanê.” (Hari, 2022: 91). Dema modern, ji bo balkişandinê hin bi hin şertan girantir dike. Di rabirdûyê de amûrên ku bala mirov bikişînin ser xwe kêr bûn û kesên ku tebîeta xwendinê hilgirtibûn dikaribûn bi awayeke hêsan xwendina xwe bidomandina. Lê îro TV, înternet, têlefona û amûrên din mirov dorpêç kirine. Van amûran, bala li ser xwendin û nivîsê jî kêr kirîye. Bi piranî jî kesên ciwan û zarok di bin vê bandorê de ne. Kesên ku kêfa wan ji xwendinê re tê jî hin bi hin kêr dibin û ji xwendinê dûr dikevin. Di vir de karên nivîskaran zehmettir dibe ku ev kesên bala wan ji xwendinê dûr ketîye dîsa wan nêzî xwendinê bike. Pêwîstîya sereke ev e ku naverok divê bê xurtkirin ku kesên dest bi xwendinê bikin dev jê bernedin. Naverokeke balkêş, bi mîraq û bi tevger dê kesên xwîner bi alîyê xwe de bikişîne.

“Encam eşkere ye ku mirovên romanên dixwînin ji mirovên din bêhtir dikarin hestên mirovan fêhm bikin.” (Hari, 2022: 92). “Zarokên ku gelek çîrok xwendine hestên mirovên din bêhtir fêhm dikin. Ev dide nîşan ku çîrok, hemhestîyê xurt dike.” (Hari, 2022: 94). Naverokên pirtûkan jiyanên nû û cuda nîşanê mirovan didin. Her naverokek; ji hest, raman, bûyer û serpêhatîyan pêk tê. Xwendina van nivîsan, bi kesan re hevhestan peyda dike û ev tişt bandorê li ser raman û hestên xwîneran dike. Bêguman kesên ku zêde bixwînin dê ji vê hêlê ve xurt bibin û ji kesên li hemberî xwe bêhtir fêhm bikin.

Xwendin –bi taybetî ji ber ku mijar pirtûkên zarokan in- xwînerên xwe ji gelek hêlan ve geş dike:

Kaya (2007) dibêje ku Huck, Hepler û Hickman, fêdeyên pirtûkên zarokan yê baş wisa tînin ziman: Yek, dema ku tên xwendin derfeta kêf û eşqê derdixe. Du, xewn û xeyalên zarokan dewlemend dike. Sê, derfetê dide ku zarok di navbera jîyana xwe û naveroka pirtûkê de têkilîyekê xurt û xwezayî deynin. Çar, dike ku zarok tecrûbeyên jîyanê bibînin. Pênc, bi zarokan re hişmendîya xwendin û nivîsînê çêdike û bi pêş ve dibe. Şeş, giringîya pirtûkê li ber çavan radixe. Heft, bingehê ji ceribandînan xwendin û nivîsandîna re çêdike. Ev kêlekek e ji bo

fêmkirina xwendin û bikaranîna ziman û herweha bi awayeke serkeftî bingehekê ava dike (Şirin, 2000: 59).

Fêdeyên pirtûkên zarokan di vir de bi awayeke berfireh tê xuya kirin ku naverokên pirtûkan ne tenê ji bo ku xwîner bi rêya edebîyatê demeke xweş derbasbikin hene. Ev dem, demeke taybet e û raman, xeyal û hestên zarokan piralî dike. Zarok bi rêya naverokên birêkûpêk, fikrên afirîner û hestên bihêz xwe nas dikin û der û dora xwe bêhtir fêm dikin.

Alîyekî pirtûkên zarokan ji ev e ku zarokan ji hêla pêşveçûna kesayetî ve ji bi pêş de bibe:

Berhem, divê ji zarokan re derfetan çê bikin ku zarok ji xwe bawer û berxwedêr bin. Di çavdêriyan de hatiye tomarkirin ku zarokên jixwebawer di temenên xwe yên paş de bêhtir serkeftî ne, lê zarokên ku ji xwe ne bawer û fedîkoyî ji berpirsariyan direvin û bêhtir diwaxzin di bin kontrol û siparteyên kesên din de bin. Ji ber vê yekê divê di pirtûkên zarokan de naverok, zarokan ber bi “jixwebawerî û jêhatîbûnê” ve zarokan hişmend bike (Yalçın û Aytas, 2011: 51).

Di vir de te dîtî ku pirtûkên zarokan, zarokan ji hêla derûnî ve bi hez dike û wan ji şertên jîyanê yên xerab dikare biparêze. Pirtûk, bi saya naverokê ji zarokan re jîyaneke imajî çêdikin û dikin ku zarok bi van îmajan jîyana derveyî nas bikin û li gorî bûyerên derve hînî refleksan bidin.

1.2.4. Naveroka berhemên edebîyata zarokan

Sînorên naveroka edebîyata zarokan xwedî nîqaşên domdar in. Herçiqas edebîyata zarokan ji sînorên mîna temen û cureyên ve xwedî hin zelalîbûna jî be ji hêla naverokê ve ne eşkere ye. Naverok, li gor civak, ol û tiştên din yên fikrî ve dikare bê dorpêç kirin. Civakên Rojavayî ji civakên din li mesele behtir xwedî ramanên jî bîn carînan alozîyên tekûzîkirinê dijîn.

Geşbûna hêlên hestî bi saya pirtûkan dikare bê geşkirin:

Yurttaş (1997) dibêje ku pirtûkên zarokan divê mijarên wek hezkirin, hevaltî, dostanî, aşîti, başî, xêrxwazî û welatperwerîya bê nijadperestî bihewînin û van tiştan bipejirînin. Di pirtûkên zarokan de hesûdî û acizbûn divê tune be. Mijarên ku dijminatîyê dipejirînin divê di pirtûkên zarokan de cih negirin (Sever, 2013b: 121).

Bingeha edebîyata zarokan divê li ser erênîyê ava bibe. Herçiqas mijar û bûyerên xeter dikarin bên bikaranîn ji di encamê de divê zarok hêvîdar bimînin û bandora xerab û xerabîyê ji ser xwe biavêjin. Bi naverokên li ser başîyê û tevgerên afirîner zarok dikarin ji xwe re ramanên bi alîyê baş ve biafirînin.

Qada edebîyata zarokan hin bi hin xwe kifş kirîye û ev bêguman ji naskirina zarokan tê:

Di demên berê de têgehên weke “edebîyata zarokan” an jî “edebîyata zarokatî” zêde bal nedikişandin. Bi piranî beşên ku bala zarokan dikişandin ji berhemên mezinan dihatin hilbijartin û ev rewş wek başîyekê dihatê dîtin. Di wan beşan de bi piranî giranî didan fêrkirinê (Yalçın û Aytaş, 2011: 14).

Di edebîyata zarokan de honak ne weke yên demên berê ne. Honak di demên berê de bi awayeke hêsan û bi rêya mijarên sade dihat sazkirin lê niha bûyerên girîft, cihên cuda, lehengên guherbar û peyamên nehînkê di nav honakan de hene (Lukens ûd, 2018: 24).

Berî her tiştî nihêrîna li ser edebîyata zarokan bi demê re hatîye guhertin. Fikra ku edebîyata zarokan karekî zarokatîyê ye êdî ji hole rabûye. Edebîyata zarokan ji gelek hêlan ve pisporîyê dixwaze û naverok divê bi awayeke zanistî bên nivîsandin. Asta derûnî û zimanê zarokan divê li ber çavan be ku berhem sûdê bide zarokan û wan ji bo jîyana derveyî amade bike. Herweha taybetmendîyên wan xurt bike.

“Eklektîzma cureyan: Sînorên di navbera cûreyan de tê guhertin. Sînorên di navbera pirtûkên hûnandî û yên dîrokî, yên helbestan û yên fêrkariyê, yên herikbar û yên zanistê de tên guhertin.” (Lukens ûd, 2018: 27). “McCloud dibêje ku îmajên karîkaturwarî xwîneran ber bi cihana wan ya hundirîn ve dibe û ji wan re rê vedike ku bi zorê be jî berê xwe bidin nava xwe. Lê xêzkişanên rastî dihêle ku ew kes cihana derveyî bibînin.” (Lukens ûd, 2018: 50). Bi piranî di temenên piçûk de wêneyên di pirtûkên zarokan de alîkariyê didin zarokan ku naverokê bêhtir nas bikin. Di van temenan de zarok ji zanebûna bêjeyan ve hêj nehatine asteke xurt. Ji bili van sedeman xêzkirin, ji hêla hezkirina naverokan û balkişandina zarokan ve jî pêwîst e. Ev xêz an jî wêne, divê ji rastî û îzafiyeta zarokan dûr nekevin û ji hêla zarokan ve bên fêhm kirin.

Raman û hestên zarokan bi mezinbûna temen re tî guhartin û şablonên nû tî afirandin:

Gava ku zarok mezin dibin, bi saya tîkiliya di navbera tiştên derdorê de fêma xwe dikin û hin bi hin ji çîrvanokan dûr dikevin. Xwe nêzî cureyên ku naverokên wan rastî yan jî nêzî rastîyê ye dikin. Ev guherîn bi carekê re çênabe. Di gava pêşî de zarok ji çîrvanokê dûr dikevin. Pêvajoya ji nivîsên nivçîrvanok û nivçîrok ber bi nivîsên kâmil ve dimeşe û distewe (Kıbrıs, 2010: 118).

Naveroka pirtûkan û nihêrîna zarokan li cihana derveyî divê bi pêvajoyeke hevpar re bimeşe. Temen û gihaştina ramanî, naverok û girseya xwîner dîyar dike. Bûyer, mijar û vegotin divê di nav taybetmendîyên zarokan de tevbigerin. Heta asteke zarok çiqas hez ji bûyer û mijarên xeyalî bikin jî dema ku bi rastîya jîyanê re rû bi rû dimînin dixwazin naverok jî ji minakên wisa pêk bên.

“Ji bo ku bala xwîner li ser naverokan bisekine divê bûyerên vekêşan di pirtûkê de hebin.” (Lukens, 2018: 55). Vekêşanî, daxwaza xwendinê bi xwe re tîne. Tevgerên balkêş û bûyerên zindî bi piranî jî di temenên piçûk de bala xwînerên zarok dikişînin ser xwe. Ji ber vê pirtûkên zarokan divê xwedî van taybetmendîyan bin.

Astên berhemên zarokan bi asta zarokan ya derunî, ramanî û hestî ve ji nêzîk ve giredayîya:

Edebîyata zarokan divê ne ji nivîsên zarokwarîyê pêk bên, divê ev nivîs rastîya zarokan nas bikin û hûnandinên nêzî fikr, raman û astên wan di pirtûkan de bihewînin. Herweha jî ber ku pirtûkên zarokan ji bo zarokan pirtûkên pêşî ne, divê ev pirtûk heta asteke ji hêla hunerê ve jî dewlemend bin ku zarok ji wan sûd bigirin (Dilidüzgün, 2007: 96).

Çavdêrî ji bo zarokan pir girîng e. Di temenên piçûk de dema ku zarok bi pirtûkên nerast re tekiliyê datînin, ji xwendina pirtûkan sar dibin. Pirtûkên ne maceraperest, hevok û peyvên giran, naveroka ne balkêş hwd. divê ji zarokan re neyên pêşkêş kirin.

Berhemên zarokan divê ji gelek hêlan ve kompleks bin:

Nostalji hesteke ku di berhemên zarokan de ne pêkan ku zarok wê fêma bikin. Ev hest, hestekê dûrî wan e û zarok vê hestê nas nakin. Naveroka ku bi aheng be, bi peyvên dubare bibe, cih bide wêneyên ku bi amûran hatibe nexşandin bala zarokan bêhtir dikişîne û ev jî wan re dibe serpehatîyekê nû (Lukens ûd, 2018: 65).

Dilşewatî, ajîtasyon yan jî rebenî ji bo pêşveçûneke sazkar ne guncan e. Zarokên ku hêj nû dest bi naskirina jîyanê û derdorê kirine, dema ku bi van naverokan re rû bi rû bimînin ji hêla derûnî ve dibe ku pirsgirêkan bijîn û ji hêla ramanî ve reşbîn bibin. Ji ber vê sedemê kesên ku ji bo zarokan dinivîsin divê haydar bin ku naverokên wisa ne afirînin.

“Mirov ji hemû xwîneran re heta asteke van sînoran daxîne pir baş e û di berhemê de neheqî, newekhevî, zordarî, tunebûn û bûyerên dîrokî yên ku tiştên sosret tînin ziman bèn hûnandin ji bo zarokan sûdgirtineke bêhempa ye.” (Lukens ûd, 2018: 97). Naverokên piralî, bo xwendina zarokan pir giring in. Zarokên ku jîyana nû nas dikin, xwedî gelek pirs in û dixwazin di derbarê tiştên ku meraq dikin bersiv û agahîyan bistînin. Hestên nû, ramanên nû û dîmenên nû bi wan re baldarîyeke mezin çêdikin. Pirtûk di vê astê de dikare alîkarîyê bide wan û wan kêfxweş bike.

“Şêwe, li ser nivîsê nayê ceribandîn, şêwe nivîs bi xwe ye.” (Lukens ûd, 2018: 215). Dema ku zimanê zarokan di berhemê de asteke li gel xwe dît wê demê dikare bê gotin ku zimanê vê berhemê serkeftî ye. Zarok ji çi hez dike, divê hevok çawa bin, listikên gotinî divê di çi astê de bin? Ev pirs ji bo sazkirina zimanekî serkeftî pêwîst in.

“Divê zarok hînî rêbazên fikran bibe ne naverokên fikran. Biryara afirandina fikrê divê ji hêla zarokan ve bê afirandin ne ji hêla naverokê ve.” (Nas, 2004: 84). “Herçiqas peyama -naverok- gerdûnî û nûjên be jî dema ku nivîs dîdaktîk be zarokan ji xwendinê sar dike û xwendine bêtahm dike.” (Nas, 2004: 87). Bi saya pirtûkên zarokan fêkirina hin tiştan rêyeke şaş e. Zarok, divê pirtûkên zarokan ji bo zimanê xweş, honaka balkêş û naskirina jîyanê bixwînin. Dema ku dîdaktîzm bê bikaranîn, ev pirtûk dibin mîna pirtûkên dibistanê û zarokan ji xwendina edebî dûr dixin.

1.2.5. Di edebîyata zarokan de nivîskar û zimanê nivîskar

Zimanê di edebîyata zarokan de ne zimanekî mîna edebîyata gelemperî ye. Zimanê berhemên zarokan, divê di asta zarokan ya zimanî û ramanî de be. Divê hevok û bêjeyên di asta zarokan de bèn afirandin û berhem, di van çarçoveyan de bê sazkirin. Taybetmendiyên zarokan van pêwîstîyan jî bi xwe re tîne.

Zimanê berhemên zarokan yek ji xalên herî giring e. Ziman divê çawa be:

Di demeke de dihate gotin ku pirtûkên bi vegêrê yekem tî nivîsandin ji hêla zarokên piçûk ve xwedî pirsgirêk in; ji ber ku zarok di şopandina honakê de astengîyê dijîn lê di demên nêzik de ev hat guhertin û di gelek berhemên de êdî ev rêbaz tê bikaranîn. Di van çîrokan de divê rê vebe ku dengê vegêrên ciwan ji aliyên zarokan ve hêsanîr bîn fêmkirin. Ev çîrok divê bi piranî li cihên nasyar derbas bibin û zarok bi lehengan re bikarin têkilîyan ava bikin (Lukens ûd, 2018: 198).

Kesên ku bo zarokan dinivîsin divê bêje û hevokên zarokan ji nêz ve nasbikin û zimanê berhemên xwe bi wan nêrînan binivîsin:

Lêkolînên ku hatinekirin didin xuyakirin ku vegêrê sêyem -vegêrê hertiştan/vegêrê xwedavendî- fêmkirina wateyan giran dike, bawerîyê kêmkirî dibe û ji ber vê yekê zarok jê hez nakin. Kesek nikare ramanên di serê yekî din de bixwîne. Tê xuyakirin ku vegêrê yekem bêhtir ji dil e, mîna ku bi kesekî din re civat tê kirin. Çavdêriya li ser vî vegêrî ev e ku vegêr parvekirina hest, raman û nepenîyê diheve û ev ji aliyê zarokan ve bêhtir tê hezkirin (Yalçın û Aytaş, 2011: 48).

Zimanê ku tê bikaranîn divê barê zarokan sivik bike. Ziman, divê fêmkirina naverokê û têkilîya zarokan ya bi naverokê re hêsan bike ku zarok bê asteng bigihîjin wateya çîrokê. Vegotina yekem, ji vî alî ve vî karî ji bo zarokan hêsan dike û zarok bi awayeke herikbar pirtûkan bixwînin. Gava ku zimanê vegotinê û zimanê nava serê zarokan heman ziman be, ev ji hêla derûnî ve jî barê zarokan hêsan dike. Têkilîya bi mijar, bûyer û lehengan ve bi awayeke xurtir tê danîn.

Nêrîna zarokan nihêrîneke cuda ye. Dîtin û fêmkirina ji jîyana xwe, xwedî perspektîfeke bi serê xwe ye. Jîyan û bûyer ji zarokan re tiştên nû ne û zarok bi balkişandîneke matmayî dikarin li wan binihêrin. Tîrs û pîrsên wan ji yê mezinan cuda ne û xwedî hesasiyeteke ne. Ji mezinan hêvîyên taybet dikin. Di van şertan de hewce ye nivîskar van pêwîstîyan li ber çavan bigire û him vegotin him jî naverokan bi vî awayî saz bike.

Pirtûkên zarokan ne pirtûkên fêrkirin û hinkirinê ne. Elbet zarok ji naverokan dikarin jêderinan derbixin lê divê jêderxistin ne bi rêya gotinên nivîskaran bin:

Divê zarok bîrên piştgirîkirin ku li ser ihtîmalên encamên tevgerên xwe bifikirin. Di encamên van bûyeran de, ji aliyê zarokan ve dê bê texmînkirin ku bê ji hêla hestî ve li ser kesên din bandorên çawa çêdibin. Hevokên fermanker ku mîna “Diranên xwe firçe bike!”, “Li dersên xwe bixebite!”, “Bi hevalên xwe re

pevçûnê neke!”, “Berî xwarinê destên xwe bişo!”, “Der û dora xwe paqij bihêle!”, “Destlêgirtî be!” hwd. divê di naverokan de tune bin û bi vî awayî bang li zarokan neyên kirin (Sever, 2013a: 86).

Pirsgirêkên di navbera mezin û zarokan de bi piranî li ser tiştên rojane û qaîdeyên pratîka jîyanê ne. Rêzikên ku mezin ji zarokan dixwazin û bertekên zarokan bi piranî di nav van herdu alîyan de pirsgirêkan derdixin. Zarok, divê bi xwe van mijaran fêm bikin û hin bi hin rêzikên jîyanî ji xwe re bikin kar. Dema ku ji derve mudaxele çêdibe, zarok bersivên tund didin kesên ku emir didin wan. Nivîskar jî divê vê rastîya zarokan bide ber çavan û dema ku naverokê saz bike honakê di çarçoveya vê hişmendîyê de biafirîne.

Asta berhemên qadê divê ne yekalî be. Şert û mercên zarokan, rewşa ziman û ramanên wan li ser afirandina naverokê bandore dike:

Di nivîsên ji bo zarokan de divê nivîskar cih nede vegotinên mecazî û nerasterast. Zarokên ku di asta pêvajoya şênber de ne dibe ku ji fêmkirina vegotinên nerasterast û pirwate de astengîyê bikişînin. Herweha gerek nivîskar gerek jî leheng bêjeyên ne ji rêzê bi kar neînin. Hevokên kin, birêkûpêk ve vegotineke zindî divê bê bikaranin (Kardaş û Alp, 2013: 22).

Bi giştî di temenên piçûk de nivîskar, divê jîrbûna zarokan ya ji hêla fêmê li ber çavan bigire. Dema ku pênasêya rastî-xeyalî ne di asta zarokan de be zarok dê di fêmkirina naverokê de pirsgirêkan bikişînin. Zimanê ku tê bikaranîn jî divê bi naverokê re hevseng be. Vegotin gav bi gav dikare bê mecazkirin lê ev divê piştî temenekî be ku zarok ji nivîsên asta xwe sûd bigirin. Divê naverok û ziman bi temen û pêşveçûna zarokan ya ramanî vê qonaxa şênber û razberîyê serkeftî bê bikaranîn.

Nivîsîna pirtûkên zarokan divê xwedî du alîyan be. Yek jê, alîyê naskirina zarokan e ya din nivîsandina pirtûkan ya li gor vê naskirinê:

Taşdelen (2005) dibêje ku li gorî derûnnasî û rêzimana Schleiermacherî, nivîskar divê ne şert û mercên xwe, şert û mercên zarokan bide ber çavan. Rewşa ku zarok tê de ne -weke dîrokî, çandî, aborî û civakî- divê pîvanên nivîskar bin û nivîskar bi van pîvanan tevbigere û wan fêm bike. Nivîskar, divê vê îfadekirinê ne bi rêya zarokên nava xwe, bi rêya zarokên ku di berhema xwe de afirandine çêbike. Divê van zarokên ku afirandine jî ji hêla ziman û mantiq ve ji nû ve ava bike. Li gorî teorîya Wilhelm Dilhey ya rêbaza têgihiştina zanistî, fêmkirina zarokan ne pêvajoyeke xwedî fonksîyoneke rasyonel, danberhev, veqetandin û berhevkirinê ye; pêvajoyeke hezkirin û sempatîyê ye (Şirin, 2007b: 27).

Berî her tiştî divê zarok ji naverok û zimanê nivîsê kêfê bistînin. Ev pêvajoya tebîetê xwendinê bi vê gavê dest pê dike. Zarok dema ku di navbera xwe û pirtûkê de nêzîkatîyekê bibînin dê xwendinê berdewam bikin. Nivîskar vê serkeftîbûnê bi saya honak, leheng, ziman û çîrokeke baş dikare bîne cih. Nivîskar, ku hêza xwe ji rastî û izafiyeta zarokatîyê bistîne, dê têkilîya zarokan û pirtûkê pir zêde bike. Ev hez, divê ji amûrên nava pirtûkê bê holê.

Niherîneke berfirêh, raman û hestên piralî yên di derheqa zarokan de bo nivîsên serkeftî pêwîstîyeke:

Fîkr û qabiliyeta nivîskarîya zarokan di nava mirovan de heye. Nivîskar bi qasî ku zarokan nas dikin dikarin qala wan bikin. Ji bedêla ku rêyan şanî wan bidin, pêhisandina zordarîyan tînin ziman. Dûrbîna xwe her tim vekirî dihêlin. Nêrîna zarokan li gorî zarokan nava xwe dadigire û amade dike. Nivîskarên ne bi piştgirîya mijar, çîrok û felsefeyê; bi heza edebîyatê dimeşin û berhemên wan tînin xwendin, ew nivîskar in ku bi dilgermî û sade dijîn û serkeftî ne (Şîrin, 2000: 123).

Nivîskarên zarokan herçiqas heza xwe ji pedagojîk û perwerdeya bingeîn ya zarokan bistînin û çarçoveya xwe ji zanistê bigirin jî di dawîya dawî de divê hêzeke xurt ji edebîyatê û zimên bistînin. Zîmanekî sade û herikbar, naverokeke meraqkêş dê zarokan li xwe kom bike û xwendineke domdar ava bike. Dema ku ji vî alî ve bê şirovekirin dikare bê gotin ku edebîyata zarokan ne tenê edebîyateke teknîk e, herweha edebîyateke estetîk e jî.

“Ende (1993) dibêje ku Freud; nivîskarekî afirîner, dema ku zarok çî dikin ew jî wê dike.” (Güleryüz, 2013: 232). Dema ku mejîyê zarokan û naveroka pirtûkan nêzî hev bin, bandora pirtûkê li ser zarokan bêhtir çêdibe. Rêbaza honakê divê nêzî hest û ramanên zarokan bin. Nivîskar, divê li ser şopa zarokan û zarokatîyê bimeşe. Honak, leheng û amûrên din yên naverokê li gorî nihêrîna zarokan saz bike.

Pêvajoya nivîsandina pirtûkên zarokan divê bi avayekî hişmendî bê plankirin û divê di pêvajoyê de her tim amûrên serkeftî bînin bikaranîn:

Ionesco dibêje ku destûra we didin ku hûn derkevin ser rêyekê û barê lêkolînekê bidin ser milê xwe, em nizanin em dê çî bibînin. Nivîskarên dîdaktîk berî ku derkevin ser rê, şopa ku dê tê de biçin dizanin. Tiştek nîn e ku ev kes bibînin. Ya rastî pêwîstîya van kesan bi derketina rêyan jî nîn e. Ev kes, rêwîti û dîtînen kesên din dibêjin. Karên wan ev e ku amûrên tînin zanîn bi kar tînin, bi amûrên

hazir dixebitin. Hejmara van nivîskaran pir in. Tiştêkî ku ev kes bidin me nînin. Ji ber ku jîyana wan nîne, jîyanekê ku bidin me jî nîne. Bi piranî pirsên wan berî bersivan tên. Nivîskarên didaktîk an jî yên politîk, berî ku pirsan bipirsin bersivan li me dikin bar lê bersivên zindî bi vî awayî nayên (Mungan, 2011: 40).

Nivîskarê edebîyata zarokan divê afirîner be. Ji ber ku zarok bi xwe jî afirîner in. Zarok, ji tiştên nû, balkêş û bi tevger hez dikin. Dema ku di naverokê de tevger yan jî tiştên balkêş tune bin, zarok ji naverokê dûr dikevin û hin bi hin ji xwendinê sar dibin. Pirtûkên ku naverokên wan ji rêzê û bi şîret bin dûrî jîyana zarokan in. Bi piranî jî di temenên piçûk de dema ku pirtûk ji hêla naverokê ve zêde ne bi tevger bin bala zarokan nakişînin. Honakên ku nêzî jîyana rojane û klasîk bin ji bo zarokan pir lewaz in.

1.2.6. Leheng di edebîyata zarokan de

Afirandina lehengên edebîyata zarokan bi temen û asta psîkolojîya zarokan ve girêdayî ye. Armanca giştî ya pirtûka zarokan, sînorên taybetmendîyên lehengên qadê jî diyar dike. Karakter, tevger û gotinên lehengên berhemana, rasterast li ser zarokan bandorê dike, ji ber vê yekê divê leheng bi hişmendî bîr afirandin.

Yek ji amûrên pirtûkên jî leheng in û leheng di pirtûkên qada edebîyata zarokan de xwedî hesasiyeteke ne:

Nivîskar, divê vê bi zarokan bide xuyakirin ku leheng ji der û dora xwe hêzê distîne û di nav rewşan de tê guhertin. Serkeftina honaka nivîskar bi danîşandina guhertina lehengan ve girêdayî ye. Lehengên ku piştî gelek bûyeran nayên guhertin yan jî guhertineke bêbingeh, di nêrîna zarokan de cih nagire (Sever, 2013a: 130).

Pirtûk herçiqas tiştêkî honakî jî be divê taybetmendîyên jîyanê jî bi xwe re bigire. Tiştên bi tevger û çûn û hatin tê de hebe zarok bêhtir bala xwe didin wan. Heman tişt ji bo lehengan jî hene. Lehengên ku bi tevger in û bi saya naverokê tên guhertin ji bo balkişandinê guncantir in. Bûyerên ku li der û dora zarokan diqewimin jî bi tevger û guherbar in.

Têkilîyên di navbera zarokan û der û dora wan de bi piranî zindî ne. Zarok, dixwazin tiştên ku bala xwe didin wan nas bikin û bi wan re bikevin danûstandinê. Ev pêvajoya divê guherbar be. Dema ku giranbûn ber bi sivikbûnê ve yan jî reşbûn ber

bi spîbûnê ve çû, ev guhertin ji bo zarokan sedema şopandinê ye. Ji ber vê yekê be çawa ku hewce ye naverok guherbar be divê lehengên nivîsê jî bi heman awayî bin.

Afîrandina lehangên divê bi zanêbûn bîrê afîrandin. Zarok, ji ber temenên xweyî biçûk behtir dikarin di bin bandorê de bîrê nivîskaran divê haydar bin:

Lehengên çîrokê ku zarok wan ji xwe re bikin weke modelan, dema ku bi rêya efsûn û sêhran bigihêjin armanca xwe û vê yekê bi zordariyê bikin, mîmkûn e ji zarokên ku tebîeta xwendinê bi wan re tune be minakên nebaş derxînin holê. Honak dibe li gorî jîrbûna xwînerên zarok bin (Sever, 2013a: 35).

Zarok, di asta mînakgirtinê de di demeke pir hêsan de ne. Di van temenan de hêj ji nû cîhana derveyî nas dikin. Encama tevgeran hîn tecrube nekirine û başî û xerabî ji wan re ne zelal e. Ji ber ku zarok di van salan de hest û ramanên nas nakin encamên wan yê li ser kesan jî fêr nakin. Dibe ku ji êşkişandina kesên din kêfê jî bistînin. Di vê rewşê de nivîskaran divê lehengên xwe di çarçoveyê berfireh de biafirîne ku zarok rolê modelên baş hilbijêrin.

Berhemên qadê divê alîkariyê bidin zarokan da ku zarok, ji hêlên pêwîst ve xwe geş bikin:

(Zarok) Bi rêya lehangên dikarin bûyerên bîrê mirovan nas bikin. Zarok dê ji wan helwest û gavên lehangên ku di dema pîrgirêkan de jixwebawer diavêjin, serbendan bibînin. Rêzikên ku civak û jîyana mirovan pêk tînin dê nas bikin û hişmendîya naskirin û fêmkirina wan dê di serê xwe de saz bikin. Fezîleta tiştên ku jîyanê watedar dike wê hîn bi hîn bibihîzin (Sever, 2013b: 76).

Derfet nîn e ku mirov hemû bûyer û hestên li ser rûyê erdê bijî. Xwendinê derfetê bi rêyê hêsan dide mirovan û ev tişt bo wan him ji hêla empatî him jî ji hêla naskirina kesayeta xwe ve alîyekî binirx e. Di plansazîya naverokê de nivîskar, divê honakê ji xwe re bike mîna laboratorîyê ku pirtûk an jî xebatên ji bo zarokan bibin qadên sîdwergirtinê.

1.2.7. Hesasîyetên edebîyata zarokan

Qonaxa zarokatîyê binyada mirov e. Naskirina jîyanê, têkilîya bi mirovahîyê re di vê qonaxê de dest pê dike. Zarok; bi aloziyên jîyanê re di vê qonaxê rûbirû dimîne

û li çareserîyan digere. Li gel vê zarok xwe di vê qonaxê keseyatê xwe jî di afirîne. Lewma naverok, ziman, leheng, honak û bûyer dibe ji van sernavan bê avakirin.

Ji parastina derûnîya zarokan nivîskar berpirsîyar e. Bêguman ev berpirsîyarî hêza xwe ne ji dadê distîne. Ev tiştekî etîk e û ji bilî nivîskar divê kesên ji zarokan mesûl bin jî ji vê haydar bin. Zarok, ji tundîya derveyî re pir hesas in û heger naverok ne bi rêk û pêk bin dibe ku zarok ji pirtûkan zirarê bibînin. Ne tenê naverokên neyînî, yê ku doza erênî jî gelek bin zirarê didin zarokan. Di naverokên wisa de zarok dikevin cîhaneke xeyalî û ramanek bi wan re çêdibe ku jîyan her tim geş û xweş e. Nivîskar, divê ji jîyana rasteqîn zêde dûrnekeve.

Çanda rexnekirinê zarok dikare ji pirtûkên serkeftî hilbigire. Dema ku pirtûk xwedî alîyekî rexnegir û piralî be, zarok ji ye ji vê sûd bigire:

Endîşeya yekem a otorîterîyê; perwerdekirina zarokan e û xetereya mezin jî bêtî ku bi awayeke rexneyî bifikire, xwînerê her tiştê ku dixwîne weke rastîyê qebûl bike û li gorî wê hereket bike ku ev jî bi temamî hizra afirîner û rexneyê dikeve û teqlîdê ava dike (Subaşı, 2021: 226).

Zarok, xwedî hiş û aqlê afirîner in. Hestên nû, bûyerên nû, niherînên nû ji bo zarokan tiştên sereke û pêwîst in. Zarok, jîyana xwe li ser van tiştan ava dikin û kesayeta xwe diafirînin. Lê gava ku nivîskar li dijî van taybetmendîyan alî bigire û naverokê bi awayeke “mezînatî” biafirîne, berhema xwe ji rastî û îzafîyeta zarokan dûr dixê. Zarok, berê xwe didin alîyên nûjên û zindî, ne yê rasterast ji jîyanê û şîretkar.

“Li gorî Wolgast, pirtûkên zarokan ne çavkanîyên doktrînen agahî û exlaqê ne. Ev pirtûk divê taybetmendîyên hunerê bihêwirînin.” (Binder, 1996: 744). Armanca pirtûkên zarokan dîyar e: Zarokan ji hêla ziman, kesayet, raman û naskirina xwe û cihanê de bi pêşve bibin. Ev armanc, bi rêya naverokên honakî divê bê çêkerin. Dema ku naverok nebi vê rêyê be amadekirina pirtûka zarokan dibin mîna pirtûkên dibistanê û armanca wan tenê dibe fêrkarî. Ev, çewtîya nêrîna şîretkar e jî. Gava ku armanca afirîner ji holê rabû û şûna vê fêrkarî hat, zarok ji têbîetê xwendinê dûr dikevin.

Ji zarokan veşartina rastîyê, di salên dahatûyê de dê bêhtir zirarê bide wan. Di temenê piçûk de dema ku zarok jîyanê nas dîkin divê bi rastîya jîyanê re rû bi rû bimînin. Rûbirûmayîn dê zarokan amadeyî rastîyê bike û wan ji hêla hest û ramanan ve jî bi hez û jîr bike.

“İpşiroğlu (1997) dibêje ku divê em ji bîr nekin ku zarok ji hêla fêrkarîyê ve mejîvekirî ne û ji meraqê re pir baş in lê kêfa wan ji hîndekarîya kesên din re nayê.” (Nas, 2004: 74). Pirtûk di vê astê de roleke giring digirin. Di navbera mejîyê zarokan û cîhana derveyî de têkilîyekê saz dîkin. Gava ku naverok û zimanê pirtûkê bi taybetmendîyên zarokan re di heman astê de bin dê zarok bala xwe bidin honakê û bi baldarîyekê baş xwendina xwe bikin. Lê dema ku armanca pirtûkê bû şîretkarî dê zarok jî ji xwendinê sar bibin. Ji ber ku di jîyana xwe de ji kesên mezin bi piranî van tiştan dibihîzin û naxwazin ku di pirtûkê de jî van bibînin.

Bi giştî dikare bê gotin ku pirtûkên zarokan xwedî pir tebeqê ne û ev divê ku ji hêla nivîskaran ve bê afirandin:

- Pirtûk divê ji helwesta otorîteya nivîskar rizgar bibe û di vegotinê de nêrînên berfireh pêşkêş bike. Nivîskar, divê ne mîna kesekî mezin li ser serê zarokan be. Berevajî vê divê bi wan re di asteke hevpar de be.
- Peyamên pirtûkê li gel fikrê di serê nivîskar de divê gelekî zelal bîn nîşandan.
- Ji ber ku helwesta vegotina nivîskar rewşa estetik û nîrxî ya pirtûkê saz dike divê vegotin vekirî û pîralî be.
- Nivîskar divê zarokan cidî bigire, ziman, vegotin û honak divê zarokan di zorê de nehêle û li gorî rastî û hestên wan be.
- Mijarên ku tên hilbijartin divê li gorî rastî, jîyan û pêwîstîyên zarokan bin.
- Jîyanên îdealîze divê di naverokan de tune bin. Divê hin fezîlet, raman û fikrên dinyayê bi tundî nedin zarokan.
- Berhem, divê binîrx be ku kêf û eşqa xwendinê bide ciwan û zarokan.
- Pirtûkên binîrx yê zarok û ciwanan divê ji hêla mezinan ve jî dikaribin bîn xwendin (Dilidüzgün, 2007: 97-98).

Pirtûkên zarokan ji ber ku ji bo girseya zarokan in, hewce ye ku pîralî û balkêş bin. Ev rewş pêşîya pîrxwendevanîyê jî vedike. Dema ku naverok serkeftî be sazîkirin

û mijar bi awayeke balkêş bê hûnandin ji bilî zarokan kesên mezin jî dikarin pirtûkên zarokan bixwînin.

“Sezer dibêje ku xwegihandina jîyana zarokan pir zehmet e. Ew kesên bigihêje vê dilşad e.” (Nas, 2004: 332). Gihaştina zarokan bi naskirina wan mimkûn e. Têkilî û danûstandinên bi zarokan re naskirina zarokan jî bi xwe re tîne û ev jî rêbaza nivîsandina naverokên ji bo zarokan dîyar dike.



2. ÇÎROKÊN ZAROKAN Û NIMÛNEYÊN WAN DI KURMANCÎYA BAKUR DE

2.1. Çîroknivîsîya Zarokan di Kurmancîya Bakur de

Rewşa çîrokên edebîyata zarokan ya Bakur, bêguman bi pêvajoyên siyasî, civakî û perwerdehîyê ve giredayîye. Alozi û guherînên piralî û bêçareserî, aqûbeta kurmancîya Bakur jî bi xwere dorpêç kirîye. Ligel vê rewşa giran jî xebatên bo çîroknûsîya kurmancîya Bakur, hin xebatên sereke hatine kirin. Destpêka vê qada yekemîn li derveyî Bakur e. Kesên mîna Mîr Bedîrxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Zinarê Xamo li derveyî Bakur, fabl û çîrokên kurdî yên bo zarokan nivîsandine û bi rêbazinan çapkirine. Hin bi hin bi dema ku li Bakur şert û mercên li ser kurdî ewle dibin berhemên ji bo zarokan tînin nivîsandin hem ji rêjeya hejmara nivîskaran hem ji hejmara berheman jî zêde dibe. Di vê çerçoveyê de kesên sereke yên ku di qada çîrokên zarokan de ked û berhem dane, bi awayeke giştî hatin binavkirin.

Xebatên nivîskî ku li ser edebîyata zarokan ya kurdî, di salên pêşî de mîna gavên biçûk in lê ev kes û berhem, rêya qadê vekirine:

Berhema Cegerxwîn a bi navê “Cîm û Gulperî” (1947) ya ku ji bo keç û xortan wek diyarî hatîye nivîsandin û bi hevoka “çîroka min ji we re xweş” ve qedîya ye jî, ji bo edebîyata zarokan a kurdî dikare wek nimuneyek bê nîşandan. Koma Karên Çandî ya Enstituya Kurdî ya Parîsê destnîşan dike ku Cegerxwîn ev pirtûk di sala 1948an de çap kirîye, lê ji ber ku ev pirtûk êdî dest nakeve, wan di sala 1978an de li Berlînê jî nû ve çapkirine.

Berhema Cim û Gulperî herçiqas bo keç û xortên kurd mîna diyarîyek bê danasîn jî ev berhem ji naverokê û pêwîstîyên din ve ne ji bo zarokan e. Armanca nivîskar ev e ku hişmendîyekê çêbike û kurdî geş bike.

Kovara Hawar ya ku xwedî naverokeke pir alîyê ji hêla edebîyata zarokan ve jî xwedî hin nirxan e:

Fablên Osman Sebrî hinek di kovara Ronahîyê de hatine weşandin. Wek mînak di hejmara 5emîn de “Çîroka Dîk û Rovî”, di hejmara 6an de “Şêr û Kêvroşk”, di hejmara 7an de “Daweta Kêzê”, di hejmara 8an de “Mih û Şêr û Gur” di hejmara 9an de “Ker û Heft Gur”, di hejmara 12an de “Gurê Pîr”, di hejmara 13an de “Kerê Dengbêj” hatine weşandin. Hawarê de ji bo zarokan helbest, çîrok û fabl nivîsandine. Ji bilî Osman Sebrî, hin nivîskar û helbestvanên din jî di kovara Hawarê de ji bo zarokan helbest, çîrok û fabl nivîsandine. Wek mînak, Mihemed Emîn Botî fableke bi navê “Çûk û Fil” di kovara Hawarê de nivîsandîye. Celadet Bedîrxan kitêba Bryan Guinness ya bi navê “Conî û Cîmêma” ya ku ji çîrokên

zarokan pêk tê, ji frensî wergerandîye kurdî (1943). Bedirxan di hejmara 20an a Ronahîyê de behsa vê kitêbê dike û dibêje xwendevan dikarin ji Kitêbxana Hawarê vê kitêbê peyda bikin.

Kovara Hawar û Ronahî, di kurdî de gavake binirx avêtîye û zimanê kurdî ji gelek hêlan ve pêşxistîye. Nivîskarên mîna Celadet, Kamiran û Osman Sebrî di van kovaran de bo edebîyata zarokan berhemên sereke afirandina û ji şopînerên xwe re rêyek vekirine.

Sal bi sal qada edebîyata zarokan ji hêla kesên eleqedar û berhemên ku tên afirandin re li xwe zêde dike û ev qad rêjeya xwe geş dike:

Di salên dawîn de jî (2014) antolojîyeke çîrokan a bi navê “Hebû Tûnebû Antolojîya Çîrokên Zarokan” ya Zinarê Xamo ji hêla Weşanxaneyê Rûpelê ve hatîye weşandin. Zinarê Xamo, Murad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Mahmut Baksî, Kemal Burkay, Haluk Öztürk, Firat Cewerî, Mehmet Emîn Bozaslan ên ku li Tirkîyeyê koçî Swêdê kirine û li wir cih bûne ji bo zarokan helbest, fêb, çîrok û pirtûk nivîsandine. Van rewşenbîran ji bilî berhem nivîsandinê, wergerkirine, kovar derxistine û pirtûkên ku di dibistanan de zimanê kurdî hînî zarokan dikin, amadekirine. Xwedîyê wê Mem Bawer e û ew bi xwe jî ji bo zarokan berhem dinivîse. Xwedîyê Weşanxaneyê Hîvayê Mem Bawer di hevpeyvîneke xwe de navê van nivîskaran wiha rêz dike: “Bêrî Bihar, Îsmail Dîndar, Yaqob Tilermenî, Mîran Janbar, Berfin Ayşe Ögüt, Mahmûd Nêşîte, Mûrad Dildar, Şukran Çaçan, Hasîp Yanlıç, Ferîdûn Bîrgul, Seyhan Karakoç, Berfin Îde Demîral, Yasemîn Elban, Amed Tîgrîs, Mahmûd Lewendî, Kerem Tekoglu, Janya Acar, Amed Gernas, Jîr Dîlovan, Yunis Bahram, Yehya Elewîferd, Konê Reş, Aynur Özbay, Benûşe Elewîferd, Rustem Felat, Roza Metîna, Hîva Yûce ve Mem Bawer (Tosun, 2018: 149-150).

Gavên bo vê qadê hatine avêtin, ji şopînerên qadê re prototîpên xwe avakirina. Hejmara kesan û berhemên bi şertan ve gîredayî zêde dibe. Ekosîstema edebîyata zarokan bi firêhbûna rêjeya xwendekaran wê mezintir bibe. Ji bo ku nirx û kûrbûna qadê zêde bibe divê astengiyên li ser ziman rabin.

2.2. Rewşa Perwerdehiya Kurdî li Bakur û Bandora Wê ya li ser Edebîyata Zarokan

Pêşketina zimanan bi pêşketina edebîyat, perwerdehiya û bikaranîna wî zimanî ya di nav qadan, dibistanan, girseyên gel û çapamenîyê hwd. ve têkildar e. Ev qadên ji cuda, zimên bi alîyên pir cuda ve geş dikin û ziman bi pêş ve dibin. Kêmasîyan wan cudahiyan ziman ji hêla rêziman, pîrbêjeyî, standartîzayona diyalektan, edebîyateke xurt û ragehandina di nava kesan de lawaz dike. Kurdî –kurmancîya Bakur- ji xalan

ve xwedî astengîyên tund hatîye. Ji destpêka avakirina komarê heta dema niha kurdî, ji hemû alîyan ve bi rêya qanûnên fermî û pratîkên zordestî hatîye dorpêçkirin. Di salên 90î de hin qanûnên erênî bèn qebûlîkirin jî ji hêla pratîkê de ev erênî nebûne xwedî hêzeke xurt û geş. Qedexeyên li ser kurdî, xwedî bingeîn îdeolojîk û maf bînpêkirinan in. “...Yıldız dibêje ku Komarê, di serî de bi polîtîkayên perwerdehiyê û gelek polîtîkayên din hewl daye ku ji bilî tirkî zimanên din bèn îhmalkirin, înkarkirin û di dawîyê de bişafîtin.” (Kurt, 2020: 5) Rêbazên wisa, axîferên zimanên bindest kem dîkin. Zimanên serdest, ji hêla dewleta xweyî fermî ve tên bihez kirin û ji hêla qanûnî ve jî tên parastin. Zimanên mîna kurdî, herçiqas ji sazîyên wek Koma Miletan ve bi çarçoveyan fireh bèn parastin jî ev qanûnên giştî ji hêla dewletan ve hin caran nayên bicihanîn.

Qedexekirina axaftinê, bêperwerdeyî, nebûna çapamenîyê û gelek pîrsgîrekên li dora kurdî, di salên 90î de hin bi hin ji hêla fermî tên sistkirin lê ev pêjavo bi careke re aramîyê naîne. Di van salan de hin bûyerên çapemenî û kursên ziman vedibin û hin çalakîyên binîrx lê pîr kêr li dar dixin. Di salên 2000î de perwerdehiya kurdî li zanîngehên fermî û taybetî û bi rêya vekirina dersên hîlbijartî li dibistanan qadekê ji xwe re dibîne. Pêvajoyên ku salên berê di nav bêderfetan de derbas dibû di van salan de hinekî geş dibin. Lê ev rewşên ku aramîtir in, nayê wateya ku kurdî gihaştîye asteke serbixwe û serkeftî. Bînpêkirina mafê perwerdehiya giştî, hin qedexeyên li ser bikaranîna alîyên zimên, der û dora kurdî hêjî dipêçe û ev rewş pêşketina kurdî qels dike. Ev bêmafî sal bi sal axîverên kurdî kêr dike û kurdî dixê xetereyeke giran de.

Edebîyata zarokan rasterast di bin bandora kurdî ya giştî de ye. Qedexeyên li dibistanan, bêperwerdehiya fermî xwînerên zarok ji vê qadê bêpar dihêle. Perwerdehiya fermî hem ziman geş dike hem jî amurên edebîyatê mîna pirtûk û materyalên edebîyata zarokan ji hêla rêjeyê ve zêde dike. Zêdebûna xwendekaran zêdebûna xwîneran jî bi xwe re tîne. Perwerdehiya fermî; tengasîya kurdî, nivisandî û axaftin û edebîyata kurdî ya zarokan geş bike.

2.3. Nejla Öztürk û Çîroknivîsîya Wê ya ji bo Zarokan

16 çîrokên Nejla Öztürk¹, tê lêkolînkirin. Berhemên ku di vê xebatê de tên lêkolînkirin *Kişzer Xanim* û *Kesper* in. Öztürk, di çîrokên xwe de mijarên hevaltî, jixwebaverî, alîkarî, parastina xwezayê û ajelan, serkeftin û tenduristîya mirov mîna mijarên sereke bi kar tîne. Öztürk di hevpeyvîna xwe de mijarên ku nivîsîye wiha qala wan dike:

Dema ku berhemên xwe dinivîsim nêrîn û hestî zarokan temenê zarokan didim berçavên xwe. Perspektîfa ku ez dişopînim ev e; bi fehmkirina derûnîya zarokan heya bi min tê gorî nêrîna wan peyama û peywendîyên erênî datînim. Ez piranî di berhemên xwe de peywendîya xwezayê, ajal, alav, hwd. û zarokan bi hev re dinirxînim. Belkî dixwazim zarok bi xweza û jîndarên xwezayê re hevhatî bin. Teknolojîya pêşketî, lîstikên elektrîk û medyaya civakî mixabin zarokan dûrî xwezayê dike. Û ez jî dixwazim bi rêya çîrok û helbestan bala wan bikişînim ji ser xwezayê (Öztürk, 2024).

Öztürk, bi afirandina honakên xwe van mijarên ku eşkere dike di naverokên xwe de bi kar tîne û pirsgerêkên di jîyana zarokan bi giştî dixê temayên çîrokên xwe. Öztürk di edebîyata kurdî de nivîskarên ku ji xwe re mînak digire wiha behs dike:

Nivîskarê ku ez ji bin tesîra wî de me bêguman Ehmedê Xanî ye, fikr û ramanên wî ne, nesîhet û berhemên wî ne. Helbestên Cegerxwîn... Ked û xebatên Celadet Bedirxan, Kamûran Alî Bedirxan, Zana Farqînî, Mehmet Emin Bozarslan û gelek kedkarên me yên qedirbilind ê kû ji bo zimanê Kurdî xizmet kirine û ên ku dike... Hemû bi hevî û hêz didin pênuşa min. (Öztürk, 2024).

Xebatên bo kurdî hatine kirin ji Öztürk re, rêyekê nîşan didin. Pêşvebirina ziman û çanda kurdî armanca sereke ye. Bi rêya edebîyat û nivîsê kedayîna bo amûrên neteweyî xebatên nivîskar çarçove dike û gavan diavêje. Kedkarên zimanê kurdî, bo Öztürk, lehengên şopandinê ne. Öztürk, asta zarokan ya modern wisa şîrove dike:

Demên berê çîrok û fêlê bingeha edebîyata zarokan bu û piranî jî peyama ji bo zarokan weke derseke bi eşkere xuya dibû. Dema modern de ew bawêşînk cûr bi cûr, reng bi reng mezin û berfireh bûye. Mijarên pirtûkan bi rast e rast ji ser jîyana zarokan ya rojane re avarê dibe û zarokan bi ve rêya fikr û hîlbijartinê bi hêsanî vedike. Fikr û xeyalen zarokan bêsînor û azad dihele ew jî buyerêk pir baş û serkeftîye (Öztürk, 2024).

¹ Di hevpeyvîna me ya bi Nejla Öztürk ra wê xwe bi vî şiklî da nasîn: Ez Nejla Çaçanoglu Öztürk sala 1977 de li Bazîdê ji dayik bûme. Dibistana seretayî li gundê xwe Qerequmezê, dibistana navîn li Bazîdê Y.I.B.O de û lîse li Bazîdê (Sağlık Meslek Lisesi) xwendîye. Li Stenbolê dijim Cuma Öztürk re zewicîme du kur û du qîzen min hene. Berhem: 2 pirtûkên kurdî (Kesper) (Kişzer Xanim); Bloga xwe ya bi navê (Kurdîzarok) bikartînim; 2 Pirtûk Tirkî (Mizmiz Sorik, Kardan Kiz); 2 Ji ser wergeren zimanê îngilîzî û kurdî dixebitim (Öztürk, 2024).

Nêrîna nivîskar, ji hêla edebîyata zarokan ve ramaneke modern e. Pêwîstî û rêbaza qadê ji hêla nivîskar ve bi awayeke zelal tê dîtin û qalkirin. Çarçoveya fikrên zarok, zarokatî û amûrên ku di edebîyata zarokan de bîn bikaranîn serkeftî ne. Pêwîstîyên edebîyata zarokan li gor Öztürk wiha ne:

Di edebîyata zarokan de ziman, leheng, honak, bûyer, peyam divê gorî temenê zarokan were rêzkirin. Divê zimanekî sivik û hêsan, lehengên ku zarok bi hêsanî nêzîkî xwe bibîne û hestên erênî pêk bîne bê bikaranîn. Divê bûyer, meraqa zarokan şîyar bike û pêvajoya mijarê weke hûngulîyan bi aheng kelecane bidomine. Destpêk, naverok û encam bi hev re û hevhatî biherike. Gorî temenê zarokan divê peyam, fikr û xeyalan bi rêya wêneyan jî bixemline (Öztürk, 2024).

Öztürk, pêvajoya plansazî û afirandina naverokê bi giring dîtina zarokan re dest pê dike. Zarok, bo nivîskar kesên sereke ne. Pêşvebirina derûnî, xurtkirina nasnameyê û kûrkirina ramanên zarokan bi rêya nivîsên berhemên edebîyata zarokan ji hêla Öztürk ve tê dîtin.

2.4. Murad Dildar û Çîroknivîsîya Wî ya ji bo Zarokan

Murad Dildar², di berhema xwe ya bi navê Stêrka Piçûk de bo gencan heşt çîrok nivîsîne. Çîrokên Dildar, bi şêweya çîrvanokan dikarin bîn naskirin. Dildar, bi ziman û naveroka çîrokên xwe edebîyata devkî ya kurdî diparêze. Motîfên edebîyata devkî di çîrokên wî de cihê xwe digirin. Sazkirina naveroka edebîyata zarokan ji hêla Dildar ve wiha tê dîtin:

...Li gor demên nû, mijarên edebîyata zarokan jî diguherin. Edebîyata zarokan, di perwerdehiyê de pir tê bikaranîn. Loma bi perwerdehiyê, mijarên edebîyata zarokan jî guherî û hîn jî diguhere. Wekî din pêşketina teknolojiyê, belavbûna teknolojiyê di nav zarokan de, edebîyata zarokan jî diguherîne. Pirsgerêkên civakî jî li ser zarokan bandoreke çêdike û ev pirsgirêk carinan dibin mijarên edebîyata zarokan. Mînak, bi devjihevberdana dê û bav, jîyana zarokan diguhere, psikolojiya wan diguhere. Ev meseleyên civakî jî hêdî hêdî di berhemên zarokan de cih digrin. Ez naverokên berhemên xwe li gor jîyanê û li gor mijarên balên zarokan dikşînin diyar dikim. Bi taybetî xweza, têkiliya xweza û insanan, hevaltî, giringîya hevaltîyê naverokên berhemên min in (Dildar, 2024).

² Di hevpeyvîna me ya bi Murad Dildar ra wî xwe bi vî şiklî da nasîn: Di sala 1986an de li Diyarbekirê hatim dinyayê. Min dibistana pêşîn û lîseyê li Diyarbekirê xelas kir û li zanîngehê li ser felsefeyê xwend. Heta niha sê berhemên min ji bo zarokan hatine çapkirin. Çarîn û çîrokên min di kovarên Nûbihar û Bar û di malpera Kulturnameyê de belav bûne. Herwiha nivîsên min ên li ser felsefeyê, di kovarên Felsefevan, Bar Helbest, Dadistan û Sûretgrafê de belav bûne. Yek ji amadekarên podcasta Qehwe û Felsefeyê me. Di adara 2024an de, min li Botantimesê dest bi nivîskariyê kir. Niha mamostetiya felsefeyê dikim û li ser felsefeyê perwerdehiya masterê dibînim (Dildar, 2024)

Nêrîna Dildar ya li ser naverok û çarçoveya edebîyata zarokan dîyar dike. Bi guherîna dem û mercan naveroka berhemên qada zarokan jî dibê bê guhertin. Guhertin pêwîst e ji ber ku zarok û zarokatî jî di encamên wan şertên nû de tê guhertin. Jîyana zarokan bi jîyana rojane ve têkildar û zarok dibê xwe di naverokên pirtûkên zarokan de bibînin. Pirsgirêk, alozî ya jî fikrên ku ji afirandinê re pêwîst in mijarên giring in. Giringîya zimanê pirtûkên zarokan ji hêla Dildar ve sernavekî giring e:

Bi min di nav van amûran de ya herî giring ziman e. Berhem ji bo zarokan, li gorî temenê wan bê dabeşkirin û li gor van temena ziman bê dîyarkirin wê çêtir be. Çimkî di her temenê de, fehm û têgihîştina zarokan cuda ne. Lê dîsa jî bo tevahî ez dikarim bêjim, divê zimanê zelal û pedagojîk bê bikaranîn. Hevokên zêde dirêj û tevlihev divê neyê bikaranîn. Di nav leheng û honak û bûyeran de divê girêdaneke baş û ahengeke hebe. Ev girêdan û aheng bo herikbarîya berheman giring e. Di nav lehengan de, divê wekhevîyeke zayendî hebe. Yanî serleheng divê tim ne law bin. Ji alî hêz, kar, rêbertî û hwd. divê di nav keç û lawan de wekhevîyek hebe (Dildar, 2024).

Honak herçiqas afîrîner jî be ziman û vegotin dibe ku xwedî payake binirx û dewlemend be. Ziman, bo zelalkirin û nîşandana peyam û temaya naveroka di rolê sereke de ye. Bêje, hevok û peyv sazî; dibê armonîyekê saz bike û bo xwîneran daxwaza xwendinê derxine hole. Ji bilî vê ji hêla zayendî ve jî naverok dibe bi wekhevîyek bi afîrîne da ku xwîner ji naveroka peyamên bi nirx bistînin. Asta zimanê di edebîyata zarokan de xwedî taybetmendîyanê û Dildar vê wiha tîne ziman:

Bi min pîvana herî giring, psîkolojîya/pedagojîya zarokan e. Pîvaneke din jî ziman e. Herçiqas mezin û zarok bi heman zimanî xeber bidin jî, zimanê zarokan ji mezinan cûdatir e. Nêrîna wan a li ser jîyanê û cîhanê cûdatir e. Loma divê zimanê berhema, li gor fehm û têgihîştina zarokan be (Dildar, 2024).

Îzafiyet û rastîya zarokan benda herî sereke ye. Zarok û zarokatî xwedî qonaxêke cuda û krîtîk e. Taybetmendîyên vê demê ji hêla derûnî, zimanî û nêrîna jîyanê we dibe ku di naverokên pirtûkan de ji cih bigire.

2.5. Çetoyê Zêdo û Çîroknivîsiya Wî ya ji bo Zarokan

Çetoyê Zêdo³, di vê xebatê de bi çar çîrokan cih digire. Zêdo, di çîrokên xwe de xwedî zimanekî îronîk û herikbar e. Mijarên mîna azadî, hevaltî, wêrebûn, xweza, pirsgrîkên di demên zarokatîyê de di çîrokên xwe de bikartîne. Pêwîstîyên qada edebîyata zarokan Zêdo wiha tîne ziman:

Nivîskar divê pîvanan bizane lê dîsa jî divê xwe bi pîvanên mekanîk girênde. Bi giştî divê xwedî poetikayeke xwerû û bi estetîkekê ve girêdayî be. Hay ji xwe û zarok û ziman û civaka xwe hebe... Nivîskar bizane jî kê re, kîjan temenî re an xwe li kê û çawa digire û dinivîse. Bijartina mijar û vegotina çîrokê, ziman û şêweyeke fambar û balkêş, baldarîya pedagojîyê... (Zêdo, 2024).

Ziman û ramanên zarokan di qonaxa zarokatîyê de xwedî alîyekî serbixwe ne. Ziman û honaka edebîyata zarokan divê van serbixweyîyan rast bibîne û bibihîze. Amûrên ku ji jîyan û nêzî jîyanê hatin bidestxistin, bi zimanekî estetîk û di nav çarçoveya rastî û îzafîyata zarokan de tê bikaranîn. Temen û taybetmendîyên zarokan jî xalên serekene ku nivîskar di dema nivîsandina berhemê de li ber çavan bigire. Zêdo, bingeha nivîskariya xwe wiha tîne ziman:

Ez zarok bûm, pişt re bûm mezînekî di nav zarokan de. Weke mamoste 20 sal, weke bav pênc sal, weke lêgerîna zaroktiya xwe min jî weke gelek kesan ji bo zaroktiya xwe li kurmancî û hunerê girtîye, nîzanim ev jî min çiqasî dixê nav zaroktiyê... Dixwînim û carinan jî min bê dinivîsim (Zêdo, 2024).

Nivîskariya edebîyata zarokan amûr, naverok û zimanê xwe ji hûrgiliyê demên zarokatîya û tecrûbeyên dema meznatiya dikare bigire. Jîyana rastî, bi rêbazên nivîsê û zimanekî guncan, ji bo edebîyata zarokan dikare bibe naverokên serkeftî. Serpehatîyên zarokatîyên yê derûnî, civakî û keseyatî nimûneyên binîrx didin qada edebîyata zarokan. Guherîna asta edebîyata zarokan li gor Zêdo:

³ Di hevpeyvîna me ya bi Çetoyê Zêdo re wî xwe bi vî şiklî da nasîn: Çetoyê Zêdo (Çetin Erol) di sala 1981ê de li Mêrdînê ji dayîk bû. Di 2004an de, Zanîngeha Wanê beşa Mamostetîya Zimanê Tirkî û di 2012an de Zanîngeha Stenbolê beşa Dramatûrjîyê qedand. Wekî dramatûrg di ÎBŞT û di hin şanoyên Kurdî de xebitî. Derhêneriya şanoyên “Şengê û Pengê” û “Bêlome” û “Zargotin” kir. Berhemên wî yê ku heta niha çap bûne: Şengê û Pengê (Şanoname, Weşanên Filîto, 2014) Siltanê Filan (Şanoname, Weşanên Şaredariya Amedê, 2015). Ji Soranî, romana Ferhad Pîrbal, 7 Wêney Rûti Jinî Cenabî Wezîr adapteyî Kurmancî kir. (Avesta, 2014). Bi Yavuz Akkuzu re Dîroka Şanoya Kurmancî (Peywend, 2015) û Kürt Tiyatro Tarihi (Evrensel, 2016) amade kir. Ji nav weşanên Nûbiharê “Daweta Noko û Niskê”, “Du Legleg Zozan û Gernas” (2019), “Ejderhayê Tirsonek”, “Gurê Kubar” (2021), “Şêrê Bitenê”, “Çûkê Bilûrvan”, “Du Çîrok û Nameyek” (2024) hatin çapkirin (Zêdo, 2024).

Zaroktiya îro û ya do çû carî ne weke hev in. Di vê serdemê de her tişt bi lez û bez diguhere, edebîyat jî ji sînorê xwe yê berê ber bi digitalbûne ve diçe. Lê berhem her çi be “listik” ew ê her bi zarokan re hebe, çi weke dîtbarî çi weke berê bi nivîskî... Mirov nikare “wêjeya buhurî” li ser zarokan ferz bike. Weke mezinên mirov dikare li ser geşedan û bîrbirina zarokan, wan bi berhemên “resen û baldar”e binase ew ê bikêrhatî be (Zêdo, 2024).

Dînamîkên jîyanê, naverok û şêweya edebîyatê diguherîne. Bi taybetî jî edebîyata zarokan jî qadê din bi payeke bêtir vê guherînê dijîn. Ev, jî taybetmendîbûna zarokan tê. Zarok, jî bûyer û guherînên der û dora xwe karakterên bêhtir hesas in. Di demên modern de guherînên di perwerdehiyê, teknolojiyê û civakê de ras û rast li ser jîyanên zarokan bandor kirîye. Ji ber van sedeman, afirandina berhemên zarokan jî divê ku ji van guherînan li ber çavan bigire.

“ ‘What is the use of a book without pictures or conversations?’ Camêr Lewis Carroll vê pirsê 150 sal berê bi ‘Alice’ dide gotin: Pirtûkeke bêyî wêne û diyalogan bi kêrî çi tê?” (Zêdo, 2024). Mijar û bûyerên di edebîyata zarokan de herçiqas balkêş bin jî şêwe û amurên din yên di berhemê de carinan karên giring digirin ser milên xwe. Li gorî temenên xwînerên wêne û herikandina ziman, bala li ser berhemê diguherîne. Nivîsên bi diyalog çalakîya di naveroka berhemê de xurt dike û ev derfetê dide ku zarok bi keyfxweşi nivîsan bixwînin. Zêdo, kistasa nirxa berhemên zarokan bi rexneya zarokan ve gire dide.

Zarok rexnegirên herî bêqusûr in, ew bêyî hesabekê li ser mijarekê an bûyerekê çi hîs bikin wê yekê dibêjin. Loma divê zarok bibêjin ka çiqasî ji wê berhemê hez kirine an na? Çi hîskirine, çawa dîtine, çawa nixandine... Em weke mezinan çi didin wan, ew çi hîs dikin. Xulase ew ê di kurmancî de ew ê kêmtir bin (Zêdo, 2024).

Nêrîna nivîskar, bi çavên zarokan dinêre. Zarok, li hemberî naveroka berheman hest û ramanên xwe bi awayeke bêsansur dikarin ji derveyî re bibêjin. Kesên mezin, divê vê derfetê bidine zarokan da ku xwînerên binirx û rexneyên xurt di qada xwendinê de derkevin. Zarok, ji ber serdema xwe dikarin azad û bêsinor bifikirin. Lewma, dema ku serkeftbûna berhemên edebîyata zarokan bixwaze bê fêmkirin dibe ku krîter zarok bin. Divê ev, di çarçoveya pîvanên edebîyata zarokan de bê nixandin.

2.6. Ayşe Berfin Ögüt û Çîroknivîsiya Wê ya ji bo Zarokan

Çar çîrokên Ayşe Berfin Ögüt⁴, di vê xebatê de tên nirxandin. Ögüt, di çîrokên xwe de nirxên kurmancî yên zimanî bi kar tîne û mijarên mîna xweza, hevaltî, piştgirî, hişmendîya azadîyê, dostanîya ajelan, tenduristî û têkilîyên malbatê dinivîse.

“Ögütê jî di berhemên xwe da cih daye hêmanên folklorîk. Lewma wê him sînore vegotinê fireh kirîye him jî zarok ji folklor û çanda xwe haydar kirine, ev hêman wekî çavkanîyekê bi kar anîye.” (Suvağcı, 2020: 6) Ev rêbaz bo nirxên zimanan bi zarokan re bidin naskirin û di hiş û ramanên wan de cih bigirin tê bikaranîn. Kereste û kevnarên zimanan bi rêya berhemên nivîskî dikarin bên parastin û bigihêjîn nivşên din. Bêje, gotînen gelerî, motîfên zimanî bi saya berhemên nivîskî dikarin bi şeweyên nû bên afirandin. Edebîyata zarokan jî vê hêlê ve di qadake giring de ye. Ögüt, di derheqe çarçoveya naverokên xwe de wisa dibêje:

Di pirtûkên min de mijar û hêma hemû xwezayî ne, mirovahî ne. Ez di çîrokan de hevkarîyê, biratîyê, alîkarîyê, hezkirinê derdixim pêş. Lewra dizanim zarokên di nav şidetê de mezin dibin, heta dawîya emrê xwe nikarin ji travmayan xelas bibin. Ji ber wê ez dixwazim zarok ji hev hez bikin, alîkarîya hev bikin, ji jîngeha lê dijîn hez bikin. Lewra zarok parçeyekî wê jîngehê ne (Ögüt, 2016).

Ögüt, armanca edebîyata xwe bo pêşketina zarokan ji hêla derûnîyê ve bikartîne. Eger bûyer û mijarên naverokê bi pedagojîyeke bi rêkûpêk bên afirandin û ev afirandin bi zimanekî estetîk ve bê girêdan berhem bo zarokan dê guncan bin. Xwînerên piçûk dikarin bi rêya berhemên zarokan ji jîyanê fêhm bikin û alozîyên ku mimkûnê bijîn û saya naverokên serkeftî nas bikin. Ögüt, afarindina naverokên berhemên xwe wiha tîne ziman:

Çîrokên min ne yên berhevkerî ne. Ez bixwe çîrokên xwe diafirînim û dinivîsim. Çavkanî ziman û welatê min e. Xwezaya bajarê min e, Deşta Mûşê ye, Behra Wanê ye û zimanê şêrîn ê dayika min e. Ez li vê derê ji dayika xwe re spas dikim ku min bi vî zimanê şêrîn mezin kir. Û derfet da min ku ez çanda kurdî nas bikim. Bingeha hemû çîrokên min çanda kurdî ye. Zargotina kurdî ye (Ögüt, 2016).

⁴ Nivîskara ku berhemên wê bûne bingeha vê xebatê Berfin Ayşe Ögütê di sala 1993an da li Qizilxaca Mûşê ji dayik bûye. Piştî beşa civaknasîyê li Zanîngeha Bedlîsê beşa Beytarîyê xelas dike. Herî dawî jî li Zanîngeha Munzurê dest bi beşa Îngilîzî û Wergerîyê dike. Ji bilî berhemên zarokan yên wekî Xezal û Qertel, Kewên Gozel, Şinmorika Zînê, Dara Pîroz berhemek bi navê Lehengên ku Çîrokên Xwe Terikandine wergerandîye Kurdî. Mijara berhemê li ser îstîsmarkirina zarokan e. Ögütê her wiha editorîya kovara Barê jî kirîye (Suvağcı, 2020: 2)

Çîrokên ku di vê xebatê de hatin nirxandin bi gotinên Öğüt re di heman rêzê de ne. Nivîskar, mekanên çîrokên xwe ji erdnigarîya kurmancî hîlbijartîye û ji xwîneran re nexşeyeke ziman ava dike. Motîfên zimên di vegotinê de cih digirin. Ev harmonî bo naverokekê bi çandê ve giredayî derdixîne.

“Di berhemên zarokan da nivîskar bi rêya vegotina bûyer û serpêhatîyan dixwaze peyamekê bide zarokan û nirxên exlaqî yên civakê nîşanî wan bide. Em di berhemên Öğütê de jî vê yekê dibînin.” (Suvağcı, 2020: 4). Pirtûkên zarokan herçiqas xwedî veguhêzîyan bin jî dibe peyamên rasterast di naverokên xwe de îhtîwa neke. Peyamên rasterast bo xwînerên di temenên piçûk de mimkûne mîna şîratên bîr fêmkirin û zarok ji xwendinê dûr bikevin. Zarok, peyama naverokê dibe ji bûyerên pirtûkê bixwe derbixin. Armanca çîrokên Öğüt, ji hêla Suvağcı ve wiha tê dîtin:

Öğüt di berhemên xwe da bêtir dixwaze bala xwîneran bikêşe mijara zayenda civakî ji ber vê yekê wê di her berhemeka xwe da cih daye vê mijarê. Di navenda wan berhemên da karakterên jin hene. Lewma ew di bijartina karakterên sereke û alîkar da cih dide jinan. Bi vê yekê wê xwestîye rê li pêşîya newekhevîya zayendî bigire û klîşeyên zayenda civakî berovajî bike. (Suvağcı, 2020: 8)

Pêvajoya nivîsandina berhemên zarokan ji berhemên xwînerên mezinan cuda ye. Armanca, şêwe, vegotin û ziman dibe bi awayeke hişmend bê afirandin. Sedema vê ev ku zarok kesayetên cuda ne û zarokatî qonaxeke krîtîk e. Tema û mijar, dibe bo berjewendîyên zarokan tevbigere. Nivîskar divê armanca xwe bi amurên zimanî û teknîkî baş hûrgilî bike. Ji jêderê tê fêmkirin ku Öğüt, dixwaze di ramanên zarokan de ji hêla zayendê ve erênîyekê çêbike.

3. TESBÎT Û ŞIROVEKIRIN

3.1. Nejla Öztürk û Nirxandina Çîrokên Wê yên ji bo Zarokan

3.1.1. Astronot rodî

Rodî, zarokekî yazdeh salî ku rojnivîska wî heye. Rodî ji Amedê ye. Raman û hestên xwe dinivîse. Qala malbat, mamoste û jîyana xwe ya dibistanê dike. Armanca Rodî ew e ku bibe astronot. Di dibistanê de mamosteyên wî û li malê malbata wî piştgirîyê didine Rodî bo ku ew bibe astronot. Di odeya wî de amûrên asîmanan hene da ku Rodî lêkolînan bike. Mamosteyê wî yê dersa fenê jî alîkarîyê dide Rodî. Rodî, dixwaze here Marsê, bi lingên xwe li ser rûyê Marsê bi meşe. Piştî çend salan Rodî armanca xweyî ku bibe astronot dibe serî û ji NASAyê peyamekê distîne da ku bê serî lê xe û dest pê bike.

3.1.1.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/9 = 11,11$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve bo zarokên di temenê nih-dehan de guncan e. Zarokên di van temenan de dikarin bi awayeke hêsan hevokan bişopînin.

3.1.1.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (0/0) * 100 = 0$

Zimanê çîrokê pir hêsan e û bêjeyên nenasyar yên ku zarok wateya wan nizanibin nînin. Ji ber vê yekê zarokên di temenê şeş salî û jortir de dikarin naverokê baş fêm bikin. Bêjeyên rojane hatine bikaranîn û ev xwendin û fêmkirinê hêsan dike.

3.1.1.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Dirêjbûna hevokan ji bo zarokên di temenê neh-dehan de jî bin ji hêla bêjeyên nenasyar ve çîrok pir sade û herikbar e. Zarokên di temenê şeş salî û jortir de dikarin ji vî zimanê rojane sûd bigirin. Vegotin, bi saya vegêrê yekem û sêyem hatîye afirandin û ev tişt naveroka bûyerê bêhtir derdixe pêş. Di edebîyata zarokan de vegêrê yekem ji bo peyvandina di serê zarokan de jî baştir tê dîtin û fêmkirina naverokê ji hêla zarokan ve zêdetir dike. Ji ber van sedeman çîrok, ji hêla vegotin û ziman guncan e.

3.1.1.4. Rexneya lehengan

Leheng tenê ji zarokekî pêk tê û ev bi rêya rojnivîska xwe hest û ramanên xwe dide xuyakirin. Nivîskar, vî zarokî mîna vegêrekî bi kar tîne. Zarok; hêvî, armanc û planên xwe bi saya nivîsa xwe xwîneran agahdar dike. Leheng, taybetmendiyên zarokên di temenên dibistanê de baş îmaje dike û di hişê xwîneran de kesayetekî ava dike. Herweha, leheng dema ku qala plan û ramanên xwe dike ji bo zarokên xwîner jî dibe mîna keke baş û ji wan re ji bo dahatûyê hêvîyan çêdike. Di dawîya naverokê de leheng, digihêje armanca xwe û ev mînak ji bo zarokan nîşaneyê baş e.

3.1.1.5. Dîyardeyên ku katine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, xwedî ziman û naverokeke hêsan û herikbar e. Çîrokên ku ji her du hêlan ve sererast bin ji hêla xwendekarên piçûk ve dikarin bi awayeke rehet bînin xwendin û fêmkirin. Mîjar ji bo temenên zarokên di temenên şeş salî û jortir de guncan e û dikare bala wan bikişîne. Bi piranî jî berhem ji bo zarokên di temenê piçûk de guncan e. Ji ber ku zarokên di vî temenê de ji naskirina dinya, mirov, asîman û hwd. re bêhtir baldar in û di nava tevgerên wisa de cih digirin.

3.1.1.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Mijara hîlbijartî ji bo zarokan ji hêla baldarî û meraqkirinê ve di cih de ye. Mijarên mîna xweza, asîman, zanist ji bo zarokên di temenê dibistana seretayî de bijartinên baş in. Ziman, bi rêya lehengê ku zarok e tê afirandin û di asta zarokên di temenên piçûk de tê vegotin. Nêrîn û rastîya zarokan di berhemê de baş tê nîşandan û îzafîyeta zarokan jî bi awayeke zelal tê xuyakirin.

3.1.2. Basiko

Basiko, hehecîkekî bi baskekî ye. Ji ber ku baskekî vî nîne nikare ji bilî çend metroyan bêtir bifire. Dema ku zivistan tê, hevalên Basiko difirine herêmên germ û ew bi tenê dimîne. Basiko difikire ku eger çareserîyekê nebîne yê ji serma biqefile. Basiko, li derîyê sê simolekan dide da ku alîkarîyê bidinê. Simolek, bi şertê ku Basiko ji wan re findiq û fistiqa bişkîne dikarin alîkarîyê bidinê. Basiko, ji ber ku nikare vî şertî bîne çih nikare qebûl bike û diçe. Basiko, piştî mala simolekan diçe li

derîyê kîvroşka pîr. Dema ku Basiko dibêje ez bi baskekî me û pêwîstiya min bi alîkarîyê heye kîvroşk bihersokî dibêje ez jî bi destekî me lê min ji tu kesî alîkarî nexwestîyê û ser de ez alîkarîyê didime cîranan jî. Lê kîvroşk, bi şertê ku Basiko alîkarîye bide wê û belengaz nesekîne qebûl dike. Basiko û kîvroşk dibin heval. Di demsala zivistanê de dema ku heheçîk diçine welatên germ, Basiko jî diçe mala kevroşkê û hevaltiya wan berdewam dike.

3.1.2.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji bo xwînerên temenên wan neh salî û jortir de û jortir guncan e. Zarokên ji vî temenî piçûktir mimkûn e ku di şopandinê de zehmetîyê bikişînin.

3.1.2.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[\text{Hejmara Peyvên Nenasyar (a)} / \text{Hejmaran Peyvên Nasyar(b)}] * 100 = (1/99) * 100 = 1,01$

Çîrok, xwedî zimanekî hêsan e. Bêjeyên tîn bikaranîn bêjeyên rojane ne û ji hêla zarokan ve bi awayeke hêsan dikarin bê fêhm kirin. Ev rewş, dîtina peyama naverokê jî bi xwe re tîne û armanca ku berhem dixwaze bigihîjine xwîneran zelal dike. Zarokên di temenê şeş û jortir de dikarin bi tena serê xwe jî naverokê fêhm bikin.

3.1.2.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Vegotin, bi zimanê kesê sêyem tê gotin û bi saya vê xwîner bûyeran bi nihêrînekê berfireh dibînin. Zimanê hêsan di vê pêvajoyê de alîkarîyê dide ku xwînerên di temenê şeş salî û jortir de naverok û peyama çîrokê xweş fêhm bikin. Ziman û vegotin ji bo xwendin û fêmkirinê guncan e.

3.1.2.4. Rexneya lehengan

Çîrok, di cureyê fablê de ye. Ajel, bi rêya axaftin û kesayetkirinê bûne karakter/leheng. Ajel, bi taybetmendiyên mirovan tîn dorpêçkirin û başî û nebaşîyên ku bi mirovan re hene bi rêya ajelan tîn nîşandan. Fêmkirina van rewşên ku bi

mirovan re hene bi saya lehengan û tevgerên wan li ber çavan tèn nîşankirin. Xwîner, bi tena serê xwe dikarin têbigihjin vê rewşê û ji naverokê jêderan derbixin.

3.1.2.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, taybetmendiyên fablê di xwe de dihevwîne û plansazî jî li gorî vê şêwazê ye. Ziman û naverok nêzî hev in. Ji ber vê xwînerên di temenên piçûk de jî bê astengî û alozî dikarin çîrokê bixwînin û jê fêhm bikin. Vegotina bi şêwaza fablê ji bo zarokan bêhtir balkêş e û ev, pêvajoya xwendinê ji bo zarokan mimkûn dike. Carinan ji ber dirêjîna hin hevokan dibe ku hin zarok ji temenên nihan piçûktir belkî şopandina hevokan de astengîyê bikişînin. Di vê rewşê de dibe ku zarok hevokan giran bixwînin.

3.1.2.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok; ji naverok, asta ramanî û ziman ve ji bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e. Mijarên mîna hevaltî, dilşikestin, piştgirî û alîkarî bi rêya lehengên ku ji ajelan pêk tèn tene afirandin û di vê astê de zimanekî –carinan hevokin dirêj hebin jî- herikbar û hêsan alîkarîyê dide pêvajoyê. Nihêrîna zarokan di çîrokê de tê bikaranîn û ev rê vedike ku rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de pêk bê. Zarok, di temenên piçûk de dema ku li rastî alozî û tengasîyan tèn, carinan xwe bêçare dibînin û dikevî nav reşbînîyê. Ev çîrok, bi saya Basiko vê temayê dixê honak û di dawîyê de pîrsgirêkê çareser dike.

3.1.3. Kîşzer xanim

Kîşzer Xanim û hevalên xweyî mirîşkan tevî çîçik di kozika xwe de dijîn. Rovîyê fenbaz mirîşk, dîk û çîçikan dixwe û li ajelên di kozikê de zordarîyê dike. Gav bi gav bi êrîşên rovî, ajel kêmbin. Rojeke Kîşzer Xanim, ji ber vê rewşê hevalên xwe kom dike û plana xwe ji wan re dibêje. Dema ku rovî tê kozikê, hemû ajelên hêkan dişikînin û davêjin ber lingên Rovî. Rovî, di nav hêkan de dişemite û dikeve. Dema ku rovî dikeve, ajel bi nikilên xwe êrîşî Rovî dikin û rovî diêşînin. Rovî, sund dide ku careke din êrîşî kozikê neke û diçe. Kîşzer Xanim û hevalên wê rizgar dibin.

3.1.3.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/9 = 11,11$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji xwînerên di temenê nih-dehan de guncan e. Zarokên di van temenan û temenên mezintir de, dikarin hevokên çîrokê bi awayeke hêsan bişopînin.

3.1.3.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=(2/98)*100=2,04

Çîrok, xwedî zimanekî hêsan e. Bêjeyên ku hatine bikaranîn bêjeyên rojane ne û zarokên di temenên şeş salî û jortir de dikarin van peyvan fêm bikin û bigihêjin peyama çîrokê.

3.1.3.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok, bi şeweya fablê hatiye hûnandin. Ajel (mirîşk, dîk û rovî) dipeyivin û kesayetên wan tên afirandin. Vegotin, di vê çarçoveyê de bi zimanekî herikbar û zelal tê sazîkirin. Herweha, berhem xwedî zimanekî îronîk e û ev jî balkişandî û hezîkirina zarokan li ser çîrokê zêde dike.

3.1.3.4. Rexneya lehengan

Leheng, bi tevahî ji ajelan pêk tên. Li hêlekê rovîyên bi imajeke xerab tê nîşandan li hêla din mirîşk û dîkên bindest ku bi imajeke baş hatine afirandin hene. Naverok ji dijberî û pevçûna van herdu alîyan pêk tê. Hêvî û çalakîyên alîyên bindest ji bo edebîyata zarokan mînakê di cih de nîşan dide. Asta tundbûna lehengên li hemberî hev, ji bo tundbûna naveroka qada zarokan guncan e.

3.1.3.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, ji hêla ziman, vegotin û naverokê ve ji bo edebîyata zarokan guncan e. Nivîskar mijara pevçûnê bi awayeke nerm anîye ziman û çareserî bi awayeke piştgirî û diyalogê rave kirîye. Ev rewş, li gor nihêrîna zarokan divê ku di çareserîya pîrsîrêkan de rêyekê şanî wan bike. Zarok, ji naverokan dibe ku hin jêdarînan

derbixin. Temayên mîna piştgirî, hevaltî û alîkarîya civakê di çîrokê de tîbî bikaranîn. Mîmkûn e ku zarok, ji honakê van alîyan bigire û di demên alozîyê de bikarbînin.

3.1.3.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji alozîya di navbera ajelan de pêk tê. Ev mijar di edebîyata devkî û herweha di ya nivîskî de jî pir tê bikaranîn. Di ve çîrokê de ev şeweya çîrvanokan tê hûnandin. Ziman, ji bo xwînerên piçûk pir hêsan hatiye nexşandin. Peyama çîrokê ji zarokan re eşkere ye û piştgirî û hevaltîyê bilind dike. Vegotin û zimanê ku hatiye bikaranîn ji nişandana naverokê re pir guncan e. Xwînerên piçûk bi saya vegotin û nihêrîna ku di çîrokê de tê bikaranîn dikarin peyama çîrokê fêm bikin û di mînakên jîyanê de hevparîyê bibînin.

3.1.4. Marê piçûk

Dêmar û çêlîka xweyî piçûk ji hêlîna xwe derketi bûn. Dêmar, çêlîka xwe hînî şert û mercên jîyanê dîkir. Kes û tiştên baş û xerab nîşan dida û dixwest çêlîka wê ji xwe hayedar be. Dema ku dêmar û çêlîk li derve bûn, nêzî wan zarokan hebûn. Dêmar, dibêje ku xwe nêzî mîrovan neke. Piştî demeke dêmar, li ber tîrêjên rojên dikeve xeweke giran de. Marê Piçûk, piştî ku dîya wî diraze xwe nêzîkî zarokan dike. Hin zarokan ji wan Marê Piçûk dibînin u dirajine kevîran da êrîşî mar bikin. Di nav zarokan de zarokê bi navê Rodî wan disekinîne. Herçiqas zarok, dibêjî ku dibe mar bê kuştin jî, Rodî wan ji bo xweza û maran agahdar û hişmend dike. Dema ku Rodî zarokan disekinîne, marê piçûk jî ji wan dûr dikeve û diçe cem dîya xwe. Dîya wê ji xew rabû ye û bi çêlîka xwe re diçe hêlîna xwe. Çêlîk, şaşîtiya xwe fêm dike û çîrok bi dawî dibe.

3.1.4.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Çîrok, li gorî vê pîvanê ji bo xwînerên di temenê heş-nihan de guncan e. Xwîner di van temenan de jî hêla dirêjahîya hevokan ve bê pîrsgirêk dikarin çîrokê bixwînin.

3.1.4.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)]*100 = (3/97)*100 = 3,09$

Bêjeyên nenasyar di çîrokê de hindik in û ev rewş ji bo fêmkirina naverokê û xwendineke herikbar guncan e. Xwînerên di temenê şeş salî û jortir de jî dikarin ji naverokê bi hêsanî fêm bikin û peyama çîrokê bibînin.

3.1.4.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Zimanê çîrokê ji bo xwînerên di temenê piçûk de guncan e. Bêjeyên sade, hevokên herikbar û vegotina li gor nihêrîna zarokan derfetê dide ku xwîner bala xwe bidin naverok û nivîsê. Lehengên çîrokê li gorî asta xwe ya temenî û civakî hatine pêyvandin. Ev tevger fêmkirina naverokê hêsan dike. Lehengên ku bi piranî ji zarokan pêk tên û li gorî asta temenê xwe tên peyvandin, têkilîya çîrok û dijarbûna çîrokê bêhtir bi hev girêdide.

3.1.4.4. Rexneya lehangen

Leheng ji ajal (mar) û zarokan pêk tên. Dijberîya van aliyan, tevgera naverokê saz dike û herikbarîyê bi xwe re bilind dike. Zarok, di navbera xwe de dibin du alî û hêla başî û nebaşîyê çêdikin. Carinan zarok, mîna kesên mezin şîretan li zarokên din dikin û çîrokê derdixin asta nivîsareke şîretkar. Leheng, divê bi vê armancê neyên bikaranîn. Honak, divê vî karî bi awayeke veşartî pêk bîne. Lehengên şîretkar, ji ber vê sedemê ji terefê xwîneran mimkûn e ku neyên hezkirin.

3.1.4.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, ji hêla ziman û vegotinê ve hêsan, herikbar û li gorî xwînerên piçûk guncan e. Ev amûrên pêwîst, di asta zarokan de hatine hûnandin û ji xwînerên piçûk re astengîyên fêmkirinê dernaxin. Lê carinan nivîskar, bi saya lehangen xwe vediguhêze şîretkarîyê. Mijara ku kesên zîrarê didin xwezayê bi rêya hin zarokên li hemberî zarokên din bi rêya şîretan tê afirandin. Ev rewş, mimkûn e ku ji hin xwîneran ve mîna kesekî tilî hejandin bê dîtin.

3.1.4.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Kesayeta zarokan bi keşfê û baldarîyê pêşve diçe. Zarok; bûyeran dibînin, wan dijîn û ji wana jêderan derdixin. Dema ku ev pêvajoyan ji hêla hinekan ve bê qutkirin zarok, ji van tiştan dûr dikevin. Çîrok ji vê hêlê ve hinekî dûrî rastî û îzafiyeta zarokan e û şîretkar e. Çîrok, dixwaze zarokan ji hêla xweza û hin ajelan ve haydar bike lê vê tevgerê bi rêya şîretan dike. Ev ne rêyeke rast e. Herçiqas çîrok ji naverokê ve xwedî çend pîrsgirêkan be jî ji hêla ziman, vegotin û bêjeyan ve guncan e.

3.1.5. Serfirazîya qafreş

Qafreş û Bigir, du kûçikên li ber derîyê Silêman in. Silêman, mirovekî baş e û van herdu kuçikan tî û birçî nahêle. Silêman, dibîne ku Qafreş roj bi roj jar dibe û li gel vê Bigir qelew û geş dibe. Di serî de Silêman vê bi kembûna xwarîna ve gire dide. Xwarina wan zêde dike lê demek diçe rewş nayê guhartin. Silêman Qafreş dibe beytar. Beytar dibêje ku Qafreş ji birçibûnê di vê rewşê de ye. Silêman matmayî dimîne lê tê malê û dixwaze sebeba vî tiştî fêhm bike. Dibîne ku Bigir, xwarina Qafreş jî dixwe û Qafreş bertekê nade. Silêman, Qafreş bi tundayî rexne dike û dibêje tu çima li mafê xwe napirse. Qafreş difikire ku Silêman mafdar e û ji wê gavê pê ve bertekê dide Bigir. Piştî wê rojê, Qafreş roj bi roj qelew û geş dibe.

3.1.5.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/14 = 7,14$

Çîrok, ji hêla hevokan ve ji bo zarokên di temenên heft-heştan de guncan e. Ev ast, hemû xwîneran di hewînê û ji bo edebîyata zarokan asteke îdeal e.

3.1.5.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (1/99) * 100 = 1,01$

Çîrok, ji hêla bêjeyan ve xwedî asteke di cih de ye. Bêjeyên nenasyar pir hindik in û ev ji xwendineke hêsan û fêmdar re rê vedike. Çîrok, bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e.

3.1.5.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Ziman û vegotin hêsan, herikbar û xwedî hevokên kurt e. Ji bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e. Vegotin, bi saya vegêrê yekem û sêyem tê saz kirin û ev ji bo -piranî vegêrê yekem- zarok û dengên serê zarokan baş e. Zarok, bêpirsgirêk dikarin ji naverok û peyama çîrokê fêhm bikin.

3.1.5.4. Rexneya lehengan

Leheng, ji du kuçik û zilamekî pêk tên. Pirsgirêka wêrektî û liberxwedanîyê li gel van du kuçikan tê hûnandin û bi alîkarîya zilamê tê çareserkirin. Bêguman ev pirsgirêk di navbera kesan -bi piranî di nav zarokan de- de jî heye û nivîskar wê rewşê bi rêya honakê dixwaze bide nîşandan. Her sê leheng, xwedî hêleke taybet in û rola xwe pêk tînin. Honak, bi piranî serkeftî jî be, lehengê zilamê carinan rola şîretkar digire ser milên xwe û şîretan rêz dike. Bêguman, ev rêbaz divê di çîrokên zarokan divê pir kêmbin.

3.1.5.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Lehengên çîrokê ji du seyan û zilamekî pêk tên. Mijar bi rêya van sê lehengan tê hûnandin û pirsgirêka wêrektî û lixweberdanîyê tîne hole. Hilbijartina mijarê di cih de ye. Xwînerên -bi piranî zarok- ku xwedî wê pirsgirêkê ne dikarin li ser wê bifikirin û çareserîyê ji xwe re bibînin. Pirsgirêk bi saya lehengê zilamê tê çareserkirin û mimkûn e ku ev çareserî ji bo zarokan bibe mînak. Li gel van alîyên serkeftî di çîrokê de alîyekî şîretkar jî heye û ev ji bo hin xwîner û rewşan sûdê nade. Ji ber wê divê di naverokê de mînakên wisa tune bin û çareserî bi honakên xurt û bi rêya mînakên honakî bên saz kirin.

3.1.5.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji hêla mijarê ve mijareke giring ji xwe re hilbijartîye: Tirs, maf, wêrektî û liberxwedan... Ev mijar, di temenên piçûk de pirsgirêk e ku zarok bi wê rûbirû dimînin. Ji zarokên xwedî van pirsgirêkan re ev mijar divê bibin mînakên di cih de. Ji wê hêlê ve mijar serkeftî ye û ziman û vegotin baş hatîye hûnandin. Li gel van erênîyan, nivîskar carinan dixwaze çareserîyê bi şîretan pêk bîne. Çîrok bi giştî ji bo

rastî û îzafîyeta zarokan guncan be jî ji ber vê şîretkarîyê wêrebûna Qafreş di bin siha zîlam de dimîne.

3.1.6. Şingeşing

Li dikanekê firaxên xwarinê hene. Kevçî, kêr û çetel di taximê xwarinê de ne. Zozan Xanim, wan firaxan dikire. Firax, bi kêf û xweşîyê şingeşing dîkin ji bo ku hatin kirin. Zozan Xanim, ji bo demeke dirêj van firaxan bikar tîne û ev li xweşîya firaxan diçe. Lê rojek tê ku êdî firax kevin dibin û Zozan Xanim wan teva dixe bodrûma malê. Di bodrumê de firaxên din jî hene. Hemû firax gazinên xwe tînin ziman û qala zamanên xweyî berê dîkin. Hemû aciz dibin û dixwazin ji vê reşahî û tenebûnê rizgar bibin. Alîkarîyê ji mişka dixwazin da ku şingeşingê bikin û malîyan aciz bikin. Zozan Xanim şingeşingê dibihîze. Ji cîrana xwe fikir dixwaze û cîrana wê dibêje ku dikare wan firaxan bide şaredarîyê da ku şaredarî firaxan tamîr bike û firaxan bide kesên hewcedar. Zozan Xanim, wisa dike û rojeke firaxan dibe şaredarîyê. Şaredarî, firaxan tamîr dike û wan dide kesên hewcedar. Firax pir kêfxweş û dilgeş dibin.

3.1.6.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/8 = 12,5$

Çîrok, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo xwînerên di temenên deh-yazdehan de guncan e. Zarokên ku ji van temenan piçûktir bin minkûn e di şopandina hevokan de pîrsgirêkan bijîn.

3.1.6.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (7/93) * 100 = 7,52$

Ji hêla hejmara bêjeyên nenasyar ve çîrok ji bo xwînerên di temenên çar deh-şaz dehan de guncan e. Xwînerên ku ji bingeha ziman ve hê nehatibin asteke xurt pêkan e ku ji hin bêjeyan fêr nekin û negihêjin mebesta naverok e.

3.1.6.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Zimanê çîrokê ji bo xwînerên li ser temenê 12-13an re guncan e. Zarokên di van temenan de dikarin bi awayeke herikbar û bi pêvajoyeke hêsan çîrokê bixwînin. Zimanê çîrokê zimanekî îronîk e. Di edebîyata zarokan de zimanê ku bi vê şeweyê tîbîkaran ji hêla xwîneran ve bal û hezkirineke zêde dibînin. Çîrok, xwedî van taybetmendîyan e û ev rêbaz serkeftî tê bikaranîn. Herçiqas çîrok, ji hêla bêje û hevokan ve ji xwînerên hinekî mezin re guncan be jî xwînerên ku di xwendinê de xwedî asteke baş bin, dikarin bi hêsanî ji naverokê fêhm bikin û jê sûd bigirin.

3.1.6.4. Rexneya lehengan

Leheng ji mirov, ajel û firaxên malê pêk tînin. Têkiliya di nav van her sê alîyan de bi awayeke serkeftî hatîye afirandin. Pêvajoya ku çîrok tê honakkirin, di navbera pîrsgirêk û çareserîyê de ye. Leheng vê prosesa ku bi çalakî derbas dibe bi awayeke herikbar û baldar dimeşînin. Îmaja mirov-ajel-firaxan bi naverokê re hevpar e û ev nirx û heza çîrokê zêde dike.

3.1.6.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Di edebîyata zarokan de hewcedarî bi tevger û lebatê heye. Dema ku ev di naverokê de hebin, xwîner bêhtir bala xwe didin berhemê û pêvajoya xwendinê kêrhatîtir dibe. Ji bilî vê xwîner bi naverokên afirîner re raman û hestên nû nas dikin û van ji bo jîyana xwe dikarin bikarbin û pîrsgirêkên xwe çareser bikin. Çîrok, bi tevahî ji bo edebîyata zarokan guncan e.

3.1.6.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Xwînerên di temenên piçûk de bala xwe bêhtir didin naverokên ku tevger di wan de hene. Herweha vegotineke îronîk vê hêla balkêşane xurttir dike. Nêzîkatîya zarokên temenpiçûk li ser tiştên balkêş û zimanekî îronîk e. Çîrok, ji vê hêlê ve bi pêwîstîyên zarokan re nêzîkatîyê saz dikin û vegotin jî li gorî îzafîyet û rastîya zarokan e. Zimanê herikbar û naveroka ku pîrsgirêkan bi awayeke dîyalogê saz dike ji bo zarokan guncan e.

3.1.7. Welatê kûlîlkan

Welatekî bi navê Welatê Kûlîlkan hebû. Li vî welatî, şeş mihan bihar şeş mihan jî havîn bû. Welat, tevî kûlîlk û şinahîyên xwe pir xweş bû. Kesên li wî welatî di nav kêfxweşîyê de dijîn û ji jîyana bi aramî derbas dibû. Rojeke kesek tê Welatê Kûlîlkan û dibîne û wêneyên welêt li cihanê belav dike. Kesên ku wî wêneyî dibînin hin bi hin koçî Welatê Kûlîlkan dîkin û dest li ser kûlîlk û axa welêt dîkin. Kûlîlkan difiroşin û pera ji vî karî qezenç dîkin. Hinek welatî ji axa xwe koç dîkin hin jî dimênin. Xweşîya welêt kêr dibe û aramî û kêf ji nava gel diçe. Kesên ku dest li ser axa deynabûn fêr dîkin ku sûda Welatê Kûlîlkan nemaye ew jî ji welêt diçin. Piştî ku ev kes çûn welat roj bi roj divegere rewşa xweyî berê. Welatên Kûlîlkan rizgar dibe.

3.1.7.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok, ji hêla hevokan ve ji bo xwînerên di temenê 9an û mezintir re guncan e. Xwînerên di temenê 9an de dikarin van hevokan bi hêsan bişopînin.

3.1.7.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (4/96) * 100 = 4,16$

Ev nûve bo hemû komên xwînerên di temenê şeş salî û jortir de guncan e. Bêjeyên di çîrokê de yê hêsan in û ev rewş, fêmkirina çîrokê ji bo xwînerên piçûk guncan dike.

3.1.7.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Carinan di hin hevokan de hejmara peyvan pir gelek in û ev rewş dibe ku ji bo xwînerên piçûk pirsgerêkan derbixe. Ji bilî vê rewşê, hevokên din ji bo xwînerên zarok guncan e. Vegotin bi giştî ji tasvîrkirinê û bûyerên kêmtewger pêk tê. Ji ber vê yekê vegotin di gelek cihan de pasîf e. Vegotineke wisa ji bo xwînerên piçûk dûrî balkêşan û xwendineke dilxwaz e.

3.1.7.4. Rexneya lehengan

Leheng ji du alîyên ku li dijî hev in pêk tên. Alîyek jê ew kesên niştecih in ku ji ax û welatê xwe hez dikin. Alîyê din jî kesên ku vê axê ji niştecihan bi zorê distînin. Kesên dagirker, axê ji xwedîyên wan distînin û vê tevgera xwe dibin serî. Çîrok, ji hêla lehengan ve tevgereke ava dike. Lê mixabin ev dijberî ku divê tevgereke ji naverokê derbixe naçe serî û tevgereke ku bala xwînerên piçûk bikişîne nayê saz kirin.

3.1.7.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok ji hêla ziman ve bi piranî guncan e û ji bo xwînerên di temenên piçûk de jî bi hêsanî dikare bê xwendin. Vegotin carinan bi rêya teswîran tê hûnandin û teswîr, di edebîyata zarokan divê zêde neyê bikaranîn. Vegotineke bi piranî ku jî teswîran pêk bê, bala zarokên di temenê piçûk de zêde nakişîne û ev tişt xwendina çîrokên di vê şewazê de kêmtir dike. Herweha zarokan ji xwendinê dûr dixê. Wekî din, çîrok ji hêla naverokê ve jî zêde tevgeran nahewîne û ev jî ji bo balkişandîneke di cih de kêmasîyek e.

3.1.7.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Di rastî û îzafiyeta zarokên di temenên piçûk de bi piranî tevger û çalakî hene. Zarokên di van temenan de heger ku helwesta xwendinê ji xwe re girtibin, hez ji pirtûkên ku xwedî naverokên bi diyalog, tevger, çûn û hatin û aksiyone dikin. Dema ku em bi vê niherînê li berhemê binihêrin em dikarin bibêjin ku çîrok, ji van tiştan dûr e û naverok bi piranî ji teswîrê pêk tê û leheng xwedî helwestên pasîf in. Zarok, di temenên piçûk de dema ku dest bi xwendinê dikin; divê çîrokên bi tevger, zimanên herikbar û naverokên xwedî bûyer bîn pêşberî wan ku hezkirin û sûdê ji xwendinê bigirin.

3.1.8. Xalxaloka xeydok

Xalxaloka bi navê Sorik, xalxalokakê rind û şêrîn e lê tebîete wê xeydokîyê. Di nav malbat û hevalên herciqas çêlîkeke baş ji be ji ber vî tebîeta xwe carinan kesên dora xwe aciz dike û wan ji xwe sar dike. Di listikan de bi hevalên xwe re

pirsgirêkan dijî û aloziyên derdixe. Di nav malbatê de ji ev alîyan wê malîyan jî bêçarê dihêle. Rojeke Sorik, xewneke dibîne. Di xewnê malbata Sorikê tewlî Sorikê dixwazin biçine betlana sersalê lê Sorik disa dibêje na. Dê û bavê wê ji dibêje ku tu newê em bi tena serê biçin û diçin. Sorik li malê di mene lê poşman dibe. Piştî demeke ew ji dide ser rê ji bo here cem dê û bavê xwe. Di rê de pîrhevokek li rasta wê te û dibêje ez dê te bixwim. Sorik dike hawar û ji xew radibe. Dê û bavê wê têne ber serê wê. Sorik xewna xwe ji wan re dibêje. Dê û bavê wê, wê hembez dikin. Ji wê rojê pê ve dew ji vê tebîetî diberde û dibe zarokeke cir xweş.

3.1.8.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji bo xwînerên di temenê heşt-nihan de guncan e. Piraniya xwînerên di van temenan de dikarin vê çîrokê ji hêla hevokan ve bi rehetî bixwînin.

3.1.8.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[\text{Hejmara Peyvên Nenasyar (a)} / \text{Hejmaran Peyvên Nasyar(b)}] * 100 = (3/97) * 100 = 3,09$

Hejmara bêjeyên nenasyar ji bo zarokên di temenên şeş salî û jortir de guncan e. Çîrok, xwedî zimanekî hêsan û rojane ye. Hindikbûna peyvên nenasyar ji bo xwîneran pêşîya xwendina herikbar vedike.

3.1.8.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Lehengên çîrokê hemû ji ajelan pêk tên. Bi rêya peyivandin û kesayetkirinê ji ajelan karakter hatine afirandin. Vegotin bi saya vegêrê sêyem tê hûnandin û çîrok bi awayeke serkeftî tê nîşandan. Ziman, zimanekî herikbar e û xwedî taybetmendiyên zimanê zarokan e. Hevokên kin û kurt, wateya zelal û vegotina li gor nihêrîna zarokan serkeftîbûna ziman dide xuya kirin.

3.1.8.4. Rexneya lehengan

Çîrok, bi cureya fablê hatîye nivîsandin. Leheng, mîna mirovan tîn afirandin û xwedî hez û hestên mirovan in. Ji ber vê xwîner dikarin bi hêsanî bi saya van lehengan îmaja mirovbûnê di serê xwe de biafirînin. Ji ber ku ziman û leheng carinan xwedî hêleke îronîk in mimkûn e ku xwînerên di temenên piçûk de ji vê rêbazê hez bikin.

3.1.8.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, li ser pîrsgirêka têkilîyên zarokên bi der û dorê re disekine. Carinan, tevger û ramanên zarokan ji bo adaptasyona jîyanê xwedî hin alozîyan nin. Ev rewş, bi têkilî û danûstandinên bi kesên din re tê çareserkirin. Di vê çîrokê de jî ev rewş bi awayeke zelal tê afirandin û zarok, bi rêya têkilîyên der û dorê re pîrsgirêkên xwe çareser dikin. Ev hêla çîrokê bi nirx û serkeftî ye.

3.1.8.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, him ji hêla ziman û vegotin him jî ji hêla naverok û afirandina honakê ve ji bo edebîyata zarokan guncan e. Ziman hêsan û herikbar e û herweha vegotin bi nêrîna zarokan hatîye afirandin. Mijar -têkilîyan bi civakê re- bi awayeke zelal tê nîşankirin. Di vir de nivîskar ev hêl bi saya honakê ve saz kirîye û xwe ji naverokê ve bêalî hiştîye. Ev alozî di jîyana zarokan de pir tê xuyakirin û nivîskar ev baş anîye ziman. Lehengên ku ji ajelan pêk tînin, di nava civakeke de tînin afirandin û ev civak mîna civaka mirovan e. Ev rewş, mimkûn e ku bala xwîneran bêtir bikişîne û pêvajoya xwendinê xurttir bike. Dema ku çîrok diherike pergala ziman û rêya ramanê zarokan te de xuya dike. Çîrok bi giştî ji bo edebîyata zarokan guncan e.

3.1.9. Kesper

Kesper, pisîkeke piçûk, pirç zer û şêrîn e. Wê salê pir berf hat. Der û dor di bin berfê de man. Mirov û piranîyan ajêlên xwe ji berfê rizgar kirin û xwe sipartine stargehekê. Kesper bi tena serê xwe li derve ma. Xwest xwe bigihêjîne starekê lê mixabin kesî ew negirte mala xwe. Kesper, bi xîreteke dawî li xwe da û bi pirça xweyî qeşa girtî nûz nûz dikiş. Jinekê ji malekê dengê Kesper kir û ew bire mala

xwe. Malîyan bi çend alîyan ve Kesper germ û têr kirin û ew xistin endameke malbat e. Kesper rizgar û kêfxweş bû.

3.1.9.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên di temenên nih salî û jortir de re guncan e.

3.1.9.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (2/98) * 100 = 2,04$

Bêjeyên ku di çîrokê de hatine bikaranîn ji bo zarokên di temenên şeş salî û jortir de guncan in. Bêjeyên hêsan hatine bikaranîn û ev bo zarokan xwendineke sade afirandîye.

3.1.9.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Ziman, ji hêla bêjeyên hêsan ku hatine bikaranîn ve guncan e. Herçiqas carinan hevokên dirêj hebin jî bi giştî ji bo zarokan çîrok xwedî zimanekî serkeftî û herikbar e.

3.1.9.4. Rexneya lehengan

Lehenga sereke pisîk e. Bûyer li der û dora vê pisîkê diqewimin û navend ev bixwe ye. Leheng, bi rengê çalak û têkoşer tê teswîrkirin. Ev alîyê leheng, ji bo derûniya zarokan baş e û dibe ku ji wan re bibe mînak.

3.1.9.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok ji naverok û bikaranîna ziman ve ji zarokên di temenên piçûk re hatiye nivîsandin. Mijar li ser têkilîya ajal û mirovan e. Alîkarî, hevaltî, ked û çalakkûn weke mijar di çîrokê de hatine bikaranîn. Ev mijar, ji zarokên temen piçûk û yê ku hin bi hin civakê nasdikin re guncan in. Bi saya vê çîrokê zarok dikarin hestên di derbarê ajelan de baş bibînin.

3.1.9.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji hêla ziman ve herikbar û hêsan e. Mîrov dikare bêje ku çîrok bi piranî ji bo zarokên di temenên piçûk de hatîye nivîsandin. Divê ku armanc di hişê zarokan de hezkirina xwezayê û ajelan ava bike. Lehengê ku pisîkeke bêxwedî ye ji bo ku xwe biparêze xwe nêzî mirovan dike û digihêje armanca xwe. Çîrok ji bo derûniya zarokan dikare hişmendîyekê bide wan. Nêrîneke erênî di çîrokê de heye û zarokên xwîner dikarin ji vê sûd bigirin. Têkilîya mirov-ajel û ajel-zarok bi rêya vê çîrokê mimkûn e ku ji hêla zarokan ve bi awayeke xuyayî bê fêmkirin.

3.1.10. Paşayê qelew

Zemanekî paşayekî ji xwe qayîl û nefsmezin hebû. Ev paşa, ji ber van tebîetên xwe tu kes nedieciband û nedizewicî. Paşa, ji ber ku hemû kar û barên xweyî rojana bi xulamên xwe dikir, roj bi roj qelew dibû. Xulaman xwarina paşa bi destên xwe didanê û dema ku paşa dixwest bimeşe jî ew li ser textê ji ew digelandin. Piştî demeke paşa hingî qelew bû nexweş ket. Ferman da ku bijîşkên welêt li xwe kom bikin û çareyekê jê re bibînin. Bijîşkan dît ku paşa ji ber bêtêvgerîyê qelew dibe û ji bilî vê dilê wî jî ne baş e. Bijîşkan şîretên xwe lê kirin. Paşa, dît ku çareyek ji bilî vê nîne qebûl dike û dest bi bazdan û têvgerê dike. Paşa di dawîyê de baş dibe. Ne tenê ji qelewbûnê ji nefsmezinbûna xwe jî azad dibe. Bi qîzekê re dizewicê û dilxweş dibe.

3.1.10.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/9 = 11,11$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji xwînerên nih-deh salî û mezintir re guncan e.

3.1.10.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (2/98) * 100 = 2,04$

Di çîrokê de bêjeyên nenasyar hindik in û ji ber vê yekê çîrok ji bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e.

3.1.10.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Zimanê çîrokê zimanekî rojane û sivik e. Ji hêla bêjeyan ve hêsan e û xwînerên di hemû temenên şeş salî û jortir de dikarin jê fêhm bikin. Carinan gotînen çandi jî ten bikaranîn û ev zimanê çîrokê ji hêla kurdî ve binirx dike.

3.1.10.4. Rexneya lehengan

Lehengên sereke paşayekî nefsmezin e û bi çavekî mezin li xwe dinihêre. Çîrok, li der û dora wî tê hûnandin. Ev paşa, di honaka çîrokê de gav bi gav tê guhertin û bala xwîneran dikişîne ser xwe. Di vê guhertinê de xwîner dikarin ji naveroke sûd bigirin, ji hêla tendirustî û derûnî ve jêderan derbixin û di jîyana xwe de van bikar bînin.

3.1.10.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, piralî ye. Carinan taybetmendiyên çîrvanokan heye carinan jî rojanê ye. Sînorên van herdu cureyan bi awayeke serkeftî tê honakkirin. Mijar balkêş e û ev balkeşbûn xwîner bi xwe re dimeşîne. Ev taybetmendîya çîrokê ji bilî xwînerên zarok, xwînerên temenên wan mezin jî dikare bikişîne ser xwendinê.

3.1.10.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok him ji hêla ziman him jî ji hêla naverokê ve li gorî rastî û îzafiyeta zarokan durist e. Zimanekî herikbar û hêsan bi mijareke balkeş re hatîye hûnandin û ev jî ji xwîneran re dikare şopandîneke serkeftî saz bike. Xwînerên zarok, ji vê naveroka zelal dikarin jêderên binirx derbixin û wan di jîyana xwe de bînin cih. Ji hêla ziman û bêjeyên ku hatine bikaranîn ve çîrok xwedî asteke serkeftîye. Herweha îronîya ku carinan hatîye bikaranîn jî ji bo naverokê alîyekî din ye binirx e.

3.1.11. Pirtika berfê

Saleke ku berf zêde dibarî du qîzên bi navê Bejna û Mînayê pirtikik ji berfê çekirin. Pirtika berfê pir xweşik û şêrîn bû. Qizikan piştî ku pirtikan xwe qedandin

çûn malên xwe. Dema ku ew çûn, pirtika berfê bi can bû. Li xwe nerî û xwe gelekî aciband. Kesên ku pirtik didîtin jî ew diacibandin û pesnê wê didan. Mihên zivistanê pirtika berfê jîyana xwe bi xweşî û bi pesîndanên der û dorê derbas kir. Herçiqas kesên dora pirtikê pesnê wê didan jî pirtik gelekî dilnêrm û dilgerm bû. Dema ku zivistan ber bi biharê ve diçû hewa hin bi hin germ dibû. Pirtik, ji ber germê dest bi helandinê kir. Pir xemgîn bû û digirîya. Rojeke tavê bang le kir da ku negirî. Tavê got, netirse. Tu yê bihelî bibî av û herikî nav mêrg û zevîyan, çem û derya yan. Tu yê bibe ruhê gul û kulîlkan. Saleke din zarok disa yê te çê bikin. Piştî pêyvên tavê dilê pirtikê rehet bû. Rojên biharê dest pê kirin. Bejna û Mîna hatin çîhe pirtikê û dîtin ku tiştên pirtikên li wir in. Tişt bi teva dan hev û paqij kirin û hilandin da ku salake din dîsa pirtikê çê bikin.

3.1.11.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Di hin hevokan de herçiqas hevokên dirêj hebin jî bi giştî dirêjahîya hevokan ji bo zarokên 8-9 salî û mezintir re guncan e. Ev rêje ji bo piraniya xwînerên zarok guncan e ku naverokê bi awayeke hêsan bişopînin.

3.1.11.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)] * 100 = (2/98) * 2,04$

Ev hejmara bêjeyên nenasyar bo zarokên di temenê şeş salî û jortir de guncan in. Zarok, bi awayeke herikbar dê karibin ji naverokê fêhm bikin û xwendineke serkeftî bikin.

3.1.11.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Di çîrokên zarokan de dirêjbûna hevokan divê xwedî dîsîplîneke be û ev dîsîplîn di hemû hevokan de bê sazîkirin. Di vê çîrokê de carinan ev taybetmendî nayê cih û hin hevokên dirêj tînin hûnandin. Li gel vê zimanê çîrokê pir zelal û herikbar e. Zarok, bi saya bêjeyên hêsan û zimanê sade dikarin bi rehetî ji naverokê fêhm bikin û ji xwendina sîd bigirin.

3.1.11.4. Rexneya lehengan

Lehengên çîrokê bi honakeke serkeftî hatina sazkirin û leheng di peyama çîrokê de xwedî rewşeke êrênî de ne. Di çîrokê de nihêrîna ji hêla lehengan bi awayeke zelal tê nîşandan. Leheng, bi mijarê xwe serkeftî tîna hûnandin.

3.1.11.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok bi rêya pirtikeke berfê mijara mirin –herçiqas ev di çîrokê de veşartî be jî- û windabûnê tîna ziman. Ev mijar bi giştî ji bo zarokên di temenên piçûk de xwedî aloziyeke ye. Lê nivîskar ev tişt bi rêya alegoriyeke ava kirîye û di hişê zarokan de mijar weke tiştekî xwezayî daye xuyakirin. Zarok, mirin, jinûvebûn, veqetandin û hevkarîya bi hevalan re mijarên çîrokê ne û ev mijar; ji bo pêşveçûna derûnîya zarokan giring in.

3.1.11.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji hêla ziman û naverokê ve ji bo rastî û îzafiyeta zarokan guncan e. Nihêrîna nivîskar ya di vegotinê de bi nihêrîna zarokatîyê hatîye hûnandin û çîrok tevî leheng, ziman û naverokê bi awayeke serkeftî hatîye afirandin. Domandina mijarê bi pêşveçûna çîrokê berdewam dike û ev rewş qedrê çîrokê ya derûnî zêde dike. Zarok, herçiqas pirtika berfê bihêle jî nakevine xemgînî û ne reşbînî ye. Ev helwesta ku nivîskar afirandîye bêguman ji bo xwîneran -bi piranî yê zarok- dê hest û ramanên erênî dikarin çê bikin.

3.1.12. Berxnaz

Berxnaz, berxeke piçûk e û piştî ku pazdeh rojî dibe dêya wê, wê dibe dibistanê. Li dibistane perwerde pazdeh rojan berdewam dike û roja dawî mamoste dibêje ku ew e di Newrozê de pêşbirkan û şahîyan çê bikin. Dema ku mamoste wan tiştan dibêje Berxnaz dikeve mitalan de. Ji ber ku Berxnaz, berxeke şermok e. Berxnaz, di nav derdê vê de diçe malê. Şîrê dêya xwe navexwe. Dîya wê mitalan dike û Berxnazê dibe bijîşk. Bijîşk nexweşîyan li Berxnaz nabîne û ji dêya wê re dibêje ku here ji mamoste bipirse. Mamoste, tiştên ku di polê de ji zarokan re gotibûn ji dê re jî gotin. Dê fêma kir ku Berxnaz ji ber mitalêyan di vê rewşê de ye. Wê ji bo

pêşbirk û şahîyan dilrehet dike û biryar didin ku di pêşbirkan de ew û Berxnaz herin ser dikê û dîlokan bêjin. Li ser dîkê Berxnaz û dêya xwe di pêşbirkê de dibin yekemîn û Berxnaz pir kêfxweş dibe.

3.1.12.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên temenê wan nihan û mezintir re guncan e.

3.1.12.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=
 $(1/99)*100=1,01$

Di çîrokê de bêjeyên ku ji bo zarokan zehmetîyê derbixin nîn in, bêjeyên hêsan hatine bikaranîn. Ev rewş dide xuyakirin ku zimanê berhemê ji bo xwînerên temenê şeş salî û jortir de guncan e.

3.1.12.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Zimanê çîrokê zimanekî hêsan û herikbar e. Hevok di asta ku zarokên di temenê 9an û jortir de ye. Bêjeyên ku hatine bikaranîn jî bêjeyên di asta hêsan de ne. Zarok, dikarin çîrokê bêastengî fêhm bikin. Sazkirina hevokan ji bo zarokên xwîner guncan e.

3.1.12.4. Rexneya lehengan

Çîrok, di cureya fablê de ye. Leheng ji ajelan pêk tên. Jîyana ajelan geh bi forma jîyana ajelan geh jî bi forma jîyana mirovan tê teswîrkirin. Leheng di nava guherîneke de ne û ev rewş ji bo edebîyata zarokan tiştekî pêwîst e. Lehengên guherbar bala xwîneran dikişînin û rêya naverokeke balkêş vedikin.

3.1.12.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, li ser pirsgerêkeke berxikekî disekine. Ev pirsgirêk di zarokên temenpiçûk de tê dîtin û gav avêtina wan ya nav civakê tîne ziman. Zarokên şermok di nav komên mirovan de carinan naxwazin xwe bidin pêş. Çîrok vê mijarê tîne

ziman û dike mijar. Nivîskar vê mijarê bi saya berxikekî saz dike û ji bo xwîneran mînakekê ava dike. Hilbijartina vê mijarê ji bo zarokan kêrhatî ye.

3.1.12.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok ji hêla ziman ve hêsan û herikbar e. Naverok li ser fedîkirina zarokên piçûk ên ku ev pîrsgirêk di jîyana wan de heye ava bûye. Zarokên ku hin bi hin ji jîyana xwe ya takekesî derbasî jîyana civakî dibin di mijarên wisa de pîrsgirêke dijîn. Nivîskar ji vê hêlê ve mijarekê bi nirx hilbijartî ye û ev pîrsgirêk bi awayeke serkeftî hûnandîye. Herweha zimanekî ji bo zarokan guncan bikaranîye. Li gel van sernavên sereke, nivîskar carinan dixwaze bikeve navberê û agahîyan bide xwîneran. Vê helwestê nirxa çîrokê daxistîye. Nivîskar, ji bilî leheng û amûrên din yên vegotinê divê mudaxilê naverokê neke.

3.1.13. Bêsebirbûna pirtik

Papûre û Pirtik, du çêlikên çûka ne. Her du xûşk û bira ne. Bi dêya xwe re di hêlînekê de dijîn. Ji ber çêlik mezin dibin hêlîn roj bir roj piçûk dibû û rêya wan tê de nedima. Papûre dixwest rojek berî rojekê dest bi firînê bike lê dêya wî li benda dema rast bû. Piştî demeke, ji çêlikên xwe re dibêje ku îro, roja firîneyê. Çêlik gelekî kêfxweş dibin. Dê, ji bo karekî piçûk ji hêlînê diçe û dibêje heta ez bêm li benda min bin û ji hêlînê dernekevin û nefirin. Piştî ku dê diçe hevalên Papûre û Pirtik tên û dibêjine wan tirsonek û di bîrên bifirin. Papûre şîreta dêya dibe serî û nafire lê Pirtik ji bo tinazên hevalê xwe bisekinîne ji hêlînê derdikeve û dikeve erde. Baskê xwe diderizene. Dê ya wî, wî dibe nexweşxane û pazdeh rojan baskê wî giredidin. Di van rojan de Papûre hin dibe firîne. Piştî ku Pirtik baş dibe ew jî hîn dibe û şaşîtiya xwe fêm dike.

3.1.13.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/8 = 12,5$

Çîrok, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo xwînerên di temenên di h salî û jortir de re guncan e. Xwînerên ji vî temenî piçûktir bin mimkûn e ku di şopandina hevokan de pirsgerêkê bijîn.

3.1.13.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (2/98) * 100 = 2,04$

Çîrok ji hêla bêjeyên nenasyar ve xwedî hejmareke guncan e ku xwînerên di temenên şeş salî û jortir de jî dikarin xwendineke bi hêsanî bikin. Xwînerên piçûk, dikarin bi awayeke herikbar bixwînin.

3.1.13.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok, ji aliyê dirêjahîya hevokan bo zarokên di temenên di h û jortir de guncan be jî ji hêla bêjeyên nenasyar ve ji bo hemû zarokên xwîner guncan e. Zarok, bi rêya zimanê hêsan dikarin ji naverokê fêhm bikin û bigihêjin peyama çîrokê. Lê hin zarok ji ber dirêjahîya hin hevokên dirêj mimkûn e ku pirsgerêkan bijîn.

3.1.13.4. Rexneya lehengan

Leheng ji çûkan pêk tên. Têkilîyên di navbera wan û pirsgerêkên wan de ji hêla taybetmendîyên wan ve di naverokê de tên hûnandin. Têkilîya dê-zarok, xwişk-bira û heval-heval di berhemê de tê ravekirin. Leheng, di nava guherîneke de ne lê di dawîya çîrokê de jî çewtîyên xwe fêhm dikin û têkilîyên wan ber bi başîyê ve diçin. Lê di çîrokê de hêla şîretkarîyê jî heye û ev bo naveroka edebîyata zarokan bi erênî nayê dîtin.

3.1.13.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, li ser bingeheke şîretî hatiye avakirin. Herçiqas ev bi rêya lehengan bê afirandin jî dîsa naverok bi awayeke tund şîretkar e. Çîrok, di teşeya çîrvanokê de hatiye nivîsandin û xwedî taybetmendîyên çîrvanokan e. Naveroka şîretê, dibe ku ji

zarokan re xwedî hêleke sûdgirtî jî be lê anîna ziman divê bêhtir afirîner bibûya. Li gel vê naverokê têkilîya di navbera lehengên zarok -çûkan- de jî serkeftî tê hûnandin û rastîya zarokên di vî temenî de tê nîşandan.

3.1.13.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Naverok, li ser çêlîkeke çûka ye ku ev çûk bê biryara dêya xwe ji hêlîna xwe difire û xwe birîndar dike. Dêya du çêlîkan şîretan li wan dike lê yek ji wan ji ber ku hevalên wan henekên xwe bi wan dikin dixwaze bêtî dêya xwe bifire. Di encamê de xwe birîndar dike. Naverok xwedî hêleke şîretkar e. Vê şîretdayînê bi rêya lehengan tîne ziman û diwaxê xwîner vê peyamê fêm bikin. Ev rêbaz di edebîyata zarokan de ji ber ku dûrî afirandina serbixwe ye zêde erênî nayê dîtîn lê nivîskar ji ber ku ev bi rêya lehengan sazkerîye heta dereke dikare bê qebûlîkirin. Pîrsgirêkên zarokên temenpiçûk weke henekpêkirin û fedîkirin bi awayeke serkeftî hatine hûnandin û ev bi zimanekî ku ji hêla zarokan ve bê fêmkirin hatine pêşkêşkirin.

3.1.14. Pelşîn û koçer

Pelşîn, dareke bi tena serê xwe li kêleka rêya bajer e. Li dora wê dar nebûn. Dar, bi giştî di besta çem de bûn. Leglegan tewa hêlînên xwe di vê bestê de çêkiribûn û Pelşîn ji ber vê pir xemgîn dibû. Pelşîn jî dixwest ku legleg hêlînên xwe li ser çikilên wê çêbikin. Koçer, leglegeke ku dixwest dareke bibînî û hêlîna xwe li ser wê darê çêbike. Koçer, hemû aliyên bestê gerîya lê mixabin dareke wala nedît ku hêlînekê çêbike. Dema ku nêzî bajer bû darake bi tenê dît. Koçer, xwe bir Pelşîn re da naskirin. Civateke pir xweş kirin. Koçer, ji Pelşîn rê qala serpehatîyên xwe û çîrokên di rê de didîtin kir. Koçer xwest hêlîna xwe li ser Pelşîn çêbike. Dema ku Pelşîn ev bihîst pir xweş bû û qebûl kir. Koçer, dest bi çekirina hêlîna xwe kir. Dema ku koça leglegan dest pê kir çû bestê li benda hevalê xwe Koçîn e. Koçînê hat. Koçer, ew bire hêlînê. Koçînê, hêlîn pir eciband. Di hêlînê de du çêlîkan wan çebûn. Di nav xweşîyê de jîyana xwe berdewam kirin û piştî wan jî hêlîna li ser Pelşînê ma û bo gelek leglegan bû hêlîn.

3.1.14.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Çîrok ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên di temenên 8-9an de ye.

3.1.14.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (1/99) * 100 = 1,01$

Li gorî vê encamê çîrok xwedî zimanekî sade ye û zarokên di temenên şeş salî û jortir de dikarin ji naverokê bi awayeke hêsan fêhm bikin.

3.1.14.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Zimanê çîrokê bi vegotineke hêsan derdikeve pêşîya me. Zarokên di temenên piçûk de jî dikarin ji vî zimanê herikbar sûd bigirin û ji naverokê bi awayeke zelal fêhm bikin. Carinan nivîs bi rêya diyalogan dimeşe û ev taybetmendî, xwendinê ji bo zarokan hêsanîr dike.

3.1.14.4. Rexneya lehengan

Çîrok ji hêla teşeyê xwe ve fabl e. Leheng ji dar û leglegan pêk tên. Her du alî jî di nava aloziyeke de ne û dixwazin vê pirsgirêkê çareser bikin. Her du alî xwedî xemgîniyeke ne û bi saya hev pirsgirêkê çareser dikin. Lehengên çalak û alîkar, dikarin di hişê zarokan de lehengan di asteke baş de ava bikin û ji bo derûniya zarokan bibin mînakên serkeftî.

3.1.14.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok li ser tenêbûn û hevaltîyê disekine. Dareke bi tenê û leglegeke bêhêlîn lehengên sereke ne. Têkilîyên di navbera wan de honaka nivîsê ava kirîye. Ev mijar bi piranî ji bo zarokên ku hin bi hin dikevin nava civakê û pirsgirêkên civakî dijîn re giring e. Çîrok vê aloziyê bi awayeke serkeftî tîne ziman û rê vedike ku zarok li ser tenêtiya xwe bifikirin û ji bo çareserîyê gavan biavêjin.

3.1.14.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji alîyê vegotin û zimanê hatîye bikaranîn ve sade û herikbar e. Naverok, bi saya vê hêla berhemê bi hêsanî ji hêla xwîneran ve dikare be fêm kirin. Zarokên di temenên piçûk de ji dikarin vî zimanê û -vegotina zelal- fêm bikin. Naverok, bo zarokên temenpiçûk guncan e. Zarokên di van temenan de bi pirsgerêkên civakî re rû bi rû dimînin û dikevin nav aloziyan de. Dêrûniya tenêti, pirsgerêka bêhevaltî û hwd. ji endamên girseya vê çîrokê re mijarên sereke ne. Ji ber van sedeman, çîrok ji hêla pêşveçûyîna zarokan ya erênî ve pêwîst e ku bê xwendin.

3.1.15. Şahkeran

Ker, li cihekî mîna bihiştê dijîn, di nav dilovanî û aramîyê de bûn û şahê wan jî pir bi aqil û jehatî bû. Keran, li ser sozên Şahkeran disekinîn û dema ku biryarek didan bîya hevdu dikirin. Rojeke ker bîryarê didin ku ji warên xwe koç bikin. Ji ber ku dijminên wan mîna gur, şêr, rovî, piling hwd dixwazin wan têk bibin. Ker, bi bîryara Şahkeranê xwe dê dest bi koçî bikin. Dema ku şêr vê dibihîze ji keran re dibêje ku eger ew koç nekin dikari bi keran re bibe heval û wan biparêze. Ker, ji ber ku dijminatîyê şêr dizanin vê qebûl nakin. Bi dorê piling, rovî û gur ji nêzî heman tiştan dibejin lê Şahkeran hemûyan red dike û rêya xwe berdewam dikan. Piştî demekê ker li rastî mirovan tên. Ker, di jîyana xwe de mirovan nû dibînin. Mirov, ji van re dibêje eger ku pê re bibin heval, ew ê wan biparêze. Mirov, dibêje ku hemû ajel pê re heval in û di nav aşîtiyê de dijîn. Piraniyê keran vê pêşniyarê qebûl dikan. Herçiqas Şahkeranê wan li dijî wê biryaran keran jî be, ji bilî Şahkeran, malbata wî û çend dostên wan bo azadiya xwe berdewam dikan. Kerên ku bo azadiya xwe berdewamkirin warekî azad û xweş dîtin û piştgirîya xwe heta dawîyê meşandin. Kerên ku li ber destên mirovan man, bindest bûn û mirovan ew xistin xulamên xwe.

3.1.15.1. Pîvera firêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/7 = 14,28$

Çîrok, xwedî hevokên dirêj e û ji ber vê jî bo xwendineke fêmbar, xwîner divê di temenên 11an û mezintir de bin.

3.1.15.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)]*100=$
 $(2/98)*100=2,04$

Ji hêla bêjeyên nenasyar ve berhem ji xwînerên zarok ku di temenên şeş salî û jortir de guncan e.

3.1.15.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok, herçiqas xwedî bêjeyên sade ku ji hêla zarokan ve bi awayeke hêsan bêm fêmkirin jî be ji asta hevokan ve temenê xwendinê pileyekî bilind e. Zarokên di temenê yazdeh salî û jortir de de bin dikarin hevokan hêsantir bişopînin. Ji ber ku cûreya vê çîrokê nêzî fablê ye, ziman û vegotin jî xwedî taybetmendiyên vê cureyê ne û nivîskar ev bi şêweyê serkeftî hûnandîye.

3.1.15.4. Rexneya lehengan

Piranîya lehengên sereke ajel in. Hemû ajel, di navbera tevgerê de ne ku hevdû tîk bibin. Ev tîkoşîn di nav ajelan de nerazîbûn û dijmintîyê derdixe holê û danûstandina wan ya bi hev re xerab dike. Lê li gel van aloziyan ev rewşa navxweyî, naverokê geş dike û wê bi pêşve dibe. Lehengên sereke ker in û ew li pey azadiya xwe ne. Ji vî alî ve çîrok, xwedî wateyê afirîner e. Ji aliyê din ve ev naverok, tundîya di nava ajel-ajel û ajel-mirovan de jî dide xuya kirin û pîralîyê li ber xwîneran radixe. Zarok, ji vê naverokê dikarin fêm bikin ku xweza; xwedî ceng, tevger û tîkoşînê ye.

3.1.15.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, aliyê jîyanê yê tundî û neheqîyê dihevine parve dike û vê bi awayê çîrokwar tîne ziman. Di dawîya çîrokê de serkeftin û tîkçûyîn bi hev re tîne hûnandin. Çîrok ji aliyê ve xwedî naverokê şîretkar e jî. Carinan sîya nivîskar tê de xuya dike ku çîrok dixwaze dersan bide xwîneran. Ev rewş herçiqas nirxa çîrokê hinekî daxîne jî, çîrok bi giştî xwedî asteke serkeftî ye.

3.1.15.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, bi naveroka xwe ya cuda xwedî serkeftinekê ye. Lehengên sereke ker in û ew li pey doza xwe ya azadî û rizgarîyê ne. Di vê pêvajoyê de bûyerên ku tên serê wan gav bi gav tên vegotin û çîrok di dawîyê de digihêje encameke du alî. Ev naverok bi awayeke hêsan tê vegotin û zarok dikarin bi hêsanî jê fêm bikin û peyaman jê der bixin. Çîrok ji zarokên di temenên yazdeh salî û jortir de guncan e, ji hêla bêjeyan ve pir hêsan e û zarok bêsinor dikarin peyvan fêm bikin. Rexneya ku li çîrokê bê kirin ew e ku di çend cihan de sîya nivîskar xuya dike û dixwaze ew bixwe peyamê bide xwîneran. Ev herçiqas ne gelek caran be jî, hebûna vê yekê bo nirxa çîrokê kêmasîyek e.

3.1.16. Xelata kîso

Li bajerê Dostanî, bi navê Şahîyanî daristaneke piçûk hebû. Ev daristan, xwedî şînahî, dar û ajelan bû. Mirovên Dostanîyên pir ji hez daristan û ajelên dikirin. Daristanê xwe diparastin û dema ku seyran û ger li daristanê dikirin jî daristan pakij dikirin. Rojêke kesên nebas hatin daristanê. Piştî dema xwe li we de bûharandin qirejahîya xwe li daristanê hîştin û çûn. Di demeke şûn de li daristanê agir derket. Kîso xiste hawar. Ajelên ku dengê wî kirin ji alîkarî ji der û dorê xwestin. Pêşî filan xwestin bi xirtumên xwe agir vemirenin lê agir venemir. Agirkuj hatin û agir vemirandin. Ji ber ku kîso, roleke giring girtibû, xelat sitand.

3.1.16.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ji bo zarokên 9 salî û mezintir re guncan e.

3.1.16.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (1/99) * 100 = 1,01$

Di çîrokê de bêjeyên ku ji hêla zarokan ve neyên fêmkirin hindik in û çîrok ji bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e.

3.1.16.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok, xwedî zimanekî herikbar û zelal e. Ajel bi rêbaza kesayetkirinê tên axivandin. Him ji hêla hevoksazî, him jî ji hêla bêjeyên ku hatine bikaranîn ve berhem ji bo zarokên xwîner guncan e.

3.1.16.4. Rexneya lehengan

Çîrok di teşeyê fablê de hatîye hûnandin û lehengên wê yên sereke ji ajelan pêk tên. Leheng ji bo parastina xwezayê li dijî mirovan têkoşînê dimeşînin û biser dikevin. Leheng, di naverokê de çalak in û di nihêrîna zarokan de payeyeke baş bi dest dixin. Alîkar û xêrxwaz in.

3.1.16.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok xwedî naverokeke li ser parastin û geşkirina xwezayê ye. Ev peyam, bi rêya mirovên xerab û ajelên baş tê vegotin. Naverok aloziyeke du alî derdixe û mijarê li ser vê xezê bi pêşve dibe. Têkoşînek di navbera wan herdu alîyan de heye. Xwîner bi vê naverokê dikare fêrî hişmendîya parastina xwezayê bibe û nihêrîna ajelan -herçiqas honak jî be- û hevhestîyê fêr bike.

3.1.16.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, xwedî naverok û zimanekî hêsan e. Bi piranî ji bo zarokên di temenên piçûk de dikare bê bikaranîn. Mijar, mîna şîretkirinê hatibe amadekirin jî nivîskar ev bi rêya lehengan saz kirîye û xwe ji nivîsê cuda kirîye, çîrokeke ji hêla peyama xwe ve serkeftî afirandîye. Çîrok ji bo nihêrîn, îzafîyet û rastîya zarokan jî guncan e.

3.1.17. Rexnaya giştî li ser çîrokên Nejla Öztürk

Çîrokên Nejla Öztürk; mijarên hevaltî, alîkarî, parastina mafên takekesî, parastina xweza û ajelên li xwezayê, nirxa jîyana bi pistgirî, xweşîya parvekirinê, tenduristî û werziş, hezkirina ajelan, têkoşîna xweşkirina jîyanê u hwd di çîrokên xwe de bi kar tîne. Öztürk, honaka xwe bi piranî bi fikrên erênî û naverokê bi bûyerên ku bi encamên serkeftî dawî dike. Ev, bo xwîneran dikare derûniyeke

duristker saz bike. Lehengên astenger û di nav alozîyê de bi saya honakê pirsgirêkên xwe çareser dikin û nihêrînên li jîyana wan tê guhartin.

Pirsgirêkên xwezayî bi rêya pistgirî û hevaltî tîr çareserkerin. Ev rewş, temaya dostanî û hevaltîyê xurt dike. Xwînerên ku di jîyana xwe de xwedî alozî û astengîyanê mi mijarên Öztürk re dikarin ji honakê jêderan derxinin û di jîyana xwe de van raman û rêbazên bikarbin.

Öztürk, xwe naskirina mirov dixwe paye bilind de û dixwaze kes/mirov hevî û xeyalên xwe bibe serî. Kesên ku di hişên xwe de jixwebawer di honakan de cih digirin ev kes bo armanca xwe têkoşînê didin û bi ser dikevin. Ev peyam, bo xwîneran mimkûne ku jêderên bi nirx derxine. Nivîskar, ji hêla derûnîyê ve dixwaze xwîneran xurt bike û fikra çareserkerina alozîyên bi wan re ava bike. Fikra çareserkerina pirsgirêk û alozîyên civakî ji bi rêya pistgirî û alîkarîyê dikare bê çareserkerin tê nîşandan.

Zimanê Nejlâ Öztürk, ji hêla dirêjahîya hevokan û bêjeyên nenasyar ve carinan dikeve cudahiye. Ji bilî çîroka bi navê Şingêşingê çîrokên din ji hêla bêjeyên nenasyar ve bo zarokên di temenên şeş salî û jortir de guncan in. Ev ast ya herî baş ku xwînerên ku dest bi xwendinê dikin dikarin çîrokan ji hêla bêjeyan ve bêpirsgirêk fêr bikin û peyaman bigirin. Çîroka Şingêşingê ji hêla bêjeyên nenasyar ve di asta xwînerîn di temenê çardeh salî û jortir de ye. Ev rêje bo zarokên di temenên piçûk de mimkûn e ji hêla fêmkirinê ve pirsgirêkan derxine. Li hêla din, kistasa ku dirêjbûna hevokan ve çîrokên Öztürk bi giştî di asta xwînerên di temenên nih salî û jortir de ne. Bêguman, xwînerên xwedî tebîetê xwendine hilgirtibin dikarin van hevokên dirêj bi hêsan bixwenin lê dema ku temen piçûk be û zaroka bi xwendinê re pir ne eleqedar be dibe ku hin pirsgirêkan bijîn.

Berhemên edebîyata zarokan; ji hêla ziman, naverok û vegotinê ve dibe di nav ahengekê de bin. Mijar û nêrîna Öztürk li naveroka bo rastî û îzafiyeta zarokan serkeftî û guncan e. Zarok, mijarên û bûyerên di jîyana xwe de dijî dikare di çîrokên Öztürk de bibîne û jêderinan ji çîrokan derexe. Ev, ji bo edebîyata zarokan nirxek e.

Lê ji hêla ziman ve bikaranîna hin hevokên dirêj bo hin xwînerên di temenên piçûk (şêş-neh) re mimkûn e ku hin pîrsgirêkên şopandina hevokan derkeve.

Hin çîrokên Öztürk, xwedî hêlên şîretkar in. Nivîskar van şîretan bi saya lehengan çê dike lê dîsa di edebîyata zarokan de hebûna şîretan bo honakeke serkeftî kemasîyeke û zarok ji van gotinên gelemperî kefê nastînin.

3.2. Mûrad Dildar û Nirxandina Çîrokên Wî yên Ji Bo Zarokan

3.2.1. Qesra spî

Li gundê Welatê Seyranê bi navê Çemê Zelal çemek hebû. Ev çem pir bi hez bû û der û dora xwe şîn û ava dikir. Şeveke dengê pir bilind bi ser gund dikeve. Dema gundî diçin dinêrîn û dibînin ku zinarekî pêşîya çem ase kirîye. Gundî çî dikin çî nakin nikarin vî zinarî rakin û pêşîya çemê xwe vekin. Alîkarîyê ji zanaya gund ya bi navê Pîra Berîvanê dixwazin. Ew dibêje ku bi tenê Berfîna di Qesra Spî de dikare alîkarîya bide wan. Tenê zarokên dilpaqij dikarin xwe bigihînine vê qesrê. Rêya qesrê di şikefteke ku marekî pir mezin te de ye re derbas dibe. Dilgeşê şêş salî, vê qebûl dike û bi rê dikeve. Di rê de Dilgeş, alîkarîyê dide berxik, kevok û jîjoyekî spî. Ev her sê ajel jî diyarêke didin Dilgeş da ku di zordarîye de ma wan bikar bîne. Dilgeş dema ku digiheje şikeftê mar wî dixê zorê û Dilgeş bi sayan wan diyarîyan rizgar dibe û xwe digihene Qesra Spî û Berfînê. Bi hev re gund û zinar ji pêşîya çem dirakin û avê rizgar dikin.

3.2.1.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/8 = 12,5$

Ev dirêjbûna hevokan li gorî zarokên di navbera salên 10-11an de guncan in. Zarokên ji van temenan piçûktir dibe ku di şopandina hevokan de zehmetîyê bikişînin.

3.2.1.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (1/99) * 100 = 1,01$

Ev pîvan hejmareke gelekî piçûk e û bo berhem ji zarokên di temenên şeş salî û jortir de guncan e.

3.2.1.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Vegotin û zimanê “Qesra Spî” bi taybetmendiyên çîrvanokê hatine nivîsîn. Ziman bi awayeke hêsan tê bikaranîn û vegotin herikbar e. Zarok, bi awayeke hêsan dikarin naverokê bişopînin û jê fêhm bikin. Peyvên ku hatine bikaranîn ji hêla zarokên piçûk ve jî dikarin bîr fêhm kirin.

3.2.1.4. Rexneya lehengan

Lehengê çîrokê yê sereke zarokê bi navê Dilgeş e. Ev zarok di nava tevgerê de ye û di pêvajoyê de bi awayeke têkoşer çîrokê didomîne. Lehengên alîkar, li gorî astên xwe yî ku nivîskar ji wan re xêz kirîye tevdigerin û serkeftî ne. Ji bilî vê ji ber ku naverok bi teşeyê çîrvanokê hatiye nivîsîn taybetmendiyên vî cureyî di nav lehengan de jî hene. Di edebîyata zarokan de lehengên xwedî tevger behtir maqul in û ev taybetmendî di çîrokê de hene.

3.1.1.1. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Naveroka ku bi şewaza çîrvanokê pêk hatiye, bi rêya lehengekî zarok tê honak kirin. Zarok, di nav tevgerê de ye û çalak e. Di dawîya naverokê de zarok bi ser dikeve û der û dora xwe kêfxweş dike. Di çîrokê de zarok, xwedî payeyeke bilind e û tê teqdîr kirin. Naverok bi awayeke baş bi dawî dibe. Ji ber van sedeman naverok dikare piştgirîyê bide xwîneran.

3.2.1.5. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Nihêrîna zarokan –bi rêya lehenge ku zarok e- di naverokê de bi serkeftî tê nîşandan. Lehengên sereke yê zarok, hest û ramanên xwe di çarçoveya honakê de tîne ziman û xwîner vî tiştî bi awayeke zelal dibînin. Tevgera vî zarokî ji zarokên xwîner re dikare bibe mînak û nihêrîna wan erênî bike. Ji hêla ziman ve carinan hevokên dirêj hene û ev ji bo zarokên temenpiçûk pirsgirêkên piçûk derdixin. Ji hêla peyvên nenas ve çîrok serkeftî ye û zarokên temenpiçûk jî dikarin ji naverokê fêhm bikin. Di berhemê de bûyerên xeyalî hene û ev bi piranî ji bo zarokên di temenên

piçûk de guncan in. Ji hêla meraqê ve zarok dikarin bi awayeke baldar naverokê bişopînin. Ji hêla pedagojîyê ve jî çîrok derfetê dide ku zarok ji xwe bawer bin û li çareserîyan bigerin. Herweha, zarok mîna kesên xêrxwaz û dilpaqij tînişandan û wêrektîya zarokekî tînişandikirin. Ji ber van sedeman, ev berhem ji helwesta li hember zarokan ve serkeftî ye.

3.2.2. Dara sêvê

Bi navê Nêçîrvan Axa, axayekî xwedî baxçeyekî pir xweş û geş hebû. Di baxçe de, gulên pir xweşik û xwedî rengên cuda hebûn. Axa, ev gul difirotin û ji van pir zêr qezenc dikirin. Ji bilî gula, di baxçe de dareke sêvê jî hebû. Dara Sêvê; ji ber ku gul ji zîpik, ba u baranê diparastin sêvên xweyî ku digirtin diweşandin. Dar, ji gulan re pir dibû alîkar û gulan hez ji darê dikirin. Ji ber ku darê sêv nedigirtin Axa ji darê aciz bû û ew birî. Ji ber vê helwesta Axa, gul pir xemgîn bûn û roj bi roj çilmisîn û ew rengîn û xweşîkbûna xwe winda kirin. Piştî ku gul ketin vê rewşê de Axa edî bes zêr qezenc kirin. Rojê Axa dema ku li nav baxçe digerrîya Perîya Xwezayê li rasta wî tî. Pêrî ji Axa re dibêjê ku eger herî Welatê Rehan dikare Dara Sêvê rizgar bike. Ji ber ku rehan dara li wir e. Axa, qebûl dike û diçe. Di rê de li rasta ajelan tî. Axa, ji wan alîkarîyê dixwaze lê ji ber ku Axa dar birîye, ajel alîkarîyê nadinê û wî rexne dikan. Di dawî de Axa, digihêje ba Mîrê Rehan. Mîr, ceza dide Axa û wî dixê zindanê de. Piştî demeke, Mîr bi şertê ku Axa, li gundekî hezar darî biçinî wî dibexşin. Axa, ji mal û milkên ku bi saya gulan qezenckirine di candîniya daran û guhdana van de xerç dike. Di dawîyê de, Dara Sêvê jî nûv re te nav baxçe û gul disa xweşik û geş dibin.

3.2.2.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/8 = 12,5$

Li gorî encama pîvanê, ji alîyê dirêjbûna bêjeyên di hevokekê de ev çîrok ji hêla guncanbûnê ve jî bo xwînerên deh-yaz deh salî dikare bê bikaranin.

3.2.2.2. Pîvera peyvên nenasyar

$$[\text{Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)}] * 100 =$$
$$(2/98) * 100 = 2,04$$

Ev hejmar, ji bêjeyên nenasyar ve hejmareke guncan e. Zarokên di temenê şeş salî û jortir de dikarin bi awayeke hêsan vê çîrokê fêhm bikin.

3.2.2.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Ziman û vegotin, bi awayeke hêsan û herikbar e. Carinan bi dubarekirina bêje û hevokan ji xwendineke hêsan re rê hatîye vekirin. Vê rêbazê, ji vegotinê re guncanbûna bikaranîna qafiyeyê vekirîye. Him ji zarokan re nivîsek rîtmîk lidarxistîye him jî bi zelalbûna peyaman naverok xurt kirîye.

3.2.2.4. Rexneya lehengan

Honak bi piranî li ser lehengên mîna dar, gul, perî û kesên di cihaneke din de dijîn tê hûnandin. Hemû leheng jî di nava tevgerê de ne û tên guhertin. Ev rewş, ji bo balkişandîna pêwîst e ku xwîner bi awayeke hêsan naverokê bişopînin. Leheng, bi tevger û gotinên xwe dikarin bala zarokan bikişînin û wan bi alîyê xwe de bînin.

3.1.1.2. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, bi şewaza çîrvanokê hatîye nivîsandin. Bûyer û lehengên xeyalî tên bikaranîn û mijar bi alîkarîya wan tê hûnandin. Kesekî ku dareke dibire heye û piştî darbirîna bûyerên balkêş tên serê wî. Honak, bi vê bûyera balkêş, balê dikişîne ser xwe û herikbarbûna naverokê saz dike. Ji vê hêlê ve mirov dikare bêje ku ev honak, ji bo xwînerên zarok xwesteka xwendinê derdixe holê. Ji ber ku naverok li ser parastin û geşkirina xwezayê ye, mijar dê bi awayeke erênî bê ditîn. Carinan hevokên şîretkar tên bikaranîn lê ev hevok bi rêya lehengan tê çê kirin û nivîskar xwe naxe nava berhemê. Ev, helwesteke di cih de ye. Nihêrîn û bêjeyên di çîrokê de bi alîyekî tekûz û bi nirx tên hûnandin.

3.2.2.5. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Nivîskar mijarên mîna xweza, parastina xwezayê, hevaltî û piştgirîyê bi rêya amûrên xeyalî tîne ziman. Piştgirî, alîkarî û têkoşîna ji bo başîyê bi rêya darê, karakterên xeyalî û mirovan tê hûnandin. Di naverokê de pêwîstîya dar û xwezayê bi awayeke hestîyar tê xuyakirin. Ziman bi piranî hêsan e û bêjeyên ku hatine bikaranîn bêjeyên rojanê ne. Yek ji lehengên sereke axayek e û ev axa di çîrokê de şaşîtîyeke dike û Dara Sêvê dibire. Naverok li ser vê bingegehê tê sazîkirin. Lehengên din yên ku bi piranî xeyalî ne, axa rexne dikin û bertekê didine de. Axa hin bi hin şaşîya xwe fêm dike û li çaraserîyê digere û bi ser dikeve. Dar dîsa tê cihê xwe û hemû kesên di çîrokê de ne dilşad dibin. Carinan doza xemgînîyê tê bilind kirin û dibe ku zarok di van beşan de xemgîn bibin û ji hêla hestan ve biêşin. Lê di dawîya çîrokê de pîrsgirêk bi serkeftîneke di cih de bi dawî dibe û berhem imajeke baş dide xwîneran. Mijar û hest bi nêrîneke zelal tê destnîşankirin û ev yek, dikare ji bo xwînerên zarok re erênîyekê saz bike.

3.2.3. Gola şîr

Li welatekî, goleke şîr hebû. Di nav şîrê golê de heft masîyên spî dijîn. Mirovên li dora dijîn di nav aramîyê de bûn. Zarok, di nav kêfxweşîyê de listikên xwe dilistî. Masîyên golê, bi mirovan re hevalbûn. Rojeke qertelêk dixwaze masîyên golê bixwe lê ji ber gol mîna şîr spîyê masîyan di nava şîr de nabîne. Ewrekî reş alîkarî dide qertel û dibejê here ji Leflefoka Har bavêj gola da ku şîrê golê biçikînî da ku qertel bikaribe masîyan bixwe. Qertel, jî tiştî dike û ava golê roj bi roj kêm dibe. Zarok û gundî dixwazin çareserîyekî bibinin. Qîza bi navê Xezal dibêje ku em ji masîyan re hawuzekî şîr çebikin û masîyan li bi cih kin. Gundî, ji şivanan alîkarî dixwazin û hawuz ava dikin. Dema wisa dikin qertel dixwaze erîşî gundîyan bike lê dikeve nav şaxên Leflefoka Har. Leflefoka Har, qertel xwar. Di dawîye de gundî Leflefoka Har dibirin û gol û masîyên xwe rizgar dikin.

3.2.3.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/6 = 16,66$

Ji hêla dirêjahîya hevokan ve çîrok li gorî zarokên yazdeh salî û jortir de guncan e. Zarokên ji van temenan piçûktir îhtîmal heye ku di şopandinê de pîrsgirêkan bijîn.

3.2.3.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=
(1/99)*100=1,01

Zimanê çîrokê ji hêla bêjeyên ku hatine bikaranîn ve pir hêsan e û zarokên di temenên şeş salî û jortir de dikarin vê naveroke fêhm bikin.

3.2.3.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Bi saya ziman û bêjeyên hîlbijartî dibe ku zarok bi awayeke hêsan naverokê bişopînin û jê fêhm bikin. Gotinên rojane hatine bikaranîn. Ji van hêla ve mirov dikare bibêje ku ev berhem ji hêla ziman ve guncan e.

3.2.3.4. Rexneya lehengan

Lehengên sereke ji zarokan pêk tên. Kesên mezin, ajel û gîya jî wek lehengên din nin. Zarok û mirov wek kesên xwezaparest tên xuya kirin û zarok di çîrokê de di roleke giring de ne. Ev alî dibe ku ji bo zarokên xwîner re alîyekî baş çêbike û zarok, naverok û lehengan nêzîkî xwe bibînin. Zarok; di roleke zîrek, jîr û bîaqil de tên teswîr kirin û rêyên nû nîşanî mezinan didin. Dema ku ev têkîrin jî mudaxeleya nivîskar nîn e û ev rewş bi rêya leheng û vêgotinê tê gotin.

3.2.3.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Di naverokê de têkoşînek di navbera başî û xerabîyê de heye. Li alîyekî zarok û mirovên ku li parastina xwezayê digerin li alîyê din jî ajel -qertel- û gihayên -leflêfok- ku xweşîyê xerab dikin. Di vir de balkêşî dest pê dike û dewam dike. Pîrsgirêk ev e ku qertel gelekî xerab tê nîşandan û dijminê xwezayê tê xuya kirin. Lê rastî ev e ku qertel, ajelekî bi goşt hwd. xwe xwedî dike û ev tebieta wî ye. Piştî vê

naverokê mimkûnê xwînerên piçûk yên ku hêj tevgera ekosîstemê nasnekirine ji ajelên weke qertel aciz bibin. Ji bili vê alîkarî, hevaltî, piştgirî û parastina xwezayê bi awayeke serkeftî tê hûnandin û çîrok bi zimanekî xwerû hatîye nivîsandin.

3.2.3.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzaffiyeta zarokan di çîrokê de

Ji hêla naverokê ve çîrok xwedî du alîya ye. Hêlek jê pir erênî ye û dikare têkilîyeke xurt di nav komên zarokan de ava bike û mijarên wek hevaltî, dostanî, alîkarî û parastina xwezayê pêşve bibe. Ev alî ji alîyê nivîskar ve bi honakeke serkeftî û bi bûyerên balkeş hatîye nivîsandin. Alîyê din yê ku xerab jî, dibe ku zarok hin ajelan wek dijmin bibînin. Di çîrokê de qertel di vê astê de ye. Qertel dixwaze masîyên golê bixwe û gundî û zarok li hember wî têkoşînekê didin dest pê kirin û bi ser dikevin. Herçiqas ev gaveke baş xuya bike jî şaşîti ev e ku qertel, ajelekî ajelxwar (goştixwar) e. Ev xweza ya qertel e. Di vê rewşê de naverok dikare bike ku zarokên xwezayê zêde nasnakî ji qertelan hêrs bibin û di dahatûyê de dijminatîyê li qertelan bikin.

3.2.4. Kanîya zêrîn

Li welatekî xweş kanîyeke bi navê Kanîya Zêrîn hebû. Ev kanî, xwedî avake xweş bû. Kesên ku ji vê av divexwarin baş dibûn û ji nexweşîyên xwe rizgar dibûn. Herweha Kanîya Zêrîn, ji bo Teyrên Zêrîn jî cihe jîyanê bû. Rojeke kesekî zilmîdar bi navê Mîrê Heft Welatan Kanîya Zêrîn hat standin û Kanî ji hêla leşkerên ve hat dorpeç kirin. Mîr, heqê vexwarina avê xist heft zêr û ferman da ku kesên heft zêran nede nikari ji avê vexwê. Piştî demeke, Teyrên Zêrîn hawara xwe gihandin Perîya Avê ya bi navê Zelal. Perîya Zelal, daxwazan wan qebûl kir û ava kanîya di nava kûzekî kom kir û ji Mîr re got ku di nava sê rojan de destên xwe ji ser kanîyê ne rake ew ê wan ceza bike. Mîr, di van rojan de çiqas hewl dan jî nikarîbûn kûz bişikînin û avê dîsa bistînin. Mîr, bi hêrs bû Teyrên Zêrîn bi destên leşkerên xwe di qefesê de girtin. Piştî sê rojan Perîya Avê hat û Mîr û leşkerên wî li ber ave birin û Kanîya Zêrîn rizgar kir.

3.2.4.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/6 = 16,66$

Ji hêla dirêjbûna hevokan ve ev çîrok zarokên yaz deh salî û jortir re guncantir e. Zarokên piçûktir mimkûn e ku di şopandinê de zordarîyê bikişînin.

3.2.4.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=
(1/99)*100=1,01

Ev hejmar ji xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e. Kesên ku hînî xwendinê bûne dikarin ji vê naverokê fêhm bikin.

3.2.4.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Ziman di forma çîrvanokê hatîye bikaranîn û hêsan e. Ji hêla hemû zarokan ve dikare bê fêhm kirin. Ji bilî motifên çîrvanokê carinan helbest jî hatine bikaranîn û ziman bêhtir piralî bûye. Vegotina ziman li gorî ast û cudabûna lehengan tê avakirin û wekhevîya ziman û leheng tê saz kirin. Dildar, motifên edebîyata devkî bi kar anîne û ev bo nîrxên kurmancî hêleke erênî ye.

3.2.4.4. Rexneya lehengan

Lehengên çîrokê ji kesên rasteqîn û yê xeyalî pêk tên. Leheng di têkoşîna başî û xerabîyê de li ber hev dixin. Leheng, bi awayeke hêsan ji hêla zarokan ve dikarin bê fêhm kirin. Leheng yekalî ne û ev tişt ji hêla zarokan ve fêmkirina wan hêsan dike.

3.2.4.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Di çîrokê de parastina xwezayê tê hûnandin. Xwîner vê peyamê bi awayeke zelal dikare fêhm bike. Kesên ne baş, dixwazin ku dest deynin ser çem lê ji hêla kesên xêrxwaz û lehengên xeyalî ve tên sekinandin û berhem mîna çîrvanokeke bi başî xelas dibe. Şerê di navbera wan herdu alîyan de herçiqas têkoşînî be jî, naverok li gorî asta xwînerên zaroka guncan e. Zarok, bêtî ku li hevokên tund rast bê fêhm dikarin çîrokê bixwînin.

3.2.4.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Peyam û armanca çîrokê ew e ku mirov xwezayê biparêzin. Honak û leheng li gorî vê çarçoveyê hatine saz kirin. Bi rêya lehengan ev peyam bi awayeke xurt û bi bertekeke tund tê cih. Nivîskar carinan xwe bi xwe di nav naverokê de be jî, naverok bi piranî bi saya karakteran tê vegotin. Ziman jî him ji ber ku çîrok ji bo zarokan e him jî ji bo ku teşe ji çîrvanokê pêk tê pir hêsan û rojanê ye. Nîşandana naverokê hêsan e û jî hêla zarokên di temenên piçûk de jî dikare bê fêhm kirin. Herweha îmajên ku zarok jê zirarê bibînin di çîrokê de tune ne.

3.2.5. Kurmên reş

Li welatekî dûr, çîya, dest û zevîyên bibereket hebûn. Rojeke, ji şikefteke kurmên reş derdikevin û zad, fêkî û şînahîyên walet dixwin. Gelên vî welatî hawara xwe digiştandin keybanûya xwe Gulperî Xanim. Keybanû û kesên walet, dixwazin ku ji wan kurmên reş rizgar bibin. Agir berdidine kurman lê feyde nake. Wan bi zinaran dipirçikînin dîsa bi kêr nayê. Kurmên Reş, têne di reşahîyê de derdikevin û der û dorê talan dîkin. Gulperî Xanim, bo çareserîyeke bibînî bû rêvan. Keybanû, di rê de rastî dareke mezin, masîyekî mezin û teyrêkî piçûk te. Dêdê xwe ji wan re got. Ev her sê leheng ji heman tiştî dibêjin: Ev kurmên reş tenê bi ronahîya rojê dimirin. Keybanû, piştî vê pêşnîyazê ji rojê kûzekî ronahî dixwaze. Kûzê ronahîyê di şikeftê de dişikîne û kurman dîkuje. Welat, rizgar dibe û berekatê wê dîsa tê.

3.2.5.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/6 = 16,66$

Ji dirêjbûna hevokan ve ev çîrok ji bo zarokên di temenê yazdeh salî û jortir de guncan e. Dibe ku zarokên ji vî temenî piçûktir mimkûnê ku di şopandina hevokan de pirsgirêkan bijîn.

3.2.5.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=
 $(4/96)*100=4,16$

Ev encam dide xuya kirin ku çîrok ji hêla peyvên nenasyar ve ji bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e.

3.2.5.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Di çîrokê de hevokên li ser teswîrê zêde ne. Di edebîyata zarokan de teswîr ne amûrekî di cih de ye ku nivîskar zêde bikarbînin. Zarok, bêhtir hez ji naverokên tijî bûyer dikan. Teswîr, piştî wextekî bala wan nakişîne. Ji bilî vê jêderê dikare bê gotin ku berhem ji hêla ziman û vegotinê ve li gorî asta zarokan e û zarok dikarin bi awayeke hêsan vê berhemê fêhm bikin.

3.2.5.4. Rexneya lehengan

Lehengên çîrokê bi piranî ji karakterên xeyalî û derveyî mirovan pêk tên. Çîrok, bi teşeyê çîrvanokê hatîye nivîsîn û motifên vê cûreyê bi piranî xuya dikan. Leheng, di nav têkoşîna başî û xerabîyê de ne û ev tişt wan bi xwe re diguherîne. Karakter, bi saya van guherînan çalak in û bala zarokan dikarin bikişînin.

3.2.5.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Di çîrokê de taybetmendiyên çîrvanokan hene. Ji ber vê yekê leheng, mijar û bûyerên xeyalî di naverokê de cih digirin. Bûyerên ji derveyî rêzê û guherînan di naverokê de ji balkişandina zarokan re guncan in. Carinan motifên devkî û çanda kurmancî jî xuya ye û ev ji bo pêşveçûna ziman û têkildarkirina zarokan bi motifên devkî re weke başîyeke çîrokê bê gotin.

3.2.5.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Ji hêla ziman ve çîrok, carinan xwedî hevokên dirêj e. Ji bilî dirêjbûnê, carinan bêjeyên hatine bikaranîn ji bo zarokên temenpiçûk mimkûnê ku pirsgerêkan derxînin. Di hevokinan de teswîrên ku hatine bikaranîn dirêj in ev jî dibe ku bala zarokan nekişîne. Ji hêla hûnandina naverokê ve çîrok xwedî aliyên balkêş e. Bûyer, gav bi gav doza balkêşîyê zêde dike û meraqa xwendinê bi xwe re tîne. Li gel motifên devkî yên çandî, naverok ji bo xwînerên biçûk û mezin dikare derfeteke baş ji bo xwendinê bide.

3.2.6. Marê sor

Li Desta Rengîn, kulîlkên rengîn û Teyrê Tawis di nav xweşî û aramîyê de dijîn. Her kulîlk xwedî renekî bû û dest biheşta rengan bû. Rojeke Marê Sor derdikeve û hemû kulîlkan dixê rengê sor de. Mar, ji bilî sor li dijî hemû rengên din e. Dixwaze ku Teyrê Tawis jî bixê nav rengê sor de lê Teyr xwe dispere daristanê. Marê Sor, erîşî daristanê ji dike, agir dîberde daran. Çem û avên daristanê agir vedimirînin. Herçiqas ajel û dar hewl bidin ku mar bidin sekinandin jî nikarin. Teyr dibêje ku sibe Newrozê û eger em kulîlkan ji vî sorî rizgar nekin dê hemû kulîlk biçûlmisin û hişk bin. Rovîyek fikir dide der û dorê. Dibêje ku eger em dema ku mar diraze em wî bi boyaxên rengîn boyax bikin marê agir berde xwe û bimire. Alîkarîyê ji Keskesora Rengîn dixwazin. Keskesor, turikek boyaxa rengîn dide wan. Boyaxê bi mar de dirijênin. Dema ku Marê Sor, hişyar dibe, dibîne ku çermî wî di nav rengan de ye. Ji hêrsa xwe agir li xwe dibarîne û xwe dikuje. Dest, ajel û kulîlk rizgar dibin û Newroza xwe pîroz dikin.

3.2.6.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/6 = 16,66$

Li gorî vê pîvanê ev çîrok ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji xwînerên di temenê yazdeh û jortir re guncan e.

3.2.6.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (0/0) * 100 = 0$

Ji ber ku di çîrokê de bêjeyên hêsan hatine bikaranîn, çîrok ji hêla ziman ve ji bo xwînerên di temenê şeş salî û jortir de biserkeftî ye.

3.2.6.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Zimanê çîrokê zimanekî sivik û rojane ye. Peyvên giran ku ji hêla zarokan ve neyên fêhm kirin nînin. Carinan hevokên dirêj hebin jî ev ji bo xwendineke herikbar ne pîrsgirêk in. Motîfên kurmancî yê ji hundirê çandê tînin bikaranîn û herweha ji ber

ku çîrok taybetmendîyên cûreya fablê hildigire peyvên li ser ajelan jî pir tîn bikaranîn. Carinan bikaranîna helbestan piralîbûna naverokê jî bi xwe re tîne.

3.2.6.4. Rexneya lehengan

Lehengên çîrokê ji ajelan pêk tînin. Di naverokê de marek heye û xerabîyê dixwaze. Mar, dixwaze ajel û şînahîyê ji holê rake û derdorê têxe bin bandora xwe. Ev şêwaza li dijî hev, di çîrvanok û fablan de bi piranî tê bikaranîn. Herçiqas ev pêwîstîya şêwazê jî be dibe ku ji zarokên temenpiçûk re nebaş be, ev rewş bi zarokan re li dijî ajelên weke maran dijîmintîyê çêbike. Di jîyana rasteqîn de jî mar weke ajelên divê bîn kuştin tînin nîşankirin. Ev naverok dibe ku vê helwesta şaş berztir bike.

3.2.6.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, ji naverokê ve fabl e. Bûyerên ku di navbera ajelan de tînin jîyîn bi rêbaza kesayetkirin û peyvandinê tînin hûnandin. Di vê çîrokê de dijîtîyek di navbera başî û xerabîyê de heye û ajel mîna mîrovan ji bo ku yekîtiya xwe û xweşîya dar û daristanê biparêzin piştgirîyê didin hev. Peyama hevaltî û parastina nîrxên hevpar tê pêşkêş kirin. Ji bo xwînerên zarok, ev peyam dibe ku têgeha piştgirîyê ava bike.

3.2.6.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Herçiqas hevokên dirêj hebin jî ji hêla bêjeyan ve naverok pir hêsan e û ji bo xwîneran xwendineke hêsan derdixe pêş. Xwînerên zarok jî ji naverokê bi awayeke hêsan dikarin fêhm bikin û xwendineke herikbar bidest bixin. Naveroka ku ji cureya fablê pêk tê, xwedî taybetmendîyê wê cûreyê ne û carinan ji hêla bandora ku li ser zarokên temenpiçûk dike ve alîyên nebaş jî dide nîşan. Yek ji wan jî hin ajel –mar– ne baş tînin nîşandan. Li alîyekî marê xerab û zilimkar li alîyê din ajelên ku şînahîyê û ajelên din diparêzin. Ev helwest, ji hêla perwerdeya zarokan ya li hemberî xwezayê re dibe ku alozîyeke derxîne. Zarok, dikarin mar wek ajelekî xerab bibînin û vê di jîyana xwe ya rastî de tetbîq bikin.

3.2.7. Çîyayê spî

Çîyayê Spî, çîyakî xwedî pir berf bû. Berfê çîyê her tim li ser serî wî bû. Ji ber ku Gundîyên Darvanan, darên der û dora çîyê birîbûn dar li dora çîyê nemabûn. Piştî birîna daran, baran ji li herêmê xwe de alîyekî. Gundîyan û Axayê gund, xwestin ku li dora çîyê agir vedin û berfê bixin av û golakê li çem gund çê bikin. Zarokan xwestin ku mezinan bisekinenin le bi ser neketin. Mezinan, dar li gund li dora çîya vedan û agir berdane wan. Zarokan, ji ewran alîkarî xwestin da ku agir vemirînin. Ewran agir mirandin lê duyên reş ewrên li ser çîya qul kirin û tîrêjên rojê gihîştine berfa çîyê û berfê dest bi helandinê kir. Zarokan, hawara xwe gihandina Keybanûya Terzîyên ji bo pîneyek ji bo ewran çê bike. Terzîyan pîne çêkirin û qul asê kirin. Gundîyan çewtîya xwe fêm kirin û dora çîya dar çandin. Hin bi hin xwezaya xwe bas kir û Gundç Darvanan dîsa bu gundekî mîna biheşt e.

3.2.7.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/7 = 14,28$

Li gorî pîvanan ev çîrok, ji dirêjahîya hevokan ve ji bo zarokên di temenê yazdeh û jortir re guncan e.

3.2.7.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (2/98) * 100 = 2,04$

Ev pîvan tê wateya ku çîrok ji bo xwînerên di temenê şeş salî û jortir de guncan e.

3.2.7.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji bo zarokên di temenê yaz deh salî û jortir de guncan jî be ji hêla bêjeyên nenasyar ve ji bo zarokên di temenê şeş salî û jortir de guncan e. Bêje, pir hêsan in û ji ber vê yekê çîrok ji xwînerên di hemû temenan de re guncan e. Di serê çîrokê de nivîskar bi hejmareke zêde teswîr bikaranîne. Teswîr di edebîyata zarokan de divê zêde neyê bikaranîn. Ji ber ku teswîr

tişteki bêtevger e û bala zarokan zêde nakişîne. Divê nivîskar di naverokê de zêde cih nede teswîran.

3.2.7.4. Rexneya lehengan

Lehengên sereke ji zarokan pêk tên. Zarok di nav çalakîyan de ne ku xwezayê biparêzin. Mîmkûn e ku ev rewş bala zarokên xwîner jî bikişîne û ev zarok bêhtir xwe nêzî naverokê bibînin. Ji ber ku naverok, xwedî alîyên xeyalî ne heta asteke mirov dikare ji bo zarokan jî van bûyeran sosret bibîne lê carinan hin zarok di naveroka ji rêze de jî pir hatine îdealîzekirin. Zarok pir piçûk in -şeş salî- lê xwedî agahîyên pir kûr in. Ev di avakirina lehengekî de dibe ku şaşîtiyek be. Ev jî afirandina nivîskar ya îdealîzekirinê ye.

3.2.7.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Naverok, ji têkoşîna parastina xwezayê pêk tê. Alîyekî nezan –mîrovên mezin- li hemberî alîyekî zane –zarok- dixwazin xwezayê têk bibin û wê xerab bikin. Zarok, bi hişmendîyeke bi hez dixwazin wan bisekinînin. Ji hêla peyamdariyê û îmajê ku dixwaze bê avakirin ve berhem serkeftî ye. Ev rewşa ku bi destên zarokan dixwaze bê çêkirin divê ku bandoreke baş li ser zarokên xwîner çê bike. Zarok, xwedî fikrên afirîner in û bi zîrekbûna xwe mezinên ku biryarên xerab didin sekinandin.

3.2.7.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji hêla nêrîna li ser zarokan xwedî taybetmendîyekê ye. Lehengên sereke zarok in û armanca wan parastina xwezayê ye. Kesên mezin dixwazin berfa çîyayekî bihelînin û vê berfê bikin av. Van mezinan berê jî dar û daristanên derdorê hatibûn birîn. Zarok bertekê didin wan û bi ser dikevin. Bi rêya vê niherînê dikare bê gotin ku helwesta zarokan ber bi başîyê ve ye. Herçiqas ev tişteki îdealîze be jî, lehengên zarok bi başî û afirînerîyê tên hûnandin. Ji hêla ziman ve carinan naverok xwedî teswîrên zêde ye û ev rewş di edebîyata zarokan da gelekî nayê bikaranîn. Zarok ji teswîra bêhtir ji tevgeran û ji tiştên bi aksîyon hez dikin lewma divê nivîskar ji vî alî haydar bin.

3.2.8. Stêrka piçûk

Li asîmanan Stêrka Piçûk û malbata xwe mîna sterkên din dijîyan. Dûmanê Reş ji li asîmana dijî û sterkên piçûk diqurpîne. Malbata Stêrka Piçûk, ji stêrkê re dibêjin ku ew ji xwe hayadar be da ku Dumanê Reş wê ji nequrpîne. Stêrka Piçûk, rojeke ji ba malbatê xwe diçe û dixwaze ku çareserîyeke bibinî da ku Dumanê Reş sterkên piçûk bes biqurpîne. Stêrka Piçûk, di rê de li rastî Gerstêrkê te. Gerstêrkê ji dixwaze alîkarîyê bide Stêrka Piçûk. Herdu di rê de du stêrkên piçûk ji Dûmana Reş rizgar dikin. Pêşî xwe digihînin cem Heyva Zêrîn lê heyv dibêjê ku em dibe herin çem Roja Zêrîn. Ew ji diçin cem Roja Zêrîn. Roja Zêrîn ji wan re dibêje ku eger hûn ji ba mezinên xwe dûr nekevin û bibin yek, Dûmana Reş nikare tu kesî biqurpîne. Stêrka Piçûk, ji vê bersivê pir kêf xweş dibe û bi dilxweşî divegere cem mezinên xwe.

3.2.8.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/6 = 16,66$

Lî gorî vê pîvanê ev çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji bo zarokên di temenên yazdeh salî û jortir de guncan e.

3.2.8.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (4/96) * 100 = 4,14$

Xwînerên di temenên şeş salî û jortir de dikarin vê berhemê bi awayeke hêsan fêr bikin.

3.2.8.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Carinan hevokên dirêj hebin jî ji hêla bêjeyên nenasyar ve çîrok ji bo zarokên di hemû temenan de guncan e. Zarok, bêzemetî dikarin ji naverokê fêr bikin û xwendineke herikbar bikin.

3.2.8.4. Rexneya lehengan

Leheng hemû ji cismên asîmanan pêk tên. Bi rêya kesayetkirin û axivandinê leheng hatine afirandin. Lehengên sereke xwedî pîrsgirêkekê ne û dixwazin vê

çareser bikin. Li hemberî xêrxwazan lehengekî nebaş jî heye. Çîrok, bertekê di nav van her du alîyan de dihûne. Lehengê sereke Stêrka Piçûk e. Bi hevalên xwe re alîkarîyê dike û bi ser dikeve. Ji vî alî ve çîrok dikare ji xwîneran re mînakên baş bide û bi piranî di raman û hestên zarokan de erênîyekê ava bike.

3.2.8.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok ji alîyê hevaltî, derûnîya baş û çalakbûna di jîyanê de xwedî nirxeke baş e. Çi ji lehengên çalak û bi bertek çi ji peyama ku dide xwîneran ve be—bi piranî zarok- îmajêke xweş pêşkêş dike. Stêrka Piçûk ku lehenga sereke ye, xwedî armançekê ye û dixwaze malbat û der û dora xwe ji zordarîyê rizgar bike, dikeve nava têkoşînekê û bi ser jî dikeve. Ev encam, ji xwîneran re ji hêla derûnîyêke baş ve gaveke di cih de ye.

3.2.8.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok çi ji hêla ziman û vegotinê ve çi jî ji hêla babet û honakê ve serkeftî ye. Xwînerên zarok dema ku vê çîrokê bixwînin dê ji naveroka wê ya erênî sûd bigirin. Serbilindkirina hevaltî û alîkarîyê bingeha vê çîrokê saz dike û ji hêla wêrebûn û çalakbûnê ve dikare zarokan bi alîyekî baş de meylidar bike. Bêjeyên hêsan rêya fêmkirineke hêsan vedikin û zarok dikarin bi awayeke herikbar naverokê bişopînin û wê fêm bikin.

3.2.9. Rexnaya giştî li ser çîrokên Murad Dildar

Çîrokên Murad Dildar ji hêla leheng, ziman, bikaranîna demê û vegotin taybetmendîyên fablê de ne. Dildar, di çîrokên xwe de bi gelemperî mijarên parastina xwezayê, rizgarkirina walet, berekata axê, têkbirina kesên xerab û afirandina jîyana aramî bikartîne.

Dildar, jînên bihêz û zarokên zîrek û şareza weke lehengan derdixe pêş. Dildar, di hevpeyvîna xwe de jî vê mijarê tîne ziman. Nivîskar, bi awayeke hişmend zarok û jinan dixê roleke erênî û van lehengan di rolên qeç û xêrxwaz de nîşan dide. Ev rewş, dibe ku li ser xwînerên zarok bandorekê erênî ava bike û bi wan re hestên jixwebawerîyê derxîne.

Dildar, dibêje ku pirtûka wî ya bi navê Stêrka Piçûk bo gêncan nivîsîye. Rêjeya dirêjbûna hevokan jî di vê hêlê de ye û çîrok ji hêla dirêjahîya hevokan ve bo xwînerên di temenê yaz deh û jortir re guncan e. Ev rêje, bi armanca Dildar ve paralel e. Çîrok ji hêla bêjeyên nenasyer ve bi giştî xwedî zimanekî sade û hêsan in. Çîrok, ji hêla bêjeyên nenasyarî ve ye bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan nin.

Dildar, di çîrokên xwe de bi giştî honaka aramî-alozî-têkoşîn-aramî bikar tîne. Di çîrokan de du alî hene û yek ji wan hêla baş yê din jî hêla xerab e. Hêla xerab tê û aramîyê xera dike. Kesên ku aramîya van xera dibe li ber xwe didin û dijminên xwe têk dibin. Ev rêbaz û raman di çîrokên gelerî de rêbazekê ku dihate bikaranîn. Vegotina çîrvanok û harmonîya zimên ji bixwere tîne. Naverokên vê rêbazê kevnaşopiya çand û gelan diyar dike û motîfên giring zindî dihele. Dildar vê rêbazê bi bûyerên balkeş re dixê honak. Ev rêbaz; ji hêla naverok, leheng û hwd xwedî afirandinên cuda bin jî alîyekî wan î yek alî jî heye. Şablonên çîrokan xwedî heman herikandinê. Xwîner piştî demeke –herçiqas bûyer û lehen cuda bin jî- wekhevîbûna herikandina fêhm dike û balderîya xweyî li ser çîrokê winda dike. Çîrokên Dildar jî ji ber ku herikandina aramî-alozî-têkoşîn-aramî bikar tîne bo hin xwînerên mimkûnê ku pevajoya xwendin bêmeraq bibe.

3.3. Çetoyê Zêdo û Nirxandina Çîrokên Wî yê Bo Zarokan

3.3.1. Gurê kubar

Gurê Kubar/Gurgîn, gurek e. Dema ku çêlîyeke kesek wî di nav berfê de dibîne û wî rizgar dike. Kesê ku wî rizgar dike wî û radestî hevaleyê xweyî beytar dike da ku wî bas bike. Beytar piştî tedawîyan Gurgîn radestî şaredarîyê dike ku gur berdina nav xwezayê. Lê şaredarî gur radestî baxçeyê ajelên dike. Gurê çêlîk, li ber destên mirovan mezin dibe. Gur, herçiqas di nav şertên xweş de be jî, ji fikrên azadîyê haydar e û dest bi planên rêvê dike. Rojeke, gur ji baxçeyê ajelên ku tê de ye dişînin baxçeyekî din. Di rê de qefesa wî ji maşînê dikeve û Gurgîn rizgar dibe. Gurgîn pir birçî ye û dixwaze zikê xwe têr bike. Ji bo taştê diçe ba beranekî, ji bo firavîne diçe ba hespekî û ji bo şivê diçe ba çêlekekê. Bi wan her sê ajelan re bûyerên balkeş tên

serê Gurgîn û di dawîyê de hin ramanan ji wan bûyerên derdixê û diçe ba koma guran.

3.3.1.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/12 = 8,33$

Çîrok li gorî dirêjbûna hevokan ji bo xwînerên di temenên 8an û mezintir de guncan e. Zarokên di van temenan de dikarin bi awayeke hêsan hevokên vê çîrokê bişopînin.

3.3.1.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=
 $(1/99)*100=1,01$

Çîrok ji hêla bêjeyên ku hatine bikaranîn ve ji bo hemû xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncan e û xwîner dikarin naverokê û peyamên naverokê bi hêsanî fêmkirin.

3.3.1.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Ziman û vegotina çîrokê dûrî peyamên şîretkar, îmaj û wateyên veşartî ne. Nivîskar zimanekî herikbar hilbijartîye û bi awayeke zelal honaka xwe saz kirîye. Hevokên di dirêjahîyeke îdeal de û bêjeyên nenasyar ji bo xwînerên di temenên (şeş salî û jortir) piçûk derfetê dide ku çîrok bi hêsanî bê xwendin û fêmkirin. Bi saya lehengên ku ajel in –yê sereke gurekî çêlik e- monologên navxweyî, rastî û îzafiyeta zarokan bi awayeke serkeftî di ziman û vegotinê de hatîye avakirin. Naveroke zelal, fêmkirina çîrokê zêde dike.

3.3.1.4. Rexneya lehengan

Leheng ji mirov û ajelan pêk tên. Bi vî alî ve dikare be gotin ku ev çîrok xwedî taybetmendiyên fabl û çîrvanokan e. Ev herdu alî, taybetmendî û tevgerên xwe yên jîyana xwe di çîrokê de pêşkeş dikin. Armancên mirov û ajelan di naverokê de hin bi hin xwe didin xuya kirin. Herdu alî jî xwedî peyamekê zelal û xuyakirî ne û imajekê rastîya jîyanê didin xuya kirin. Leheng, di nav guherînan de ne û ev lebat baldariya xwîneran bi awayeke serkeftî dikare bikişîne ser xwe. Li gorî vê çarçoveyê lehengên

çîrokê serkeftî hatine afirandin û li gorî nirxên edebîyata zarokan guncan û serkeftî ne.

3.3.1.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, rastîya ajelên bindest yê di baxçeyên ajelan de dihevine. Vê pîrsgirêke bi awayeke pisporî tîne ziman û xwe naxe nava naverok û vegotinê. Ev serkeftîbûn xwe di honak, ziman û vegotinê de jî dide xuya kirin û berhemê bi naverokeke rexnegir pêşkeşî xwîneran dike. Rastî û îzafîyeta zarokan xwe di nêrîn û dîmenan de dide xuyakirin û peyama xwe digihêjîne xwîneran. Vegotin û zimanê sade ji bo hemû astên xwîneran guncanbûna xwendinê û fêmkirineke hêsan pêşkêş dike. Legeng – Gurgîn- roj bi roj sînorên jîyanê xwe ferq dike û dixwaze azad bibe. Ji ber hin bi hin taybetmendîyên xweyî ajeltîyê fêm dike û dibinê ku dibe jîyanê wî ne wisa be.

3.3.1.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Berhemên serkeftî yên di edebîyata zarokan de divê xwedî ziman, vegotin û ji bilî van xwedî rastî û îzafîyetên zarokan jî bin. Ev rastî û îzafîyet, divê xwedî nihêrîn û ramanên zarokan bin. Divê zarokan fêm bikin û wan bidin fêm kirin. Bi awayeke bêşîret û bêtundeyî divê peyama xwe bigihîjînin zarokan û vê bi zimanekî guncan saz bikin. Çîrok a Gurê Kubar, xwedî van taybetmendîyan e. Ziman, vegotin û mijareke giring bi awayeki pisporî tê hûnandin û pêşkeşî xwîneran dibe. Gurgîn, dema ku azad dibe jîyanê hin bi hin nas dike û xwe adapteyî jîyanê xwezayî dike. Gur, keseyeta xwe nas dike û fêm dike ku dibe xwe ji nû ve biafirene. Divê çarçoveyê de gur/leheng/Gurgîn mimkûnê ji zarokan re bibe mînak ji bo di jîyanê de xwe nas bikin û pîrsgirêkên xwe çareser bikin.

3.3.2. Zozan û gernas

Zozan û Gernas, du leglegên heval in û jîyana xwe parve dikin. Herdu legleg jî di zarokatîya xwe de malbatên xwe winda kirine û bi têna serê xwe mezin bûna. Her du legleg di dema koçberîya demsalê de li rasta hew tîn û dibine heval. Hevaltîya wan dibe evîndarî. Zozan û Gernas, ji bo hêlîneke xwe bibînin li gelek deveran digerin. Ji ber ku sarê nikarin berê xwe nikarin bidine Serxetê, lewma li dora Heskîf,

Çinar û Qerefdaxê digerin. Ji ber ku li Heskîfê bendav bilind dibe berê xwe didine Çinarê. Gernas, ji zimanê mirovan fêm dike û dibîne ku şivanekî baş heya û alîkarîyê dide leglegan. Şivan, ji wan re li ser zinarekî hêlînekê ava dike. Zozan, hekên xwe li vir dike û çêlikan wan çedibin. Îcar Gernas û Zozan, malbateke di nav aramî û kêfxweşîyê de dijîn.

3.3.2.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Çîrok, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên di navbera temenên nehdehan de guncan e. Zarokên ji van temenan piçûktir îhtîmal heye ku carinan di şopandina hevokan de pirsgirêkan bijîn.

3.3.2.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (1/99) * 100 = 1,01$

Ev hejmara ji bo peyvên nenasyar ji bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir de guncanbûna çîrokê dide nişan. Ev rewş derfetê dide xwîneran ku naverokê bi awayeke hêsan û herikbar bixwînin û jê fêm bikin.

3.3.2.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Ziman, li gor asta naverokê û girseya ku çîrok ji wan re tê hûnandin pir guncan û sade ye. Bêjeyên ku hatine bikaranîn bêjeyên rojanê ne û nêzî jiyana zarokên xwîner in. Vegotin jî di vê hêlê de alîkarîyê dide xwendin û fêmkirinê. Îmaj, naverok, peyamên rasterast û yên veşartî bi saya vê vegotina herikbar û sade bi awayeke zelal xwe didin xuya kirin.

3.3.2.4. Rexneya lehengan

Leheng ji mirov û ajelan pêk tên. Çîrok, taybetmendiyên fabl û çîrcanoka dihevine. Lehengên sereke du leglegên hevalê hev in. Çîrok, bi çavên wan tê hûnandin. Ev ajel, çavderî û şiroveyên xwe ji bo mirov û xwezayê tînin ziman. Çîrok, bi saya keda van her du lehengan xwe digihêjîne mirovekî şivan û di naverokê de atmosfereke erênî tê saz kirin. Ev taybetmendîya çîrokê bi saya vê koma lehengan

tê afirandin û ev ji bo xwîneran raman û hestên erênî diafirîne. Dikare bê gotin ku ji bo edebîyata zarokan mînameke serkeftî ye. Serkeftîbûna wê ji têkoşîna lehengên tê. Leheng, bo astengiyên jîyanê li ber xwe didin û bi serdikevin.

3.3.2.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Piştgirî, têkilîya baş ya di navbera mirov, ajel û xwezayê de peyama ve çîrokeke sereke ye. Ev pîralîbûn bi saya vegotin û zimanê herikbar xwe bêhtir dide xuya kirin û fêmkirina çîrokê ji hêla xwendekaran ve hêsantir dike. Xweza, mirov û ajel heyberên di jîyanê de pîr giring in û nivîskar ev heyber bi mijarê ve bi honakeke serkeftî girêdaye. Vegotin û naveroka bi piştgirîyeke yekpar hatine ava kirin, berhemê ji zarokan re yan jî ji xwînerên pîralî re guncan dîkin. Niherîn, rastî û îzafiyeta zarokan bi çavên lehengên sereke tê binyadkirin û çîrok tê asta berhemên zarokan.

3.3.2.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji hêla naverok û vegotinê ve xwedî astên nezi hev in. Naverok mijara piştgirîya mirov û ajelan bi awayeke zelal dide xuya kirin û vê bi saya zimanekî hêsan lidar dixê. Herçiqas carinan hevokên dirêj hebin jî ev rewş ji fêmkirina naverokê re pîrsgirêkê dernaxîne. Vegotin, pêşîya nihêrîna zarokan ya li hemberî dinyaya derveyîn vedike û derfetê dide ku xwînerên piçûk ji peyama naverokê fêm bikin. Çîrok, ji bo xwînerên piçûk ji van hêlên ku tên binavkirin ve guncan e.

3.3.3. Daweta noko û nîskê

Dîk, mirîşk, qaz, werdek, çûk û gur lehengên vê çîrokê e. Noko û Nîskê dizewicin û dawetnameyeke ji Diklan Axa (Dîk) re dişînin. Dîk û havalên vî, dema ku diçine dawetê di rê da gur pêşîyan wan qut dike û wan taveje kîsê xwe lê çûk direvî. Çûk, alîkarîyê ji hevalên xwe çûkan dixwaze. Çûk tên û ajelan ji destên gur rizgar dîkin. Ajel di nav kêfxweşî diçine dawet û şahîyê.

3.3.3.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Çîrok ji hêla dirêjahîyê ve ji bo zarokên di temenên nih-deh de guncan e. Zarokên ji van temenan piçûktir mimkûn e ku di şopandinê de zehmetîyê bikişînin.

3.3.3.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=
(3/97)=3,09

Çîrok, ji hêla peyvên nenasyar ve ji bo zarokên di temenên şeş salî û jortir de guncan e. Zarok, di dema xwendinê de zêde rastî peyvên nenasyar nayên û bi xwendineke herikbar dikarin çîrokê bixwînin.

3.3.3.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok, xwedî zimanekî sade û herikbar e. Bi taybetî zarokên nih-deh salî bi her awayî dikarin berhemê bi awayeke hêsan bixwînin û jê fêhm bikin. Ziman, naverok û peyama çîrokê bi zelalî derdixîne pêş. Bi rêya dubarekirina hin beşan ji ziman bêhtir tê hezkirin û xwendin zindîtir dibe. Vegotin, li gorî diyalektîka zarokan hatîye sazkirin. Zimanê îronîk û nêzî zûgotinokan armonîyeke saz dike û ev bo zarokan alîyekî di cih de ye.

3.3.3.4. Rexneya lehengan

Leheng ji ajelan pêk tên û bi vî awayî çîrok dikeve şêwaya fablan. Ajel bi rêya kesayetkirin û axivandinê bûne karakterên çîrokê. Naverok, bi rastîya xwezayê tê hûnandin û bi awayeke honakî tevger û têkoşîna di navbera ajelan de tên xuyakirin. Ji ber vê yekê naverok, bi saya lehengan xurt û bi hez dibe. Naverokên wisa bi tevger, bala zarokan behtir dikişînin.

3.3.3.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, ji hêla ziman, naverok û lehengan ve tekûz e. Afirandina naverokê û hûnandina bi ziman serkeftî ye û ji xwînerên zarok re guncanîyeke giştî dide. Li gor

hevoksazîyê carinan hevokên dirêj hene ku tenê ji zarokên nih-deh salî re guncan in lê bi giştî çîrok ji alîyê taybetmendîyên edebîyata zarokan ve biserketî ye.

3.3.3.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Him nêrin him jî ziman û bûyerên ku di honakê de hatine afirandin, li gorî rastî û îzafîyeta zarokan e. Di ziman de rêbaza dubarekirinê tê bikaranîn û ev xwendina zarokan hêsan dike. Naverok jî li gorî hiş û ramanên zarokan tê hûnandin, dengên nava serê zarokan û herikbarîya hevokan nêzî hev in. Ev rêbaz, fêmkirina zarokan pirtir dike û xwîner bi hezeke zindîtir çîrokê dixwînin.

3.3.4. Ejderhayê tirsonek

Ejderhayê piçûk, dest bi dibistanê dike û li wê de Mamûyê Piçûk nas dike û dibin heval. Bi hev re demên xweş derbas dikin û hevaltîya wan xurtir dibe. Piştî ku dibistan bi dawî dibe ew jî ji hev dur dikevin. Dê û bavê ejderê piçûk, di xwazin zaroka xwe hînî firînê bikin lê bi ser navekin. Lewma wî li qursa firînê qeyd dikin lê mixabin disa bi ser navekin. Rojeke ejder, pir xemgîn e û rêya daristanê digiri da ku here ba hevalê xwe mamû. Herçiqas bi têna serê xwe ji be ceger dike û diçe. Ji ber ku taybetmendîyeke ejderê piçûk ya behn naskirinê heye li pey behna hevalê xwe mamû diçe. Dema ku nêziîk dibe dibîne ku dînozorên herêma mamûyan dorpeçkirina û dixwazin wan têk bibin û herêma wan ji wan bistînin. Ejderha, bi agirê xwe erîşî dînozorên dike û wan dipekîne. Piştî demeke kin dînozor dîsa erîşî dikin lê ejderhayê piçûk dîsa wan têk dibe û mamûyan rizgar dike. Di vê navberê de malbata ejder jî hatiye herême. Herdu malbat dibine dost û kêfxweşîyekê dijîn.

3.3.4.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji zarokên nih salî re guncan e. Zarokên ji vî temenî piçûktir mimkûn e ku di şopandina hevokên dirêj de zehmetîyê bikişînin.

3.3.4.2. Pîvera peyvên nenasyar

$$[\text{Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)}] * 100 = (4/96) * 100 = 4,16$$

Çîrok, ji hêla hejmara peyvên nenasyar ve xwedî asteke guncan e ku ev ast ji bo xwînerên temenên dikarin bi awayeke hêsan ji naverokê fêm bikin.

3.3.4.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Zimanê çîrokê zimanekî sade û herikbar e. Xwînerên di hemû temanên dikarin ji naverokê fêm bikin û bigihêjin peyama gotinê ku nivîskar dixweze bîne ziman. Ziman, hestên lehengan bi awayeke serkeftî tîne ziman û xwîner, ji hêla zimanê sade dikarin naverokê bi hêsan fêm bikin. Vegotina sade fersendê dide ku xwîneran zarok, ji xwendinê kêfê bistînin.

3.3.4.4. Rexneya lehengan

Hemû leheng ji ajelên ku nîfşên wan qeliya ne pêk tên. Ev bijartin dide xuya kirin ku nivîskar dixwaze vê mijarê bixe nav hişê xwîneran. Ajelên ku ji mamû, ejderha û dînozorên pêk tên carinan di nav dijminatîyê de bin jî, bi piranî bi hevdu re dost û hogir in. Hin leheng hêj di temenên piçûk de ne û nasîna dinyaya derveyî bi rêya kesên malbatê lidar dixin. Bi saya vê yekê, zarokên xwîner jî ji pirs û tirsên serê xwe re dikarin çaresarîyan bibînin. Leheng, di asta ku zarok ji wan fêm bikin û sûd bigirin de hatine afirandin û serkeftî ne.

3.3.4.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok ji hêla ziman ve pir sade û herikbar e. Xwînerên piçûk dikarin bi hêsanî ji bêjeyan fêm bikin û bigihîjin peyama naverokê. Carinan hevokên dirêj hebin jî ev bi rêya guncanbûna bêjeyên sade dikare be têkbirin û xwînerên piçûk ji dikarin peyamê fêm bikin. Vegotin bi nihêrîna zarokan ve girêdayî ye û çavdêriya zarokan di naverokê de cih girtiye. Nivîskar ev frekansa ziman, nêrîn û derûnîya zarokan di çîrokê de bikaranîye.

3.3.4.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok ji hêla amûrên mîna ziman û naverokê ve xwedî nihêrîn, rastî û îzafiyeta zarokan e. Nivîskar, di vegotinê de jî ev pêwîstiyên sereke li ber çavan girtine û çîroka xwe li gorî van saz kirîye. Hevaltî, dostanî, alîkarî, piştgirî û carinan dijminatî bi awayeke tematîk bikaranîye. Ev mijar, di jîyana zarokan de tiştên sereke û giring in. Nivîskar li gel van mijaran mijarên nifşqelandin, kêmarî û ajelan jî di naverokê de dihûne û van bi awayeke giştî dixê nava nivîsarê. Ev peyamên ku bi zimanekî sade hatine îfadekirin bo zarokan mijarên sereke ne û pêwistin ku zarok wan bixwînin.

3.3.5. Rexnaya giştî li ser çîrokên Çêtroyê Zêdo

Çîrokên Çêtroyê Zêdo, ji hêla zimên ve xwedî standardeke cih girtî ne. Çîrokên ji hêla dirêjahîya hevokan ve bo temenên heşt-nih ji hêla bêjeyên nenasyarî ve jî bo xwînerên di temenên şeş salî û jortir re guncan nin. Herçiqas di nava herdu qadan de cudabûn hebe jî zimanê çîrokên pir sade û hêsan e. Xwînerên piçûk bêpirsgirêk dikarin çîrokan bixwinin û naverokan van fêhm bikin. Weke ku Zêdo di hevpeyvîne de anî ziman, çîrokên wî xwedî diyalog û zimanekî îronîk in. Ew rewş, rê dive ku xwîner ji xwendina van çîrokan keyfê bistinin. Bêjeyên çandî, zimanê xwedî armonî û herikbar taybetmendiyên zimanê Zêdo ne.

Naverokên Zêdo, bi lehengên guherînbar û bûyerên balkişener xwedî ramanên afirener in. Çîrokên ji mijarên mîna parastina xwezayê, têkilîya mirov û ajelan, daxwaza azadî û aloziyên ku leheng wan dijîn. Di naverokê xwîner di pevajoya xwendine de hin bi hin ramanên peyamê dikare fêhm bike û ji xwe re rêyake ava bike. Pirsgirêkan ku bi saya lehengên ajel tîn qalkirin, pirsgirêkên ku di jîyana mirovan de ne jî. Ev pirsgirêk bi zimanekî îronîk tîn nivisandin. Xwîner, bi rêya honakê dikarin di hişên xwe de pirsyarîkirinê bikin. Leheng, ji aloziya bi saya hişmendîya xwe rizgar dibin û ev hêza naverokê ya li ser xwîner zêde dike. Herweha Zêdo, di çîrokên xwe de navên mekanên rastî (Mêrdîn, Amed, Heskif...) bikar tîne û ev bo erndnigarîya kurmancî jî hişmendîyekê çêdike. Mijarên mîna Bendava Heskîfê û ajelên ku tovên wan qelîyana bi awayeke serkeftî tê qalkirin. Ev mijarên xwezayî bi alîyekî bêşîretkar tê honakkirin.

3.4. Berfîn Ayşe Ögüt û Nirxandina Çîrokên Wê yên ji Bo Zarokan

3.4.1. Dara pîroz

Zerya, dê û bavê wê û pisîka wan Rindê malbateke di nav aramî û kêfxweşiyê de dijîn. Zeryaya neh salî rojeke nexweş ket û zikê wê diêşîya. Dema ku dê û bavê wê fêmkirin ku qîza wan baş nabe ew birine nexweşxane. Bijîşk got ku nexweşîya wê sivik e. Le bijîşk got divê Zerya mişmişên bêhormon û bêderman yên xwezayî bixwê. Bavê Zerya, li sûkê hemûyî digere lê mişmişin bêhormon û bêderman nabîne. Dikandar dibêje ku mişmişên visa tenê li xwezayê dikare bibîne. Zerya, xewneke dibîni û dibêje dareke pîroz heye. Dema ku ji xew dirabe, ji dêya xwe re dibêje. Dêya wê dibêje darên wisa li nêzî gundê xalê wê heye. Dê, li birayê xwe digere û mijarê jê re dibêje. Xalê Zerya, ji Zerya re mişmişên dişîn û Zerya piştî xwarina wan baş dibe. Piştî ku Zerya baş dibe ew û dêya xwe diçine gunde xalê xwe û ji bo spasîyê darê av dide. Dê û Zerya bi kêfxweşî vedigeverin mala xwe.

3.4.1.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok, ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji bo zarokên temenê wan nihan û mezintir guncan e.

3.4.1.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[\text{Hejmara Peyvên Nenasyar (a)} / \text{Hejmaran Peyvên Nasyar(b)}] * 100 = (2/98) * 100 = 2,04$

Ev pîvan dide xuyakirin ku çîrok ji bo xwînerên di temenê şeş salî û jortir de guncan e û zarok jî dikarin bi awayeke hêsan ji vegotinê fêhm bikin.

3.4.1.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok ji hêla ziman û vegotinê ve pir zelal û herikbar e. Xwînerên di hemû temenan de dikarin bi hêsan di naverokê de têbigihin û îmaj, peyam û honaka giştî fêhm bikin. Vegotin, naverokê bi awayeke serkeftî dide xuyakirin. Peyvên ku hatine bikaranîn li gor asta lehengan in û wan serkeftî pêşkêş dikin.

3.4.1.4. Rexneya lehengan

Bûyer, li der û dora keçeke piçûk dizîvire. Honak û peyama çîrokê li gorî tevgerên vê lehengê pêk tên. Lehengên din yên berhemê xwedî rolên hişmend in û ji bo bingeha çîrokê bi rêk û pêk rolên xwe dibin serî. Lehengê sereke, xwedî nêrîneke zarokatîyê ye û ev ji bo rastî û îzafiyeta zarokan guncan û serkeftî ye. Bûyer di navbera rastî û xeyalîyê de derbas dibe û lehengê sereke di nav van herdu cihan de xwedî cihekî giring e. Nivîskar, bi çûyîn û hatina di navbera van cihan de naverok bi hez kirîye û bala xwîneran dikişîne.

3.4.1.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Nivîskar bi piranî bi saya lehenga xwe ya piçûk naveroka xwe hûnandîye. Mijar li ser nexweşîya vê lehenga piçûk e û gav bi gav naverok bêrfirehtir dibe, digihêje armanca xwe ya sereke ya li ser xwezayê. Parastin û nêzîkbûna xwezayê, tendirustîya ku xweza dide herkesî û nihêrîna li ser xwezayê bi têkilîyên xurt yê malbatê re tên hûnandin û nivîskar peyameke bi erênî dide xwîneran. Ev sernava ku tê qalkirin bi giredaneke qewîn gav bi gav tê nivîsîn û çîrok tê afirandin. Têkilîya xweza û mîrovan bi saya lehengê piçûk pêk te. Zarok, bi awayeke dilxwaz nêzî xweza û tiştên xwezayî dibe û jê sûd werdigire. Ev encam peyama çîrokê xurt dike.

3.4.1.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji bo xwîneran xwedî du peyaman e: Xweza û têkilîyên malbatî. Ev her du peyam bi awayeke xurt tên xuyakirin. Ev herdu mijar ji bo zarokan jî mijarên sereke ne. Yek ji bo pêşveçûna derûnî yek jî ji bo jîyan û cihaneke bi tendirustî. Zarokên ku vê naverokê bixwînin dibe ku ji van peyaman sûd bigirin û di jîyana xwe de pêk bînin. Nivîskar van peyaman bi rêya lehengan tîne ziman û xwe di naverokê de nade xuyakirin. Ziman û vegotina çîrokê bi giştî ji bo hemû temenan guncan e. Hevok û bêjeyên sade guncanbûnê diafirîne ku xwîner bi awayeke hêsan ji naverokê dikarin fêhm bikin.

3.4.2. Kewên gozel

Li deşta Mûşê, du kewên heval bi navê Dengxweş û Rengxweş hebûn. Ev herdu kew, di deşta xweş de xwedî jîyaneke xweş bûn. Rojeke, Dengxweş biryar da ku ji hêlînê bifire û biçe cih û warên nû. Herçiqas Rengxweş xwest ku wê ji vî fikrî sar bike jî Dengxweş li ser biryarê sekinî û rojeke ji hêlînê firi û xwest bahra li piştî Çîyayê Sîpanê bibîne. Dengxweş piştî qederekî dûrket li rasta baraneke xurt hat. Kew, xwe bi zore ji vê baranê rizgar kir û rêya xwe berdewam kir. Lê dîsa di deme baranê de hinekî poşman bû ku ji hêlîn û hevalên xwe dur keti bû. Piştî demeke vê care jî qertelekî da dûw Dengxweş. Qertel, hindik mabû ku kew zemt bike lê di vê qelîyê de qertel berê xwe da berxikeke û Dengxweş rizgar bû. Poşmanîyê wê disa hat bîra wê lê rêya berdewam kir. Cara dawî, Dengxweş pir birçibû bû û xwest zikê xwe têr bike. Dema ku li erdê genim dît xwe limz kir û xwe li ba Kewên Gozel deyna. Lê gava ev genim ji bo dafikê bû û Dengxweş ji hat girtin. Dengxweş nerazî bûna xwe ji Kewên Gozel re got ku çima ew hişyar nekirîyê. Kewên Gozel, got ku kesê ji xwe hayadar nemînê dawîya wî ev. Di dawî de Kewên Gozel ji lingê xwe yî giredayî nîşanî Dengxweş kir û bêçareserîya xwe da xuya kirin.

3.4.2.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/8 = 12,5$

Çîrok, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên di temenê deh-yaz dehan de guncan e. Zarokên ji van temenan piçûktir dibe ku di pêvajoya xwendinê de pirsgirêkan bijîn.

3.4.2.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (1/99) * 100 = 1,01$

Ev pîvan dide xuya kirin ku berhem ji bo xwînerên di temenê şeş salî û jortir de guncan e. Bêjeyên ku wateyên wan ji hêla zarokan ve giran bin di asteke pir hindik de ne. Xwînerên piçûk bi awayeke hêsan dikarin naverokê fêm bikin.

3.4.2.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok ji hêla bêjeyên nenasyar ve hêsan û xwerû bejî, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên di temenên deh-yaz dehan de guncan e. Li gorî asta naveroka çîrokê divê hêvokên wê hinekî din ji hêla bêjeyan ve kurttir bin. Bi vî şiklî zarokên di temenê piçûk de dikarin bi awayeke hêsan naverokê bişopînin.

3.4.2.4. Rexneya lehengan

Leheng ji du ramanên ku li dijî hev in pêk tên. Ev raman bi rêya du kewên hevalên hev tê hûnandin. Alîyekî vê îmajê nûjenî û afirandinê dixwaze alîyê din xwedî hêleke kevneşop û statîk e. Herdu leheng, bi tevger û gotinên xwe vê nasnameya xwe diyar dikin. Eger armanca nivîskar “Mîrov divê di nav sînorên jîyana xuyayî de tevbigere.” be, divê ku ev naverok ji bo zarokan ne guncan be. Lehengê ku kevneşopîyê diparêze ji bo zarokên hêvîdar û xeyalperest re ne mîna keke ku bên erê kirin.

3.4.2.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, ji alîyekî xwe ve şîretkar e. Nivîskar naveroka xwe li ser du kewên heval afirandîye û têkilîyên wan hûnandîye. Nivîskar peyamê dide ev e ku dibêje eger hûn ji bo raman û tevgerên nû ji hêlîna –raman û tevgerên xwe yên ku hûn tê de ne- xwe bifirin, hûn dê di jîyana xwe de alozî û xerabîyan bibînin. Ev peyam, ji bo ramanên edebîyata zarokan peyameke diwar e û herweha ji bo çalakbûn û afirandîna zarokatîyeke serkeftî xerab e. Peyamên wisa dûrî rastî û nûjenîya zarokan divê di naverokan de cih negirin.

3.4.2.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, herçiqas ji hêla ziman û hevoksazîyê ve ji bo xwînerên zarok bi piranî guncan be jî, ji hêla naverokê ve ji bo nîrxên edebîyata zarokan xwedî pîrsgirêkê ye. Çîrok xwedî hêleke şîretkar e û ev ji bo zarokan munasib nayedîtî. Naverokên edebîyata zarokan herçiqas mijarên biêş û zordarî û giring ji xwe re bikin behs jî divê vegotin ne şîretkar û kevneşopî be. Di vê çîrokê de, naverok li ser kevneşopîye hatîye

hûnandin û di dawîya naverokê de nûjênê û ramanên afirîner tîrî cezakirin. Peyameke wisa divê di edebîyata zarokan de neyê bikaranîn.

3.4.3. Xezal û qertel

Xezal û Qertel tevî karxezal û çêlikên xwe du ajelên dost bûn. Li der û dora Gola Wanê û Çîyayê Sîpanê dijîyan. Xezalê li zozanan, Qertel jî di Gola Wanê de nêçîra xwe dikirin. Piştî ku kar û barên xwe diqedandin dihatin ba hev û şevbuhêrka xwe dikirin. Pir hez jî hev dikirin. Rojeke Xezalê xwest cihên nû nasbike hin bi hin jî nêzî hêlîna xwe dûr ket, ber bi Desta Mûşê ve diçû. Qertel, hevala xwe dît û xwest wê bişopîne. Qertel, difikirî ku Xezal cihên xweş nas dike û ew bixe jî bi vê sayê yê cihên nû bibîne. Qertel, demeke dirêj Xezal şopand. Demek derbas bû û Qertel li ser rû erdê nêçîrvanekî ku bêrê tifînga xwe dayîye Xezalê dît. Xezalê ev nêçîrvan nedidît. Qertel bibilêz çû bi ser nêçîrvan. Nêçîrvan dema ku Qertel dît berê tifînfê da wî û pijilîn lê ket. Qertel birîndar bû lê Xezal jî revîya û çû. Piştî demeke kin Qertel û Xezal hatin cem hev. Qertel jî ber ku nikarî bû zêde bifire li ser piştê Xezalê siwar bû çûna cihên xwe û jîyana xwe bi hevaltî berdewam kirin.

3.4.3.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/9 = 11,11$

Çîrok, jî hêla dirêjbûna hevokan ve jî bo zarokên di temenên neh-dehan de guncan e.

3.4.3.2. Pîvera peyvên nenasyar

$[Hejmara\ Peyvên\ Nenasyar\ (a)/Hejmaran\ Peyvên\ Nasyar(b)] * 100 = (4/96) * 100 = 4,16$

Li gor vê pîvanê çîrok, jî bo astên xwînerên şeş salî û jortir de guncan e. Xwînerên zarok dikarin bi awayeke hêsan naverokê bişopînin.

3.4.3.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Vegotin û ziman bi hevdû re jî bo xwînerên zarok pir xwerû û zelal hatîye hûnandin. Naveroka çîrokê bi saya van herdu amûran bi hêsanî tê nişandan û peyama çîrokê bi zelalî dikare bê dîtin.

3.4.3.4. Rexneya lehengan

Ji ber ku çîrok, bi teşeyê fablê hatîye afirandin, lehengên sereke ji du ajelan pêk tên. Teyger û têkilîyên van ajelan li ser hevaltî û piştgirîyê tên sazîkirin. Ev peyama ji bo edebîyata zarokan giring e û hevhestîyê derdixe holê. Wekî din jî di hişên zarokan de aramî û erênîyê diafirîne. Piştgirîya ajelan di naverokê de hezekê dînamîk ava dike û bi vê dînamîzmê naverok jî hêla xwînerên zarok ve balê dikişîne.

3.4.3.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Çîrok, li gorî naverok, bêjeyên ku hatine bikaranîn û asta girîftbûna mijarê dide xuyakirin ku ji bo zarokên temenpiçûk hatîye hûnandin. Zarokên ku ji asta îmajên xeyalî derbasbûne û bi nêrîneke rastî li dinyayê dinîhêrin divê ku vê naverokê balkeş nebînin û kêf û sûde ji çîrokê nestînin. Ev rewş sînoren hejmara xwîneran jî dide xuyakirin.

3.4.3.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafîyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji hêla ziman, vegotin û naverokê ve xwedî asteke sade ye. Xwîner dikarin bi hêsanî ji armanca peyama berhemê fêhm bikin û wê şîrove bikin. Çîrok, bi peyamekê veşartî ramanekê ava dike û dibêje ku divê kes jî sînoren xwe yên ku di nav aramîyê de ne dernekeve. Dema hin kes derkevin dibe ku pirsîgîrêk û alozî be serên wan. Ev peyama, dibe ku ji bo zarokên jîyana derveyî hêj nû nasdikin tirsan çêbike.

3.4.4. Şînmorîka zînê

Zînê keçekê heft salî bû. Zînê, rojek bihar xwest here kulîlkan bide hev. Sêlîka xwe hilgirt û çû bêr bi şînahîyan ve. Morîkên xweyî şîna di stûyê wê de bûn. Ji xwe re kulîlk dan hev û bo vexwarin nêzî kahnîyekê bû û xwe bi ser kaniyê de tewand û morîkên wê qetîyan û ketin nav kahnîyê. Zînê, ji bilî morîka şîna, morîkên xwe yî din jî kahnîyê derdixe. Di wê gavê de çûkêk tê û şînokê direvîne. Zînê çî dike çî nake nikare şînoka xwe bi dest bixe. Zînê, hawara xwe gihand şîvanekî lê şîvan got tenê Feqîyê Teyran dikare alîkarîye bide wê. Zînê li hespê xwe siwar bû û çû Feqîyê Teyran bibîne. Zînê dema ku Feqîyê Teyran dît, meseleya xwe jê re got. Feqî, gazî

Mîrê Teyran kir. Pîrsgîrêka Zînê jê re got û xwest Mîr vê mesele çareser bike. Mîr, civana teyran li dar xist û xwest ku morîka şîn bê dîtîn. Piştî demeke morîka Zînê hat dîtîn û Zînê bi keyfxweşî vegerîya malê.

3.4.4.1. Pîvera dirêjahîya hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): $(a)/(b) = 100/9 = 11,11$

Çîrok, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên di temenê neh-dehan de guncan e.

3.4.4.2. Pîvera peyvên nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]*100=
 $(5/95)*100=5,26$

Çîrok, bi pîvanê re dide xuya kirin ku ji hêla bêjeyên nenasyar ve ji bo zarokên di temenê 10-12an de guncan e.

3.4.4.3. Guncanbûna ziman û vegotinê

Çîrok, ji naverokê ve herçiqas aşîkâr be ku ji bo zarokên di temenê piçûk de ye jî, ji hêla hevok û bêjeyan ve ji bo zarokên temenê wan dih û mezintir re guncan e. Ev rewş dibe ku alozîyeke derxîne. Aloziya pêşî ev e ku naverok hêsan e û ji ber vê yekê divê ku tenê zarokên di temenê piçûk de bixwazin vê çîrokê bixwînin. Lê dema ku vê bikin çîrok ji hêla şêweyê ve mimkûne bo wan giran be. Aloziya din jî ev e ku zarokên ku ev hevok û bêje ji bo wan guncan in jî mimkûn e ku naverok ji bo wan ne balkêş be. Di çîrokê de carinan lehenga piçûk helbestan dixwîne. Ev herçiqas ji bo ziman û vegotinê pîralîyek jî be naveroka helbestê li ser asta lehengê ye û ev ji bo naverokeke serkeftî pîrsgîrêk e.

3.4.4.4. Rexneya lehengan

Lehengên sereke keçekê piçûk, teyrê tawûs û Feqîyê Teyran e. Çîrok, li ser têkilîya van pêk tê. Lehenga piçûk xwedî zimanekî xurt û bihez e. Lê dema ku temenê lehengê û hevokên wê tînin bal hevdû ev pîrsgîrêkek e. Zarokeke di vî temenî de nikare naverokeke wisa dewlemend biafirîne. Di vir de nivîskar, li şûna lehengê xwe ve naverok afirandîye û ew bixwe peyivîye. Leheng îdealîze kirîye. Hebûna

teyrê tawûs û Feqîyê Teyran ji hêla folklor, çand û zimanê kurdî alîyekî bi nirx e. Nivîskar dixwaze bi saya vê çîrokê ev alîyê dewlemend jî bide nişan. Lê herçiqas wisa jî be, têkilîya wisa ku zêde nehatîyê hûnandin ji bo xwînerên piçûk dibe ku ji hêla fêmkirina naverokê ve pirsgirêkan derxîne.

3.4.4.5. Dîyardeyên ku hatine bidestxistin û rexnekirina çîrokê

Nivîskar bi bijartina mijarê xwestîye ku nêrîn, rastî û îzafiyeta zarokan di naverokê de biafirîne. Heta asteke ev saz kirîye û ji hêla lehenga piçûk ve pirsgirêkek afirandîye. Lê dema dixwaze çareserîyê bibîne ji asta ziman dikeve nav û ji asta lehengekî zarok derdikeve û paşê dikeve qada kesên mezin de. Çîrok, ji naverokê ve xuya ye ku ji bo xwînerên piçûk hatîye nivîsandin lê carinan ziman, vegotin û hevokên ku hatine bikaranîn dûrî vê astê ne. Dema ku ji bo zarokan çîrokek tê afirandin divê ku çîrok ji hêla hevoksazî û tiştên din yê li ser ziman xwedî wekhevîyê be. Lê di ve çîrokê de standartek nehatîye girtin.

3.4.4.6. Rexneya giştî û babeta çîrokê û rastî û îzafiyeta zarokan di çîrokê de

Çîrok, ji çand, ziman û dîroka kurdî ve xwedî naverokên bi nirx in. Ev nirxbûn bi rêya leheng û axaftina lehengan hatîye afirandin. Lê dema ku ji hêla teknîk û rêbazê ve em li çîrokê -li gorî nirxên edebîyata zarokan- binêrin ji hêla naverok û ziman ve xwedî çend pirsgirêkan e. Naverok herçiqas ji bo xwînerên piçûk jî be di gelek cihan de bêjeyên ji asta zarokên vî temenî re giran bin hene û berhem hevokên dirêj dihewîne. Ev ji bo fêmkirina hevokan pirsgirêkek e. Wekî din, peyvên hin lehengan dûrî qabilîyeta leheng in û di asteke jortir de ne. Herçiqas rastî û îzafiyeta zarokan di tevahîya çîrokê de hebe jî carinan nivîskar, li şûna lehengan ve mudaxeleyî naverokê kirîyê û herikbarîya naverokê bi armanca fikrên xwe berdewam kirîye.

3.4.5. Rexnaya giştî li ser çîrokên Ayşe Berfîn Ögüt

Hemû çîrokên Ögüt yê ku hatine rexne kirin, ji hêla dirêjahîya hevokan ve bo xwînerên di temenên nih salî û jortir de guncan in. Heman çîrok ji bilî yekê yê din ji hêla bêjeyên nenasyar ve bo temenên salî û jortir de guncan in. Çîrokan din

(Şînmorîka Zînê) ji hêla bêjeyên nenasyarîyê ve bo temenê nih salî û jortir de guncan e. Bo zimanekî serkeftî nêzîkbûna van rêjeyan giringe. Berhemên bo xwînerên di temenên piçûk de dibe rêjeyên dirêjahîya hevokan û bêjeyên nenasyar kêmbin da ku xwîner, bi awayeke hêsan naverokê fêmbikin. Çîrok, ji hêla çîrvanokan vê hatîye nivisandin û ev xwendineke herikbar saz dike. Zarokên di temenên nih salî û jortir de de ji hêla vegotinê ve bêpirsgirêk dikarin çîrokan bixwînin.

Çîrokên Ögüt; mijarên xwezayê, hewaltî, giringîya malbatê, piştgirî, azadî, nîrxên kurmancî hwd. di hewînê. Ögüt, bi rêya honakên xwe erdnigarîya kurmancî tînê ber çavan û motîfên ziman derdixe pêş. Nivîskar dixwazê hişmendîyekî ziman û çandê derxine pêş. Ev, heta asteke dikare be erênîkirin lê dema ku ev be kirin dibe naverok, leheng û ziman di nava têvgerêke nêzî hevdû bin. Di çîroka Şînmorîka Zînê de lehengê bi navê Zînê, qîzeke piçûk e lê helbestên ku dixwîne li gorî asta wê gelekî bilind in. Zarokeke di vî temenê de xwedî vê astê ne jî rêze ye. Zarokên dikare afirener û çalak bê lê têvgerên bi vî şiklî ne guncan e. Leheng zêde îdealîze hatîye afirandin. Ev, ne keseyeta zarok e, keseyeta ramanên nivîskar in.

Nivîskar, di pirtûkên zarokan dikare mijarên neteweyî, zanistî, civakî, olî hwd dikarin bo naverokên xwe bikarbînin lê dema ku ev bê kirin divê ku nivîskar wan mijarên bi awayeke afirener binivîse. Vegotîna û bûyer dibe bala zarokan bikişîne û naverok bi têvger be.

3.4.6. Hin statistîkên li ser çîrokan

Di vê beşê de hin jêderên li ser çîrokan bi rêya rêje û sernavkirinê tên nîşandan.

Çarçove 2. Dirêjayîya Hevokan

Berhem Niviskar	Dirêjbûn 100/hejmara Hevokan	Li Gorî Dirêjbûna Hevokên Asta Xwîner	Nenasî (Peyvên giran/peyvên din)x100	Li Gorî Peyvên Nenasyar Hevokên Asta Xwîner
Şînmorîka Zînê Ayşe Berfîn Öğüt	$100/9=11,11$	9-10	$(5/95) \times 100=5,26$	10-12
Şingeşing Nejla Öztürk	$100/8=12,5$	10-11	$(7/93) \times 100=7,52$	14-16

Çîrokên ku ji hêla dirêjî û bêjeyên nenasyarî ve xwedî senkron, di çarçoveya jor de tên nîşandan. Di çîrokan de ev herdu pîvan divê di nav wekhevîyê de bin.

Çarçove 3. Mijarên Berheman

Berhem	Mijara Sereke	Berhem	Mijara Sereke
Astronot Rodî	Armanca jîyanê	Qesra Spî	Rizgarkirina Welat/Axê
Basiko	Alîkarî	Dara Sêvê	Çavbirçîtî
Kîşzer Xanım	Heyf/Tol Hilandin	Gola Şîr	Neyartî/Hevaltî
Marê Piçûk	Parastina Xwezayê	Kanîya Zêrin	Îşgal/Îlhak
Serfirazîya Qafreş	Maf Sitandin	Kurmên Reş	Îstîla
Şingeşing	Maf Sitandin	Marê Sor	Îşgal/Zordarî/ Rizgarî
Welatê Kûlîlkan	Îşgal/Îlhak	Çîyayê Spî	Parastina Xwezayê
Xalxaloka Xeydok	Danûstana bi Civakê re	Stêrka Piçûk	Rizgarî
Kesper	Alîkarî	Gurê Kubar	Azadî/Rizgarî
Paşayê Qelew	Tendristî	Zozan û Gernas	Xweza/Alîkarî
Pirtika Berfê	Xweza	Daweta Noko û Nîskê	Tirs/Rizgarî
Berxnaz	Xweza-Newroz	Ejderhayê Tirsonêk	Hevaltî/Rizgarî/Azadî
Bêsebir Buna Pirtik	Şîret	Şînmorîka Zînê	Alîkarî
Pelşîn û Koçer	Alîkarî-Xweza	Xezal û Qertal	Tendristî/Xweza
Şahkeran	Bindestî-Xapandin	Kewên Gozel	Tifak/Şîret
Xeleta Kosî	Parastina Xwezayê	Dara Pîroz	Hevaltî/Nêçîr

Çîrokên qada edebîyata zarokan divê ku xwedî mijarên pîralî û cuda bin lê di berheman de piranî mijarên nêzî hev hatine hûnandin.

Çarçove 4. Lehengên Çîrokan

Ajel	Ajel Mîrov	Mîrov	Efsunî/Xeyalî	Xweza-Mîrov	Amûrên Din
10	9	3	8	1	1
% 31,25	% 28,12	% 9,37	% 25	% 3,12	% 3,12

Di çîrokan de leheng bi piranî ji ajelan pêk ten û ev mimkun e ku bala zarokan piştî demeke ji çîrokê dûr bixe.

Çarçove 5. Cureyên Berheman

Fabl	Fabl-Çîrok	Çîrok	Çîrvanok (Mesel/Masal)	Fantastik
8	9	11	9	1
% 25	% 28,12	% 34,375	% 28,12	% 3,12

Cureyên çîrokan piranî ji fablan pêk tên. Herçiqas ev rewş bi pîvanan re ne hatibe dorpeçkirin jî ev bo piralîbûnê ne helwesteke erênî ye.

ENCAM

Di encama xwendinên teorîk yên qadê de 32 çîrokên çar nivîskaran hatin xwendin û ev encamên giştî hatin bidestxistin.

Çîrok, li gor tesbîtên zimanî bi piranî ji bo zarokên di temenên piçûk de hatine nivîsandin an jî armanc ev e. Di vê armancê de eger hevok, hevoksazî û peyvên ku ji bo zarokan hatine bikaranîn ji hêla fêmkirinê ve zordariyê derxin divê neyên bikaranîn. Lê di analîzên çîrokan de carinan li dijî vê rêzikê bikaranîn hene. Di hin çîrokan de senkronîzasyona vê rewşê li ber çavan nehatîye girtin.

Mijarên edebîyata zarokan divê ji hêla naverokê ve piralî bin. Mijarên ku bala zarokan dikişînin divê bên hûnandin û mijar nêzî hest, nêrîn, raman, pêwîstî û daxwazên zarokan bin. Di analîza çîrokan de ev tê xuyakirin ku naverok bi piranî mijarên dûrî demên modern hene. Di edebîyata zarokan de ji hêla mijaran ve piranîyê mijaran dikare bê bikaranîn lê mijar, divê lehengan an jî ramanan li hemberî hev dijar neke û aloziyên zarokan/xwînerên bi fikrên afirîner çareser bike. Mijarên mîna dibistan, tundîya zarokan li ser zarokan, pîrsgirekên malbatî, debar hwd nehatine bikaranîn.

Di edebîyata zarokan de lehengên ku tên bikaranîn divê nêzî jîyana zarokan bin û di jîyana wan de cihekî balkêş bigirin. Bi vê rêyê, leheng dê di nêrîna zarokan de cihekî binirx bigirin û ji bo pêşveçûneke ramanî û hestî dê gav bên avêtin. Di analîza çîrokan ya ji hêla lehengan ve de tê xuyakirin ku çîrok dûrî vê sernavê ne û bijartina lehengan bi piranî bi rêya ajel û lehengên din hatine afirandin. Bikaranîna ajelên bo piralîbûna naveroka pêwîstê lê ajel bi rêjeyeke bilind tenê bikaranîn. Ev rewş mimkûn ku têkilîya zarokan bi naverokê ve kêmbike û zarok raman û hestên di naverokê de dûrî xwe bibinin. Lehengên ku ji bilî ajelan jî divê bi rêjeyeke bilind bên afirandin.

Edebîyata zarokan divê ji hêla cûreyên berhemana ve piralî be ku zarokan ji gelek hêlan ve bi pêşve bibe. Her cûre, xwedî taybetmendîyeke cuda ye û ev ji bo fêrbûna zarokan ya piralîbûnê ve pêwîst û giring e. Berhemên ku hatine analîzkirin bi

piranî ji fabl û çîrvanokan pêk tên. Jîyana rastî ji divê di berhemên zarokan de ji xwe re cih bibinin.

Di hin berhemên de şîret tên bikaranîn. Şîret (pend), dûrî afirînerîyê ne û ji bo naveroka pirtûkên zarokan divê neyên bikaranîn. Bikaranîna şîretan, zarokan ji eşqa xwendine dûr dixîne û wan ji xwendinê sar dike.

Carinan di hin berhemên de mijarên ku bala zarokan dikişînin hebin jî piranîya berhemên li ser mijarên mîna xweza, ajal, pirsgerêkên welat û welatîyan ava dibin. Bêguman ev mijar hemû caran ji bo hemû zarokan ne mijarên balkêş in.

Di hin berhemên de teswîr bi hejmareke pir tê bikaranîn. Bikaranîna teswîran di jîyana zarokan de cihekî zêde nagire. Ji ber ku zarok bêhtir bala xwe didin tevger û lebatê. Naverokeke bi teswîr, bê tevger û lebat e û zarok ji dil bala xwe nadin van berhemên bi vî rengî.

Leheng, bi pîranî ji ajal, amûr û karakterên derveyî mirovan pêk tên. Bêguman, nivîskar di afirandina karakteran de azad e û li gorî naveroka xwe dikare lehengan biafirîne lê li gel vê yekê di edebîyata zarokan de leheng çiqas nêzî zarok û hestên zarokan bîr afirandin ji bo xurtbûn û heza qadê baştir e. Zarok, divê xwe di lehengan de bibînin û xwe weke wan hîs bikin. Ev rewş, dikare têkilîya di navbera zarok û berhemê de bi hêztir bike.

Di edebîyata zarokan de divê ajal, parçeyên xwezayê û hwd. xwedî taybetmendiyên xwe bin û ev divê ne bi nêrîna mirovan bîr afirandin. Ev nihêrîn carinan xwedî alîyên tund û reşbîn in. Dema ku zarok van xwendinan dikin di ramanên xwe de mimkûn e ku neyartîyê li hemberî van tiştan bikin. Nivîskar, divê ji vê nuansê haydar bin. Di Serfirazîya Qafreş de kûçik, di Kîşzer Xanim de rovî, Marê Piçûk de zarok, di Qesra Spî de mar, di Kurmên Reş de kurm, Gola şîr de qertel, di Marê Sor de mar, di Ejderhayê Tirsonê de dînozor û di Kewên Gozel de kew ji hin hêlên honakê ve mimkûn ku ji alîyê zarokan ve ev ajelên ku tên qalkirin xerab bîr dîtin.

Ji bo zarokan bikaranîna îmajên xeyalî, dûr û fantastîk rêbazeke qadê ye. Ev bikaranîn ji bo mejîyekî afirîner helwesteke di cih de ye. Li gel vê, dema ku ev

mijarên xeyalî û dûr bi piranî bên bikaranîn û mijarên civakî bi awayeke veşartî bên hûnandin, naverok ji bo zarokan divê gaveke giran û bêfêde ye. Nivîskar, divê vê xalê bi awayekî zelal rave bike. Di çîrokên Welatê Kûlîlkan, Kanîya Zêrîn û Marê Sor de dest li ser danîna welatan tê honakkirin. Di wan çîrokên de zarokên di qonaxa razber de ye mimkûn e ku ramanên û mijarên mîna azadî, têkoşîn û hwd. bi awayekî xurt fêm neke. Plansazîyên cuda û nêzî jîyana zarokan dê bandorake serkeftîtir li ser xwînerên zarok bike.

Zarok, di temenên xweyî piçûk de jî bi pirsgerêkên mezin re rûbirû ne. Jihevqetîna dê û bav, mirina kesên malbatê, problemên debar û dibistanê, muptelabûna telefon, tablet, televîzyon û maddeyên narkotîkî, tirsên derûnî hwd carinan der û dora zarokan dorpêç dikin. Zarok, di rewşên wisa da ji ber bêtêcrûbe xwe bêçare dibînin. Mijarên wisa rastîya jîyanê divê di pirtûkên zarokên de cih bigirin. Lê di van çîrokên zarokên de mijarên bi pîranî derveyî van mijaran bûn.

Pirtûkên zarokan divê xwedî şeweyên afirîner bin. Metnîn û fikrên afirîner bo zarokan meraqa xwendinê dikare gêş bike. Bi taybetî jî di van salên dawî de pêşveçûna teknolojiyê, amûrên nû baldarîya zarokan dikişînin. Ev mijar hin bi hin divê bikevina naveroka pirtûkên zarokan jî lê mixabin di çîrokên qadê de ev mijar nebûn.

Piranîya berheman xwedî zimanên hêsan û herikbar in. Xwînerên temenpiçûk jî bi awayeke rehet dikarin naverokan fêm bikin û têbigihijîn mebest û hestên nivîsê. Di vê bendê de pirsgerêka xuyayî ev e ku ziman ji hêla bêjeyên nenasyar ve di nav sînorên serkeftî ye li gel vê dirêjahîya hevokan re çîrokên ne guncan hene. Carinan di heman çîrokî de rêjeya nenasyarî li gorî xwînerên şeş salî û jortir de guncan e lê dirêjahîya hevokan li gorî temenên dihan guncan e. Di zimanekî serkeftî de divê ev her du rêje di asteke de bin.

Motîfên çanda kurdî û kurmancî di hin çîrokên de cih digirin. Ev bo hişmendî û pêşvuçûna çand û ziman pêwîst in. Nivîskar, van mijaran divê bi ziman û naverokeke estetîk bîne ziman. Dema ku ev mijar bi awayeke xwerû û bi plansazîyeke neafirîner be ji hêla zarokan ve bikêf nikarin bên xwendin. Armanç, divê bi tevahîya berhemê

ve bê amadekirin. Bi gotineke din divê ev mijar mîna amûrekî bêm bikaranîn. Lê di hin çîrokan de nivîskar ev ji xwe re mîna armancekî dîtibûn û naverokên xwerû afirandibûn.

Xwîner herçiqas xwedî temenên piçûk jî bin mijarên balkeş û girift bêhtir bala wan dikişînin. Dema ku nivîskar berhemên xwe afirandin divê naverokên xwe li gor vê qaîdeyê binivîsin. Di hin hevokan de tevgerên di çîrokan de dûrî vê taybetmendiyê bûn.



ÇAVKANÎ

Çetinkaya, G. (2010). *Türkçe Metinlerin Okunabilirlik Düzeylerinin Tanımlanması ve Sınıflandırılması* (Yayımlanmış doktora Tezi). Ankara Üniversitesi, Ankara.
<https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/image/pdfizinli.png>

Çandname (2016). Bingeha Çîrokên Min Çanda Me Ye.

<https://candname.com/bingeha-ciroken-min-canda-me-ye-2/> dema gihîştinê:
24/07/2024

Dilidüzgün, S. (2007). *Çağdaş Çocuk Yazını*. İstanbul: Morpa Kültür Yayınları.

Dildar, M. (2020). *Stêrka Piçûk*. İstanbul: Avesta.

Güleryüz, H. (2013). *Yaratıcı Çocuk Edebîyatı*. Ankara: Edge Akademi.

Hari J. (2022). *Çalınan Dikkat*. İstanbul: Metis Yayınları.

Hunter, P. (ed.) (1996). *International Companion Encyclopedia of Children's Literature*. New York: Routledge.

Houdé, O. (2006). *Çocuk Psikolojisi*. Ankara: Dost Yayınevi.

Kardaş, C., Alp, D. (2013). *Çocuk Edebîyatı ve Medya*. Ankara: Eğiten Kitap.

Kıbrıs, İ. (2010). *Çocuk Edebîyatı*. Ankara: Kök.

Köksal, S (2005). *Okumanın Halleri*. İstanbul: Metis Yayınları.

Kurt, Ş. Türkiye’de Kürtçe Öğretimi Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018) (Doktora Tezi, Dicle Üniversite Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı, 2020)

Lukens R. J., Smith J.J., Coffel C. M. (2018) *Çocuk Edebîyatına Eleştirel Bir Bakış*. İstanbul: Erdem Yayınları.

Meral, A. Ömer Seyfettin Öykülerinin Çocuk Edebîyatı Ölçütleri Açısından Değerlendirilmesi (Yüksek Lisan Tezi, Çanakkale Onsekiz Mart Üniversitesi, Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Türkçe Eğitimi Ana Bilim Dalı, 2016)

Mungan, M. (2011). *Yazıhane*. İstanbul: Metis Yayınları.

Nas, R. (2004). *Örneklerle Çocuk Edebîyatı*. Bursa: Ezgi Yayınevi.

Öğüt, B. A. (2014). *Kewên Gozel*. Dîyarbakır: Hîva.

Öğüt, B. A. (2014). *Xezal û Qertel*. Dîyarbakır: Hîva.

- Öğüt, B. A. (2016). *Şînmorîka Zînê*. Dîyarbakır: Hîva.
- Öğüt, B. A. (2014). *Dara Pîroz*. İstanbul: Morî.
- Öztürk, N. (2021). *Kesper*. Ankara: Bazı Kitaplar.
- Öztürk, N. (2021). *Kişzer Xanım*. Ankara: Bazı Kitaplar.
- Postman N. (1995) *Çocukluğun Yok Oluşu*. İstanbul: İmge Kitabevi Yayınları.
- Sever, S. (2013a). *Çocuk Edebîyatı ve Okuma Kültürü*. Ankara: Tudem.
- Sever, S. (2013b). *Çocuk ve Edebîyat*. Ankara: Tudem.
- Subaşı, K. *Tipolojîya Vegêrana Çîrvanokên Kurdî/Kurmancî* (Doktora Tezi, Dicle Üniversite Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı, 2019)
- Subaşı, K. (2021). “Nîrxandîna Helbestên Zarokan ên Kurdî li Gorî Rastîya Zarokan û Îzafîyeta Zarokan”. *Mukaddime*, 2021, 12(1), s. 220-248. DOI:10.19059/mukaddime.803810.
- Suğvacı, İ. (2020). “Di Edebîyata Zarokan ya Kurdî da Nûnerek ji Nîfşê Nû: Berfin Ayşe Öğüt”. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi* 2020 8(UMS'20) 71–79.
- Şimşek, T. (ed.). (2012). *Kuramdan Uygulamaya Çocuk Edebîyatı*. Ankara: Grafiker Yayınları.
- Şirin, M. R. (2012). *Dersimiz Çocuk*. İstanbul: İz Yayıncılık.
- Şirin, M. R. (2010). *Çocuk Hep Çocuk*. İstanbul: İz Yayıncılık.
- Şirin, M. R. (2000). *Çocuk Edebîyatı Kültürü*. Ankara: Kök Yayıncılık.
- Şirin, M. R. (2007b). *Çocuk Edebîyatına Eleştirel Bir Bakış*. Ankara: Kök Yayıncılık.
- Şirin, M. R. (2007a). *Masal Atlası*. Ankara: Kök Yayıncılık.
- Tezcan, M. (2012). *Çocuk Sosyolojisi*. Ankara: Anı Yayıncılık.
- Türk Dil Kurumu (2005). *Türkçe Sözlük*. Ankara: TDK Yayınları.
- Tosun, T. (2018). “Edebîyata Zarokan A Kurdî Li Bakur”. *Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ)* Govara Zanstên Mrovayeti Ya Zankoya Zaxo, Perbenda:6, Jimare:1, Bergê 1, bp 147- 154, Adar- 2018.
- Yalçın, A., Aytaş G. (2011). *Çocuk Edebîyatı*. Ankara: Akçağ.

Yavuzer H. (2013). *Çocuk Psikolojisi*. İstanbul: Remzi Kitapevi.

Yeşilyaprak, B. (ed.) (2004). *Gelişim ve Öğrenme Psikolojisi*. İstanbul: Pegem Akademi Yayıncılık.

Yörükoğlu, A. (2014). *Çocuk Ruh Sağlığı*. İstanbul: Özgür Yayınları.

Zêdo, Ç. (2019). *Daweta Noko û Nîskê*. İstanbul: Nûbihar

Zêdo, Ç. (2019). *Zozan û Gernas*. İstanbul: Nûbihar

Zêdo, Ç. (2020). *Ejderhayê Tirsonêk*. İstanbul: Nûbihar

Zêdo, Ç. (2020). *Gurê Kubar*. İstanbul: Nûbihar

Hevpeyvînên Çavkanî

Dildar, M. (2024) Hevpeyvîna Niviskî, bi rêya maîlê.

Öztürk, N. (2024) Hevpeyvîna Niviskî, bi rêya maîlê.

Zêdo, Ç. (2024) Hevpeyvîna Niviskî, bi rêya maîlê.

PÊVEK

Pêvek 1. Hevpeyvîna bi Nejla Öztürk re

Li gorî we, niviskarekî edebîyata zarokan dema ku berhemana ji bo zarokan biafirene dibe kijan pîvanan li ber çavan bigire?

Helbet temenê zarok; yanî zarokên çend salî re dinîvîse? Divê ewê baş bifikire û dure mijara xwe bijbêre. Bingehîya berhemên xwe gorî bal û derûnî ya zarokan bi xweşî û tenikî û bi zimanekî sivik ava bike. Edebîyata zarokan de piranî peyama û temayek heye lê divê ev peyama û teme ji nav berhême de bi awa yekî xwezayî biherike. Mijar, buyer leheng divê xeyal û meraqên zarokan şîyar bike û pêşve bibe. Edebîyata zarokan de rêvebirin û hevkirina çaxê zarok, mijar, ziman, buyer, leheng, û dem gelekî girînge.

Bêguman nivîsîna ji bo zarokan naskirina zarokan jî dibe bixwe re bîne. Hûn vê pêvajoya naskirina zarokan biçi rê/rêbazan pêk tînin?

Naskirin û fehmkirina zarokan, edebîyata zarokan de gava herî grînge. Ez zarokan pir hez dikim û ji wan re mijûl dibim. Wan guhdar dikim û bi wan re lîstikan dileyîzim. Navbera min zarokan de pêwendîyek xweş heye ew jî dibe sedama pîreyek danûstandina hezkirinê û ez wê pîrê pir bi qîmet dibînim. Gerkû nasger ku nenas hemû zarokan hez dikim û hevldidim kû wan fehm bikim. Ez hêza xwe ji pîrsen wan, hestên wan, meraq û xeyalên wan ken û şahîya wan digirim. Ya rastî hezkirin û fehmkirina zarokan jî fikr û xeyalên min pêşve dibin û dixemlînin û di hişê min de dergehên berhemên nû vedikin. Dema ku ji bo wan ji ser berhemekî binîvîsim dilêmin geş dibe. Hêvî dikim kû hemû zarokên Cîhanê, her alî ve ji nav xweşî yê û şahîyê de bin.

Di sazkirin, xwenaskirin û pêşketina zarokan de hûn bandora edebîyata zarokan li ser zarokan diçî astê de dibînin?

Edebîyat; ji bo xwenaskirin, pêşketin û serkeftina zarokan, rêyek bêhempaye. Berku xwendin alîkarîya ziman û axaftina zarok dike, jêhatîbuna zarok zexm dike, şayîna wê\wî ya empatîyê zêde dike. Xwendina pirtukê û wêneyên pirtukê xeyalên zarok direngîne û pêşve dibe. Zarokên kû hin fêrî xwendinê nebûyî jî devê bi rêya temaşeyê û guhdarkirinê para xwe li pirtûkan bigre. Bi min zarokan re pirtûk

xwendin, çirok beji, stran û lorîkbêjî ji bo derûnîya wan, jîyan û pêşeroja wan, pêdivîyek wakê xwerin û vexarinê ye. Edebîyat gerku nivîskî gerku devkî, navbera zarokek pîçûk û malbat û mezinên wê\wî de rê û derfetek pir taybet e. Divê mezin vê amûrê rind bikarbînin, Ew pira bi qîmet, bi hezkirin û bi lîstikan birengîne û bidomîne. Ez xemgînim ji bo zarokên bê lorîk, bê stran, bê çîrok û be lîstok mezin bune û mezin dibin.

Amûren edebîyata zarokan mîna ziman, leheng, honak, bûyer dibe bi plansazîyeke çawa werin plankirin û berhem werin nivisandin?

Edebîyata zarokan de ziman, leheng, honak, buyer, peyam divê gorî temenê zarokan ware rêzkin. Zimanekî sivik û hêsa lehengên kû zarok bi hêsanî xwe nêzîk bibîne û hestên erênî pêk bîne. Buyerên meraqa zarokan şîyar bike û pêvajoya mijarê wake hurgulîyan bi aheng kelecane bidomîne. Destpêk, naverok û encam bi hev re û hevhatî biherike. Gorî temenê zarok peyam, fikr û xeyalan bi rêya wêneyan jî bixemlîne.

Armanca we yî dest pêkirina nivîsîna berhemên edebîyata zarokan çibû û ev armanc ji hêla naverokê ve alîyê/berê we dide ku?

Armanca destpêkirina min a edebîyata zarokan bi hezkirina xwendin û nivisandinê, hezkirina zarokan û berjewandîya zimanan dest pê kir. Taybetî jî ji bo zimanê dayîkê min bi dil û can xwest kû kar û xebat bikim. Ji ber kû rewşa zimanê Kurdî mixabin ber bi wenda buyînê ve diçe. Herçiqas wan salên davî nivîskarên Kurd zêde bune jî dîsa xwendewanên zimanê Kurdî pir kêmin. Zimanê Kurdî taybetî jî warê edebîyata zarokan sed heyf kû pare maye, cîhê kû heq dike ji dest çuye. Zimanê Kurdî hewcedarîyê daye û hewar dike. Divê her Kurdek têra xwe xebat bike û hewl bide, dakû zimanê dayîka xwe cîhê ketî rake pîya û azad bike.

Armanca min jî eve kû; ji bo zimanê Kurdî xizmetê bikim bê navber bixebitim û ji bo edebîyata zarokan, berhemên nû biafirînim. Ji ber ku çavkanîya edebîyata dilêmin jî çîrokên pîrka min, lorîken dayîka min, stranên bavê min, meselokên kalke min in. Ku ew hemû bi zimanê Kurdî bûn. Ez xwe mecbur dibînim kû ew zimanê şîrîn û devlemend her û her pêşve bibim û heya destê min tê nedim ji bîrkin.

Di demên berê de berhemên edebîyata zarokan bi piranî ji çîrvanok û fablan pêk dihatin lê di dema modern de ev cûre berfireh bûne. Mijar, bûyer û derûnnasîya di berhemên de behtir bi jîyana zarokan ve te giredan. Hûn li ser vê çi difikirin, naveroka berhemên xweyî edebîyata zarokan biçi perspektîfan ava dikin?

Demên berê çîrok û fabl bingeha edebîyata zarokan bu û piranî jî peyam ji bo zarokan wake dersekî bi eşkere xuya dibû. Dema modern de ew bawêşînk cûr bi cûr, reng bi reng mezin û berfireh bûye. Mijarên pirtûkan bi raste rast ji ser jîyana zarokan a rojane re avarê dibe û zarokan bi re rêya fikr û hîlbijartinê bi hêsane vedike. Fikr û xeyalen zarokan bê sînor û azad dihêle ew jî buyerêk pir baş û serkeftîye.

Dema kû berhemên xwe dinivîsim nêrîn û hestî zarokan temenê zarokan didim berçavên xwe. Perspektîfa ku ez dişopînim eve; bi fehmkirina derûnîya zarokan heya bi min tê gorî nêrîna wan peyam û peywendîyên erênî datînim, Ez piranî di berhemên xwe de peywendîya xwezayê, ajal, alav, hwd... û zarokan bi hev re dinirxînim, ji ber ku dixwezîm zarok xwezayê re û jîndarên xwezayê re hevhatî bin. Teknolojîya pêşve çuyî, lîstikên elektronîk û medyaya civakî mixabin zarokan durî xwezayê dike û ez jî dixwezîm bi rêya çîrok û helbestan bala wan bikşînim ji ser xwezayê.

Xwendina we ya edebîyata zarokan a cîhanê û Kurdî çawa ye? Nivîskar û edîbekî di vê warî da hûn ji bo xwe mînak digirin an we jê tesîr girtibe heye? Yan jî nivîskarekî ku hûn di vê warî da pir serkeftî dibînin heye û çima?

Xwendina edebîyata zarokan ger ku bi kurdî ger kû zimanê beyanî zehf hez dikim. Loma jî ez herdem pirtûken zarokan distînim û dixwînim. Cudabûna çand û zimanan tehm û rengên xweşik dide dilêmin û bal û meraqa min xurt û geş dike. Dixwezîm warê dabîyata zarokan de bêtir perwerde bibim û xwe pêşxînim. Nivîskarê ku ez jî bin tesîra wîde me bê guman Ehmede Xanî ye. Fikr û ramanên wîne, nesîhet û berhemên wîne... Helbestên Cegerxwîn... Ked û xebatên Celadet Bedirxan, Kamûran Alî Bedirxan, Zana Farqînî, Mehmet Emin Bozarslan û gelek kedkarên

meyê qedirbilind ê kû ji bo zimanê Kurdî xizmetkirine, û ê kû dikin wake şagirtêk mîna we... Hemû bi hêvî û hêz didin pêûsa min.

Edebîyata zarokan a cîhanê jî A.A Milne ez berhemen wî pir diecibînim. Carlo Collodî, Mûjgan Seyhî, Şermîn Yaşar, Roald Dahl û gelek nivîskarên din jî... Hemû jî di têra xwe serkeftîne û warê edebîyata zarokan de xizmet û kedên gelek grîng dane û didin. Herçiqasî di cîhanê de edebîyata zarokan dereng destpêkiribe jî bi saya serê wan edebîyata zarokan bêtir xweş û geş bûye. Dema îroyîn de çand û zimanên cur bi cur gîhîştine hevdû û wake keskesoran cîhê edebîyata zarokan bêtir direngîne mezin û balkêş dike.

Bi taybetî ku em ji bo kurdî bifikirin, edebîyata zarokan ya kurdî diçî astê de ye û dibe diçî astê de ba?

Wan salên dawî edebîyata zarokan a bi kurdî de livek baş heye, hêvî dikim ku ev liv zide be û bibe kani, bibe çem bikişê û bibe derya û zerya dakû di cîhanê de zimanê kurdî bigêhêje cîhê xwe yî heq kirî. Ji ber ku zimanê kurdî zimanekî gelek taybet û devlemend e. Mixabin û sed heyf ku pare maye û xeterê de ye. Helbet di aliyê astengên giran ve hatîye dorpeçkirin. Lê divê nivîskarên kurd û weşanxaneyên kurd herî zêde ji ser edebîyata zarokan bixebitin. Bi min peşveçuyîna zimanekî ji ser bingehîya edebîyata zarokan qedîm dibe.

Gelo ji vir şûnde xebat û planeke we heye derbarê edebîyata zarokan da yan jî em li bendî berhemeke we ya nû bin?

Planê min pirin xebatên min ji her didome. Xwe bloga mina bi navê “Kurdî Zarok” guncave û ez li wirde ji bo zarokan helbest û çirokan dinivîsim carnan jî wergerên bi îngilîzi jî dikim. Du pirtûkên din jî ber capkirinêne, mixabin xwendevanên Kurd pir kêmin. Lê hevîya min heye kû ew roj ê bê. Zarokên me di dibistanên de bi zimanê dayîke perwerde bibin û zimanê Kurdî bi her aliyê jîyanê de bikarbînin.

Hûn dikarin jîyana xwe bi mijar û bûyerên sereke ji me re kurte bikin? (Dayikbûn, perwerdeyî, kar û xebat, hêla edebîyat û hûner e, berhem û xebatên edebî, hûnerî)

Ez Nejla Çaçanoglu Ozturk sala 1977 de ji Bazîdê dayikbume. Dibistana seretayî gunde xwe Qerequmezê, dibistana navîn Bazîdê Y.I.B.O de û Lîse ji Bazîdê (Saglik Meslek Lîsesî) Stembolê dîjîm. Cuma Öztürk re zewicîme, du kur û dû qîzen min hene.

Berhem:

Du Pirtûkên kurdî (*Kesper*) (*Kişzer Xanim*)

Bloga xwe ya bi navê (Kurdîzarok) bikartînim

Du Pirtûk Tirkî (*Mizmiz Sorik*) (*Kardan Kiz*)

Sê Ji ser wergeren zimanê îngîlîzî û Kurdî dixebitim.

Pêvek 2. Hevpeyvîna bi Çetoyê Zêdo re

Li gorî we, niviskarekî edebîyata zarokan dema ku berheman ji bo zarokan biafirene dibe kijan pîvanan li ber çavan bigire?

Bersiv hem hêsan hem jî zahmet e. Ji pîvana wêdetir divê gelek tiştan li ber çava bigire. Nivîskar divê pîvana bizane lê dîsa jî divê xwe pîvanên mekanîk girênde. Bi giştî divê xwedî poetikayeke xwerû û bi estetikeke ve girêdayî be. Hay ji xwe û zarok û ziman û civaka xwe hebe... Êdî ez bi xwe çiqasî heq ji van pîvanan tîm, nizamim; lê weke adetê çend xalên giştî hene, dikarim hinan binav bikim:

Nivîskar bizane ji kê re, kijan temenî re an xwe li kê û çawa digire û dinivîse. Bijartina mijar û vegotina çîrokê, ziman û şêweyeke fambar û balkêş, baldariya pedagojîyê... A rast ez ji hevokên bi “divê” hez nakim lê mirov di rewş û sinorê kurmancî de her her di nav divê û hey divêyan de ye...

Bêguman nivîsîna ji bo zarokan naskirina zarokan jî dibe bixwe re bînê. Hûn vê pêvajoya naskirina zarokan biçi rê/rêbazan pêk tînin?

Ez zarok bûm, pişt re bûm mezinekî di nav zarokan de. Weke mamoste bist sal, weke bav pênc sal, weke legerîna zaroktîya xwe min jî weke gelek kesan ji bo zaroktîyê xwe li kurmancî û hunerê girtîye, nizamim ev jî min çiqasî dixê nav zaroktîyê... Dixwînim û carinan ji min bê dinivîsim... A nuha heft berhem çapbûyî weke çîrok hene, çendîyên din jî hene lê weke şanone du berhem in; ew jî mirov dikare weke şanoya zarokan binav bike hene: Şengê û Pengê, Daweta Noko û Nîskê.

Di sazkirin, xwenaskirin û pêşketina zarokan de hûn bandora edebîyata zarokan li ser zarokan diçi astê de dibinin?

Zaroktîya îro û ya do çu carî ne weke hev in. Di vê serdemê de her tişt bilez û bez diguhere, edebîyat jî ji sînorê xwe yê berê ber bi digitalbûne ve diçe. Lê berhem her çi be “lîstik” ew ê her bi zarokan re hebe, çi weke dîtbarî çi weke berê bi nivîskî... Mirov nikare “wêjeya buhurî” li ser zarokan ferz bike. Weke mezinekî mirov dikare li ser geşedan û bîrbirina zarokan, wan bi berhemên “resen û baldar”e binase ew ê bikêrhatî be.

Amûren edebîyata zarokan mîna ziman, leheng, honak, bûyer dibe bi plansazîyeke çawa werin plankirin û berhem werin nivisandin?

"What is the use of a book without pictures or conversations?"

Camêr Lewis Carroll vê pirsê 150 sal berê bi "Alice" dide gotin: Pirtûkeke bêyî wêne û diyalogan bi kêrî çi tê?

Armanca we yî dest pêkirina nivisîna berhemên edebîyata zarokan çibû û ev armanc ji hêla naverokê ve alîyê/berê we dide ku?

Armanc kurmancî û listik e. Herdu jî bi zaroktîya min ve girêdayî ne. Tişteki ku jê hez bikim û hevalên xwe tevlê bikim jê xweştir cewahir e, huner e.

Di demên berê de berhemên edebîyata zarokan bi piranî ji çîrvanok û fablan pêk dihatin lê di dema modern de ev cûre berfireh bûne. Mijar, bûyer û derûnnasîya di berheman de behtir bi jîyana zarokan ve te giredan. Hûn li ser vê çi difikirin, naveroka berhemên xweyî edebîyata zarokan biçi perspektîfan ava dikin?

Sînor û pênaseyeke giştî ew ê tunebe, lê poetikayeke xwerû hewce ye. Paşxaneyekê bi xwendin û bi hemdê xwe hebe ew ê afirînerî jî xurtir be.

Xwendina we ya edebîyata zarokan a cîhanê û Kurdî çawa ye? Nivîskar û edîbekî di vê warî da hûn ji bo xwe mînak digirin an we jê tesîr girtibe heye? Yan jî nivîskarekî ku hûn di vî warî da pir serkeftî dibînin heye û çima?

Zarok rexnegirên herî bêqusûr in, ew bêyî hesabekî li ser mijarekê an bûyerekê çi hîs bikin wê yekê dibêjin. Loma divê zarok bibêjin ka çiqasî ji wê berhemê hezkirine an na? Çi hîskirine, çawa dîtine, çawa nirxandine... Em weke mezinan çi didin wan, ew çi hîs dikin. Xulase ew ê di kurmancî de ew ê kêmtir bin.

Bi taybetî ku em ji bo kurdî bifikirin, edebîyata zarokan ya kurdî diçi astê de ye û dibe diçi astê de ba?

Baş e çêbû edebîyata zarokan... Baş e zêde dibin werger û berhemên baş.

Gelo ji vir şûnde xebat û planeke we heye derbarê edebîyata zarokan da yan jî em li bendî berhemeke we ya nû bin?

Na, berhemên xweştir hene. Di wêjeya cîhanê de bi hezaran berhemên xweş hene, bi wergerê hemû dikarin bibin kurmacî û mezin wan bixwinin, piştî pêşniyazî zarokên xwe bikin.

Hûn dikarin jîyana xwe bi mijar û bûyerên sereke ji me re kurte bikin? (Dayikbûn, perwerdeyî, kar û xebat, hêla edebîyat û hûner e, berhem û xebatên edebî, hûnerî)

Çetoyê Zêdo (Çetin Erol) di sala 1981ê de li Mêrdînê ji dayîk bû. Di 2004an de, Zanîngeha Wanê beşa Mamostetîya Zimanê Tirkî û di 2012an de Zanîngeha Stenbolê beşa Dramatûrjîyê qedand. Wekî dramatûrg di ÎBŞT û di hin şanoyên Kurdî de xebitî. Derhenerîya şanoyên “*Şengê û Pengê*” û “*Bêlome*” û “*Zargotin*” kir. Berhemên wî yên ku heta niha çap bûne: *Şengê û Pengê* (Şanoname, Weşanên Filîto, 2014) *Siltanê Fîlan* (Şananome, Weşanên Şaredarîya Amedê, 2015). Ji Soranî, romana Ferhad Pîrbal, *7 Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr* adapteyî Kurmacî kir. (Avesta, 2014). Bi Yavuz Akkuzu re *Dîroka Şanoya Kurmacî* (Peywend, 2015) û *Kürt Tîyatroyê Tarihi* (Evrensel, 2016) amade kir.

Ji nav weşanên Nûbiharê “Daweta Noko û Nîskê”, “Du Legleg Zozan û Gernas” (2019), “Ejderhayê Tirsonê”, “Gurê Kubar” (2021), “Şêrê Bitenê”, “*Çûkê Bilûrvan*”, “*Du Çîrok û Nameyek*” (2024) hatin çapkirin.

Pêvek 3. Hevpeyvîna bi Murad Dildar re

Li gorî we, niviskarekî edebîyata zarokan dema ku berheman ji bo zarokan biafirene dibe kijan pîvanan li ber çavan bigire?

Bi min pîvana herî giring, psîkolojîya/pedagojîya zarokan e. Pîvaneke din jî ziman e. Herçiqas mezin û zarok bi heman zimanê xeber bidin jî, zimanê zarokan ji mezinan cudatir e. Nêrîna wan a li ser jîyanê û cîhanê cudatir e. Loma divê zimanê berhema, li gor fehm û têgihîştina zarokan be.

Bêguman nivîsîna ji bo zarokan naskirina zarokan jî dibe bixwe re bînê. Hûn vê pêvajoya naskirina zarokan biçi rê/rêbazan pêk tînin?

Rêbaza herî zêde bikartînim çavderî ye. Tevgerên zarokan, xebirdanên wan, lîstikên wan ji bo naskirina wan giring in bo min. Rêbazeke din jî xwendin e. Xwendina berhem û gotarên li ser psîkolojî û perwerdehîya zarokan, ji bo zarokan nas bikim gelek alîkarî dikin.

Di sazkirin, xwenaskirin û pêşketina zarokan de hûn bandora edebîyata zarokan li ser zarokan diçi astê de dibinin?

Di sazkirin, xwenaskirin û pêşketina zarokan de, bandora edebîyata zarokan pir zêde û giring e. Lê mixabin ji bo edebîyata kurdî ya zarokan nikarim vîya bejim. Ji ber ku zarokên me nikarin bi zimanê xwe perwerdehî bibînin, xwendina berhemên edebîyata zarokan di jîyana wan de pir kêr e mixabin. Ji ber ku zarokên me, piranî, bi zimanê din (tirkî, erebî, farisî) berheman dixwînin û bi zimanê din dinyayê nas dikin, li ser xwenaskirina zarokan bandoreke neyînî çêdibe.

Amûren edebîyata zarokan mîna ziman, leheng, honak, bûyer dibe bi plansazîyeke çawa werin plankirin û berhem werin nivisandin?

Bi min di nav van amûran de ya herî giring ziman e. Berhem ji bo zarokan, li gorî temenê wan bê dabeşkirin û li gor van temena ziman bê dîyarkirin wê çêtir be. Çimkî di her temenê de, fehm û têgihîştina zarokan cuda ne. Lê dîsa jî bo tevahî ez dikarim bêjim, divê zimanekî zelal û pedagojîk bê bikaranîn. Hevokên zêde dirêj û kompleks divê neyê bikaranîn. Di nav leheng û honak û bûyeran de divê girêdaneke

baş û ahengeke hebe. Ev girêdan û aheng bo herikbarîya berhemana giring e. Di nav lehengan de, divê wekhevîyeke zayendî hebe. Yanî serleheng divê tim ne law bin. Ji alî hêz, kar, rêbertî û hwd. divê di nav keç û lawan de wekhevîyek hebe.

Armanca we yî dest pêkirina nivîsîna berhemên edebîyata zarokan çibû û ev armanc ji hêla naverokê ve alîyê/berê we dide ku?

Min di salên 2005-2006an de dest bi nivîsîna berhemên edebîyata zarokan kir û berhema min a ewilî di sala 2009a de çap bû. Armanca min ew bû ku ez ji bo zarokan berhemana binivîsim, berhemên bo zarokan yê kurdî zêdetir bibin û bi vî awayî zarokên me karibin bi zimanê xwe bixwînin. Çimkî pêşketin û hebûna zimanê me, girêdayî zarokên me ye. Zimanekî ji alîyê zarokan neyê xebirdan û neyê xwendin, nikare xwe bigihîjine siberojê.

Di demên berê de berhemên edebîyata zarokan bi piranî ji çîrvanok û fablan pêk dihatin lê di dema modern de ev cûre berfireh bûne. Mijar, bûyer û derûnnasîya di berhemana de behtir bi jîyana zarokan ve te gîredan. Hûn li ser vê çi difikirin, naveroka berhemên xweyî edebîyata zarokan biçi perspektîfan ava dikin?

Helbet li gor demên nû, mijarên edebîyata zarokan jî diguherin. Edebîyata zarokan, di perwerdehiyê de pirr tê bikaranîn. Loma bi perwerdehiyê, mijarên edebîyata zarokan jî guherî û hîn jî diguhere. Wekî din pêşketina teknolojiyê, belavbûna teknolojiyê di nav zarokan de, edebîyata zarokan jî diguherîne. Pirsgerêkên civakî jî li ser zarokan bandoreke çêdike û ev pirsgirêk carna dibin mijarên edebîyata zarokan. Mînak, bi devjîhervberdana dê û bav, jîyana zarokan diguhere, psîkolojiya wan diguhere. Ev meseleyên civakî jî hêdî hêdî di berhemên zarokan de cih digrin. Ez naverokên berhemên xwe li gor jîyanê û li gor mijarên balên zarokan dikşînin dîyar dikim. Bi taybetî xweza, têkilîya xweza û insanan, hevaltî, giringîya hevaltîyê naverokên berhemên min in.

Xwendina we ya edebîyata zarokan a cîhanê û Kurdî çawa ye? Nivîskar û edîbekî di vê warî da hûn ji bo xwe mînak digirin an we jê tesîr girtibe heye? Yan jî nivîskarekî ku hûn di vî warî da pir serkeftî dibînin heye û çima?

Di edebîyata zarokan a Kurdî de, çi berhem derkevin, heya ji min bê dişopînim û dixwînim. Di edebîyata zarokan a cîhanê de jî, edebîyata fantastîk pir bala min dikşîne. Bi taybetî berhemên J.R.R Tolkîen, bi min pirr biqîmet û balkêş in. Zarokên ji 12-13 salî û mezintir dikarin berhemên wî bixwînin. Wekî din *Mîrzayê Biçûk*, berhemeke giring e.

Bi taybetî ku em ji bo kurdî bifikirin, edebîyata zarokan ya kurdî diçi astê de ye û dibe diçi astê de ba?

Bi taybetî di salên dawî de, berhemên edebîyata zarokan a Kurdî zêdetir dibin. Weşanxaneyên bi taybetî bo edebîyata zarokan ava dibin. Lê mixabin, bi min hîn jî edebîyata zarokan a kurdî di asteke baş de nine. Heta zarokên me bi zimanê Kurdî perwerdehî nebînin û xwendina Kurdî di nav zarokên me de belav nebe, wê asta edebîyata zarokan pêşve nekeve.

Gelo ji vir şûnde xebat û planeke we heye derbarê edebîyata zarokan da yan jî em li bendî berhemeke we ya nû bin?

Belê, bo edebîyata zarokan xebatê min hene. Di demeke nêzîk de wê çap bibe.



Hûn dikarin jîyana xwe bi mijar û bûyerên sereke ji me re kurte bikin? (Dayikbûn, perwerdeyî, kar û xebat, hêla edebîyat û hûner e, berhem û xebatên edebî, hûnerî)

Di sala 1986an de de li Dîyarbekirê hatim dinyayê. Min dibistana pêşîn û lîseyê li Dîyarbekirê xelas kir û li zanîngehê li ser felsefeyê xwend. Heta niha sê berhemên min ji bo zarokan hatine çapkirin. Çarîn û çîrokên min di kovarên *Nûbihar û Bar* û di malpera Kulturnameyê de belav bûne. Herwiha nivîsên min yê li ser felsefeyê, di kovarên Felsefevan, Bar Helbest, Dadistan û Sûretgrafê de belav bûne. Yek ji amadekarên podcasta Qehwe û Felsefeyê me. Di adara 2024an de, min li Botantimesê dest bi nivîskarîyê kir. Niha mamostetîya felsefeyê dikim û li ser felsefeyê perwerdehiya masterê dibînim.



Pêvek 4. Wêneyê Bergê Kitêba Stêrka Piçûk ya Murad Dildar



Pêvek 5. Wêneyê Bergên Kitêbên Kîşzer Xanim û Kesper yên Nejla Öztürk



Pêvek 6. Wêneyê Bergên Kitêbên Daweta Noko û Niskê, Ejderhayê Tirsonêk, Zozan û Gernas û Gurê Kubar yên Çetoyê Zêdo



Pêvek 5. Wêneyê Bergên Kitêbên Xezal û Qertel, Kewên Gozel, Şinmaroka Zînê û Dara Pîroz yê Berfîn Ayşe Ögüt

